K. T.

ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

MÎTOSA AFIRANDINÊ DI RÎWAYETÊN KURDÊN ÊZIDÎ Û YARSAN DE

Nasır Heval BATU

Şêwirmend

Dr. Shahab Vali

Mêrdîn-2024

K. T.

ZANÎNGEHA MÊRDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

MÎTOSA AFIRANDINÊ DI RÎWAYETÊN KURDÊN ÊZIDÎ Û YARSAN DE

Nasır Heval BATU

20711014

Şêwirmend

Dr. Shahab Vali

Mêrdîn-2024

T.C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

TEZ ONAYI

Enstitümüzün Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı Yüksek Lisans programı öğrencisi **Nasır Heval BATU**'nun hazırladığı "**Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Êzidî û Yarsan de**" başlıklı YÜKSEK LİSANS tezi ile ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 09/08/2024 tarihinde saat 14.00'te yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Başkan

Doç. Dr. Kenan SUBAŞI

Üye

Dr. Öğr. Üy. Semih GEZER

Üye (Danışman)

Dr. Öğr. Üy. Shahab VALİ

ONAY

Bu tezin kabulü Enstitü Yönetim Kurulu'nun ……. tarih ve …….. sayılı kararı ile onaylanmıştır.

Enstitü Müdürü

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmasında kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan "bilimsel intihal tespit programı" ile tarandığını ve hiçbir şekilde "intihal içermediğini" beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Nasır Heval BATU

2024

KURTE

Teza Lîsansa Bilind

Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Êzidî û Yarsan de

Nasır Heval BATU

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstitûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

87 rûpel

Ev tez, bi metnên dînî yên Kurdên Êzidî û Yarsan û bi lîteratûra destê duyem yên di derbarê wan de hatine tomarkirin, hewl dide li dû qalibên gerdûnî yên cûreyên mîtosên afirandinê de biçe û bide zanîn ka heta çi radeyê metnên Kurdî bi wan qalibên mîtolojîk ve dikarin bên dahûrandin û senifandin. Metnên ku kelk jê hatine wergirtin Qewlên Êzidîyan (Kurmancî) û Kelamên Yarsanan (Goranî) in. Qewlê Afirandina Dinyayê yê Êzidîyan û kelamên Şêx Emîr Zoleyî û Xan Elmas bi qalibên cureyên mîtosên afirandinê hatine analîzkirin û heta astekê hewl hatîye dayin ji bo nasandina wan her du civakên Kurdî û berhemên wan û ji bo gihandina nerîta Kurdan a olî, çandî, spirîtûel û mîtolojîk bi lêkolîner û xwînerên vê qada xebatê. Bi analîzkirina wan metnên her du civakên olî yên Kurdan û bi berawirdkirina hêmanên mîtîk ên hevbeş û cuda, vê tezê her wiha ev tişt ji xwe re kirîye amanc ku wan vegêranên ku pirî caran di xebatên akademîk de hatine paşguhkirin bixe nav diskura akademîk û çandî û pêşkêşî raya xwende bike. Rebazên ku bî giştî sûd jê hatine wergirtin dahûrandina binyadî, qalibên gerdûnî yên mitosa afirandinê û mîtolojîya berawirdî ne. Ev xebat ji çar beşan pêk tê: beşa yekem li ser danasîna cûreyên mitosa afirandinê ye; di beşên duyem û sêyem de mîtosa afirandinê ya Kurdên Êzidî û Yarsan tê pêşkêşkirin di gel çend zanyarî di derbarê her du civatan de û di beşa çaran de jî berawirdkirina mîtosên wan û ravekirina sembolan hene.

Peyvên Sereke: Afirandin, Êzidî, Kelam, Mîtos, Qewl, Yarsan

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Ezidi ve Yarsan Kürtlerinin Rivayetlerinde Yaratılış Mîtosu

Nasır Heval BATU

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

87 sayfa

Bu tez Kürt Ezidi ve Yaresan anlatılarındaki evrensel yaratılış miti türlerini araştırmakta ve Kürtçe metinlerin bu evrensel kalıplar aracılığıyla ne ölçüde analiz edilebileceğini ve kategorize edilebileceğini göstermek amacıyla, dini metinleri ve yardımcı ikincil literatürü kullanarak analiz etmektedir. Başlıca analiz edilen metinler, Kurmanci lehçesindeki Ezidi İlahileri (*Qewl*) ve Kürtçenin Gorani lehçesindeki Yaresan Kelam'larından oluşmaktadır. Ezidilerdeki "Dünyanın Yaratılışı İahisi" ve Şeyh Emir Zoleyi ile Xan Elmas'ın kelamları, yaratılış mitlerinin yerleşik kalıpları üzerinden incelenmiştir. Ayrıca, bu iki Kürt topluluğunu ve onların metinlerini tanıtmak, dini, kültürel, spiritüel ve mitolojik miraslarını araştırmacılar ve okuyucular için erişilebilir kılmak amacıyla çaba sarf edilmiştir. Bu iki Kürt dini topluluğunun metinlerini inceleyerek ve içlerindeki ortak ve farklı unsurları karşılaştırarak, bu çalışma, sıklıkla göz ardı edilen bu anlatıları akademik ve kültürel tartışmaların ön saflarına taşımayı amaçlamaktadır. Kullanılan yöntemler arasında yapısal analiz, yaratılış mitosunun evrensel kalıpları ve karşılaştırmalı mitoloji yer almaktadır. Bu çalışma dört bölümden oluşmaktadır: birinci bölümde yaratılış mitoslarının türlerinden bahsedilmektedir, ikinci ve üçüncü bölümlerde sırasıyla Ezidi ve Yaresan Kürtleri'ne dair bazı bilgiler sunulmakta ve onların yaratılış mitosları ele alınmaktadır; dördüncü bölümde ise mitosların karşılaştırılması ve sembollerin yorumlanması yer almaktadır.

Anahtar Kelimeler: Ezidi, Kelam, Mitos, İlahi, Yaratılış, Yaresan

ABSTRACT

Master Thesis

Creation Myth in The Narratives Of Yezidi and Yaresan Kurds

Nasır Heval BATU

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Turkey

The Department of Kurdish Language and Culture

87 pages

This thesis explores the universal types of creation myths in Kurdish Ezidi and Yaresan narratives to indicate the extent to which Kurdish texts can be analyzed and categorized through these universal patterns, utilizing their religious texts and supplementary secondary literature to support the analysis. The texts primarily analyzed are Ezidi *Qewls* (hymns) in Kurmanji and Yaresan *Kelams* (hymns) in the Gorani dialect of Kurdish. The Ezidis' "*Hymn of Creation of the World"* and Sheikh Emir Zoleyi and Xan Elmas's *kelams* have been examined through the established patterns of creation myths. Additionally, efforts have been made to introduce these two Kurdish communities and their texts to provide an understanding of their religious, cultural, spiritual, and mythological heritage, thus making it accessible to researchers and readers in the field. By examining the texts of these two Kurdish religious communities and comparing common and disparate elements within them, this study aims to bring these often-overlooked narratives to the forefront of academic and cultural discourse. The methods used include structural analysis, universal patterns of creation myths, and comparative mythology. This study consists of four chapters: the first chapter covers the types of creation myths; the second and third chapters present some information about the Ezidi and Yaresan Kurds and address their creation myths and the fourth section deals with the comparison of myths and the interpretation of symbols.

Key Words: Ezidi, Creation, Hymn, Myths, Yaresan

PÊŞGOTIN

Mîtolojîya Kurdî qadeke beyar e û divê lêkolîn û xebatên zêdetir bên kirin da ku ew dîsîplîn bi şêweyekî kurdewarî cihê xwe di nav standardên gerdûnî de bigire. Ji ber vê yekê, bi vê dirûşmê, min milên xwe vedan û bi sebreke mezin ez ketim nav behra mîtosan. Bi rastî jî, digel fêrbûna cure û mînakên mîtosên dinyayê û yên Kurdan di nav demeke dûr û dirêj de, ew xebat ez fêrî sebrê kirim.

Nivîsandina tezekê li ser Mîtolojîya Kurdî hem serpêhatîyeke xelatker bû û hem jî şanazîyek bû ji ber ku ew derfeta zêrîn bi min da ku ez noqî kûrahîyên kelepora çandî û spirîtûel a Kurdan bibim û kulmeke biçûk ji axa vê keleporê bi kar bînim di hewldanên avakirina xîmên Mîtolojîya Kurdî de.

Ji ber vê yekê, di serî de, ji bo teşwîqkirin û rênîşandêrîya wî, spasîyên xwe yên taybet pêşkêşî mamoste û şêwirmendê xwe yê birêz Dr. Shahab Valî dikim ji ber ku wî, tevî hemû kêmasîyên min, li min bawer kir û ez kaş kirim nava wê qadê, her dem bi bêhnfirehî pirsên min bersivandin, bi taybetî metnên Goranî ji bo min û bo xwîneran Latînîze kirin û ferhengoka di bin metnan de amade kir.

Pêvajoya amadekirina tezê dewlemendtir û rengîntir bû bi alîkarî, pêşnîyaz û rexneyên hêja yên heval, hogir û mamostayên birêz ên wekî Gulale Kemanger, Dr. Semîh Gezer, kak Aram Zehmetkêş, Doç Dr. Kenan Subaşı û kekê hêja Sami Hezil; bi serastkirinên teknîkî yên kekê Îkbal Candan û bi hebûn û motîsvasyona hemû kesên din ên ku navê wan li jêr derbas dibe û derbas nabe: Merwan, Ayhan, Leyla, Şevîn, Rindo, Jîro, Ranya, Keya... ji hemûyan re spasdar im.

Nasır Heval BATU

Mêrdîn-2024

Ji dûnê Hozan Sîyabend û yê bavê min re û ji bo Fatoş û Kûbrayê...

NAVEROK

KURTE ..... **IV**

ÖZET ..... **V**

ABSTRACT ..... **VI**

PÊŞGOTIN ..... **VII**

NAVEROK ..... **IX**

KURTEBÊJE ..... **XI**

DESTPÊK **1**

1. MÎTOSA AFIRANDINÊ Û CUREYÊN WÊ **5**

1.1. Afirandin ji Tunebûnê (*Creatio ex-nihilo*) 6

1.2. Afirandin ji Kaosê (*Creation from Chaos*) 8

1.3. Afirandin ji Dê û Bavê Dinyayê (*World Parent Creation*) 9

1.4. Hatina ji Dinyayeke Din (*Emergence*) 10

1.5. Afirandin bi Noqavkarê Dinyayê (*Earth-Diver Creation*) 11

2. MÎTOSA AFIRANDINÊ LI GORÎ KURDÊN ÊZIDÎ **14**

2.1. Kurdên Êzidî 14

2.2. Çavkanîyên Rîwayetên Mîtolojiya Kurdên Êzidî 19

2.3. Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Êzidî de 21

3. MÎTOSA AFIRANDINÊ LI GORÎ KURDÊN YARSAN **34**

3.1. Kurdên Yarsan 34

3.2. Çavkanîyên Rîwayetên Mîtolojiya Kurdên Yarsan 38

3.3. Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Yarsan de 40

3.3.1. Mîtosa afirandinê di Defterê Şêx Emîr de 40

3.3.2. Mîtosa afirandinê di Defterê Xan Elmasê Loristanî de 49

4. BERAWIRDKIRINA MÎTOSÊN AFIRANDINÊ YÊN KURDÊN ÊZIDÎ Û YARSAN **57**

ENCAM.....69

ÇAVKANÎ.....71

KURTEBÊJE

b.:	**:** Berg
b.n.b:	**:** Berhema nav borî
bnr:	**:** Binêrin
d.g.:	**:** Dîroka gihiştinê
Ed.:	**:** Edîtor
h.b.:	: Heman berhem
h.g.:	: Heman gotar
hj.:	**:** Hejmar
h.t.:	: Heman tez
hwd.:	: Her wekî din
nql.:	: Neqilkêr
r.:	: Rûpel
snz.:	: Sal nayê zanîn

DESTPÊK

Bêjeya mîtos a ku di eslê xwe de yeke Yewnanî ye (*mythos*) wateya gotin û çîrokê dihundirîne. Ev peyva ku bi Ingilîzî jê re *myth* tê gotin, bi Kurdî wekî çîrok jî tê zanîn. David Adams Leeming dide zanîn ku mît piranî wekî çîrokên dînên pagan hatine nirxandin: "Di heman demî de em mîtan wekî çîrokên xwedawend û lehengên wan dînan disenifînin ên ku em bawerî pê nayênin". (Leeming, 1990:3). Mîtos an ku mît her çend di nav dînan de cihekî mezin girtibin jî, her wiha di ravekirina rûdanên sirûştî û sersirûştî, têgihîştîna mijarên dîrokî û civakî û di dahûrandina derûnîyî de jî heta îro kelk jê hatîye wergirtin. Mîtos zêdetir ew vegêran in ku tê de qala afirandin û bi dawî hatina cîhan û gerdûnê, çêbûna mirov û afirîdeyên din, teşegirtin, pêşveçûn û têkçûna çandekê, hwd. tên kirin. Di civakên kevn de, yên ku ne xwedî nivîsê bûn, pêwistîya wan bi gotinê (*logos)* hebû, qewl û çîrok û hwd. digotin û bi gotina devkî ew mîtos ji nifşekê ta nifşeke din derbas dikirin. Mîtolojî jî zanista analîzkirina alîyên cuda (dînî, edebî, felsefî) yên vegêranên mîtîk e û di heman demî de bi têgehiştina wateyên wan re mijûl dibe. Mîtolojî ji bêjeyên *mythos* (gotin-çîrok-qewl) û *logos* (aqilane, rasyonel) pêk tê ku ew jî hewl dide çîrok û qewlên derbarê xwedawend, leheng, bûyer, kes, dem, cih û afirîdeyên curbicur ên fenomenal di encama lêhûrbûneke rasyonal de rayêxe ber çavan.

Bi awayekî pir sade, îro, ji bo her tiştê ku ne rast be mirov bi hêsanî dibêjin "ew mîtos (*myth)* e" an ku "ne rast e". Ji alîyekî din ve jî rasteqînîya mîtosan bi nêrîna Leeming wekî '*abstract reality'* tê bilêvkirin an ku ew jî wekî dîn û zanistê, rasteqînîyeke razber e (Leeming, 1990: 4). Ravekirin, têgehiştin û neqilkirina mîtosan ji çandekê ta çandeke din diguherin, ji ber vê çendê, her dîn, bawerî, netewe û hwd. xwedî mîtolojîyekê ye, bo nimûne: Mîtolojîya Hindîyan, Mitolojiya Kurdan, Mitolojîya Xrîstîyanan û hwd. Lê ji alîyekî din ve mirov lê binêre, hin gel û dîn çîrokên xwe wekî rastîya xwedayî dibînin û yên din jî mîtîk an ku "çêkirî" dibînin.

Mît ne tenê çîrokên çand û dînên berê yên Yewnanîyên Antîk, Romayî, Norsî û Misrîyan in. Vegêranên pîroz û sersirûştî wekî ku di nav Mesihî, Musilman, Cihû, Budîst û Taoîstan de hene, di heman demî de di nav gelên *anîmîst* (yên ku bawerdikin ku gerdûn û hemû şênberên sirûştî xwedî

ruhekî ne) de jî hene, ên ku ji kevn de bi awayekî nerênî peyvên *pagan* û *prîmîtif* lê hatine barkirin. (Leeming, 2010: xvii)

Her çand li ser koka xwe şîn dibe û li gorî wê *habîtatê* teşe digire ya ku tê de dijî û mîtosên wan jî li gorî wan dibin ên herêmî û lokal, lê dema berawirdkirineke navbera mîtosan de were kirin, wî demî dibin ên gerdûnî jî, hetta bi vî rengî dibin mîtosên *arketîp* ên ku tê de qalib û taybetmendîyên hevpar hene. *Arketîp* an sembolek, qalibek an jî lehengekî sereke ye ku hizr an jî konseptên gerdûnî temsîl dike yên ku di nav mîtos, wêje û vegêranan de tên dîtin. *Arketîp* wekî mînakekê an jî modelekê ye ku di nav vegêranan de reng vedide. "*Arketîp* qalibeke diyarker a geşedana mirovî ye ku tê de qaîde hene vê geşedanê rêk dixe." (Adamski, 2011: 566). Di mînaka lehengî de, leheng bi rê dikeve, tûşî zor û zehmetîyan dibe, li hemberî dijminan şer dike û di dawîyê de bi ser dikeve. Ew rêzebûyerên ku bi serê lehengê/î ve tên *arketîpa* wêrekî, berxwedêrî û têkoşêrîya li hemberî rikeberîyê ye. Arketîp hêmanên bingehîn ên mîtosan in û wekî sembolên gerdûnî hewl didin peyam û wateyên kûrtir bigehînin ji me re di derbarê hebûna mirovantiyê de. Herwiha, mîtos jî li dora karakterên arketîp şîn dibin; ên wekî leheng, şîretkar, kesê xirap û şampaz. Ew arketîp, babet û hizrên gerdûnî dihewînin ên ku han didin ji çand heta çandeke din û ji nifş heta nifşeke din û ji bo ku mirov karibe baştir ji *kozmosê*, civatê û ji hizr û hestên mirovan fêm bike, rê nîşanî me didin. Arketîp her wiha ji me re çarçoveyekê dadine ji bo ku em mîtosan fêm bikin û rave bikin, bi xêra arketîpan, di nav vegêranên mîtîk de, em girîngîya sembolîk û tebeqeyên kûrtir ên wateyê derdixînin holê. Bi kurtasî, arketîp ji bo vegêrana mîtolojîk kereste ye; û mîtos jî platformek e ji bo ku mirov bi dû babetên arketîp biçe û wan vegêrîne.

Rêbazên ku hatine bi kar anîn, dahûrandina *struktûrel* (binyadi), qalibên gerdûnî yên cûreyên mîtosa afirandinê û mîtolojîya berawirdî ne. Bi dahûrandina binyadî, carinan peyv bi peyv, hevok bi hevok, malik bi malik û carinan jî bi awayekî holîstîk li ser qewl û kelaman hatîye rawestan û xalên bi mîtosa afirandinê ve têkildar hatine kifşkirin û ravekirin. Bi xêra vê rêbazê, xwîner têdigihîjin ka sembol, metafor û motîfên mîtîk di nav metnan de çawa hatine sazkirin û mîtos çawa ji bo me wateyekê ava dike. Helbet, di vî warî de curbicur pispor xebat kirine yên wekî Roland Bartez, ê ku di

dahûrandina edebî de, bi nêzîkbûna binyadgerî, metnan bi hêmanên binyadî ve dabeş dike û hewl dide têbigehe ka wate çawa ava dibe; Tzvetan Todorovê ku li ser taybetmendîyên binyadî di janraya fantastîk de radiweste û ji bo analîzkirina binyadên vegêranan nêzîkbûneke formalîst bi kar tîne. Di gel yên jorê, binyadgerên wekî Mikhail Bakhtin, E. M. Forster, Jonathan Culler jî hene di gel Clause Levi-Straussê ku di analîzkirina mîtosan de rêbazên binyadgerî disepîne û hewl dide nîşan bide ka binyad çawa dibe sedema karîgerîyekê li ser teşegirtina vegêranên çandî. Bo nimûne, di gotara xwe de, wekî di vê jêvegirtina di jêr de Clause behsa çendîn hîpotezan dike di derbarê dahûrandina struktûrel de: "Eger di mîtolojîyê de divê mirov bi dû wateyekê de biçe, ew wate ne di hêmanên îzolekirî de yên ku di kompozîsyona mîtosê de cih digirin, lê bi tenê di forma hevgirtî ya wan hêmanan de tê dîtin (Levi-Strauss, 1955: 431).

Yek ji rêbazên ku di vê xebatê de hatine bi kar anîn wekî di jor de jî hatibû behskirin, analîzkirina metnan e li gorî qalibên gerdûnî yên cûreyên mîtosên afirandinê. An ku, li gorî qalibeke spesîfîk ya pênc cureyî, metnên Kurdî tên analîzkirin û hêmanên mîtîk ên afirandinê tên şîrovekirin. Ev pênc cûreyên ku ji alîyê David Adam Leeming ve hatine sîstematîzekirin û di pirtûka wî ya bi navê Mîtosên Afirandinê Yên Dinyayê de hatine bi kar anîn, helbet ew ne bi tenê karê Leemingî ye û ew bi xwe jî vî tiştî bi aşkerayî bi me dide zanîn û dibêje ew qalibên ku wî bi kar anîne encama xebatên hêja ye, yên mîtolojîst, olnas, derûnnasên wekî Joseph Campbell, Marie-Louise von Franz, Mircea Eliade û Charles H. Long (2010: XV). Bi rêya vê qalibê jî, metnên Kurdî zêdetir malik bi malik tên analîzkirin û biryara vî tiştî tê dayîn ka nîşaneyên kîjan cure mîtosa afirandinê di malikan de çawa û heta çi astê hene an jî nînin.

Rebazeke din jî mîtolojîya berawirdî ye ku ew jî vê derfetê bi me dide da em karibin, bi rêya berawirdkirina hevtayî û ta radeyekê jî cudahiyên di navbeyna wan mîtolojiyan, di şopa dîn û çandan de biçin lewra danberheva cudahîyên di navbeyna mîtolojîyan zêdetir erkê partîkûlarîstan (kesên ku bi dû hûrgilîyan de diçin) e; ne yê komparatîvîstan (berawirdker). "Zîra mîtolojîya berawirdî, berawirdkirina mîtosên

çandên cuda ye û amanca wê destnîşankirina tema û taybetmendîyên hevpar ên wan çandan e" (Littleton, 1982: 32).

Amanca giştî ya vê tezê nasandin, pîvandin û hewla dewlemendkirina korpusa Mîtolojîya Kurdî ye. Ji alîyê nasandinê ve Ezidî û Yarsan bi mîtosên xwe tên nasandin; ji alîyê pîvandinê ve, tê dîtin ka heta çi astê korpûsa mîtolojîya Kurdî bi taybetî ji alîyê lîteratûr û zimên ve têrker e yan jî kêmasî çi ne. Her wiha ew xebat dixwaze bibe beşek ji wê korpûse, an ku wekî pêştir jî hatibû gotin, ji alîyê zimên û ji alîyê naverokên nivîskî ve ew qad yeke beyar e, ji bo ku di paşerojê de *kanoneke* Mîtolojîya Kurdî pêk were, ew xebat jî feyzê ji xebatên pêştir distîne û ji vê xebatê hêvî ye tevî kêmasîyên xwe bibe feyzek ji bo xebatên hêj berfirehtir û kûrtir li dahatûyê. Ji alîyê giringîyê ve jî divê bê gotin ku herî kêm destkefteke girîng a vê xebatê ew e ku girîngîya daxilkirina metnên Kurdî di nav çarçoveya gerdûnî ya xebatên mîtolojîk tê zanîn.

Wekî di jor de jî hatibû gotin, ji alîyê dahûrandina mîtosan ve, sînorên vê xebatê, bi qewlekê û du kelaman ve diyarkirî ne ji ber ku ew her sê metnên hilbijartî rasterast bi mijarên afirandinê re girêdayî ne, ji bo kelaman du metn û ji bo qewlan jî metnek hatîye bi kar anîn ji ber ku qewla ku hatîye bi kar anîn ji bo çarçoveya xebatekê wisa têrker hatîye dîtin, lêbelê ji bilî wan metnan jî helbet bêhtir metnên din ên Kurdî hene ku tê de mîtosa afirandinê cih digire. Ji bilî sînorên *textûel,* her wiha sînorên rêbazî jî hene ku yek ji wan jî bi kar anîna tîpolojîyeke qalibên mîtosa afirandinê ye. Her çend zêdetir tîpolojîyên din ên alternatîf hebin jî, yên ku ji alîyê Raymond Van Over (şeş cure), Martha Weigle (heşt cure) û hwd. ve hatine pêşkêşkirin, ev xebat bi tenê tîpolojîya pênc cureyî ya di beşa yekem de tê behskirin bi kar tîne Di xebateke wisa de, helbet mirov tûşî çend zehmetîyên baw dibin, ên ku di xebatên bi vî rengî de bi giştî xwe nîşan didin ên wekî nezanîn û mitmane nebûna derbarê paşxaneya dîrokî, hebûna hestîyarîya sîyasî û dînî, têgehiştina pêwendî (*contextual),* kêşeyên tîp veguhestinê (*transliteration)* û hwd. Lêbelê ji alîyekî din ve jî dudilîya bi kar anîna termên mîtolojîk ên Kurdî–çi werger çi *otantîk*–her bûye xemek li seranserê vê xebatê.

1. MÎTOSA AFIRANDINÊ Û CUREYÊN WÊ

Mîtosa afirandinê vegêranên temsîlî ne ku di nav de behsa wan tiştan tê kirin; xwedawend, gerdûn, roj, stêrk dinya, mirov, bûnewerên din û behr û çiya û hwd. çawa çêbûne. Ew mîtosên ku derbarê afirandina kaînatê de ne, wekî *kozmogonîk* tên zanîn û yên ku derbarê afirandina mirovan de ne, wekî *antropogonîk* tên bi nav kirin û ji wan mîtosan re yên ku behsa afirandina xwedawendan dikin yên *teogonîk tê gotin.*

Mitosên afirandinê hewl dane xwezayê û bûyerên fenomenal rave bikin. Têkilîyeke xurt di navbeyna mîtosên afirandinê û dînan de heye ji hêla pîrozbûnê ve. Di mîtosan de jî xwedawendî û pîrozbûn heye, ji ber wê jî Eliade (1963: 6) ji bo mîtosan dibêje 'çîrokên îlahî' (*sacred stories*) û lê zêde dike "Mîtos dîrokeke pîroz rave dike; bûyera ku di serdemên *primordial (*serdemên *fabilî* yên "destpêkî/bineretî") de qewimîye bi îro ve girê dide. Bi gotineke din, mîtos rave dike ka rasteqînî çawa bi rêya kiryarên bûnewerên sersirûştî, hatîye der". (Eliade, 1963: 5).

Mîtos lihevgîrêdayîbûna (*interonnectedness)* he-bûna mirovî û sersirûştî rave dike û nîşanî me dide ka hêzên îlahî çawa teşeyek daye dinyayê. Mîtos bi rêya vegêranên sembolîk, alemeke şêlû zelal dike ji me re. Bi rêya mîtosan, girêhişka he-bûnê sist dibe û tê dîtin ku jiyan jî ne wekî alemeke cuda lê wekî alemeke ku ji "destpêkê" ve girêdayî bi hêzên îlahî û mîstîk ve beşeke ji kozmosê ye. "Mîtos nîşanî me dide ku dinya, mirov û jiyan xwedî esil û dîrokeke sersirûştî ne û ew bingeh û dîrok tijî ne bi bûyerên biqîmet û biîbret" (Yonar, 2015: 25). Di her çandê de, mîtosek an jî çend mîtosên cuda hene ji bo afirandinê. Naveroka mîtosên afirandinê ji ber cihêbûna erdnigarî, keş û hewa, ziman, dîn, dem û rûdanên dîrokî yên bi ser wan milletan de hatine û ji ber çendîn sedemên din curbicur in. Lê ji bilî pirbûn û curbicurbûna naveroka mîtosên afirandinê, her çend pisporên vî warî behsa zêdetir cureyên binbeşên mîtosa afirandinê bikin jî, cureyên ku bala me wê li ser be, wekî di jêr de hatine diyarkirin, pênc in.

1.1. Afirandin ji Tunebûnê (*Creatio ex-nihilo*)

Cureyekî ji mîtosên afirandinê ye ku bi latîni jê re *creatio ex nihilo* tê gotin. Li gorî vî cureyê afirandinê, her tişt ji tunebûnê çêbûye; ji hîçê hatîye afirandin. Bi awayekî kurt, mirov vî cureyê afirandinê di jiyana rojane de pir dibihîse ji ber ku dema mirov behsa afirandina ji tunebûnê bike, ewil afirandina xwedayî tê bîra mirov a ku di hemû dînên kitêbî de tê qebûlkirin. Li gorî *hermenûtîkên* dînên îbrahîmî, xwedayî kâinat ji tunebûnê/hîçê afirandîye. Bo nimûne, di Quran'a misilmanan de çend ayet hene ku derbarê çebûna dinyayê ya ji tunebûnê me agahdar dike. "Ew Xweda bû ku di nav şeş rojan de bihuşt û dinya afirandin" (Quran 11: 7). Di vê ayetê de her çend behsa ji tunebûnekê nehatibe kirin jî, behsa materyalekê jî nehatîye kirin a ku beriya dinyayê hebûye û dinya jê an jî pê hatibe afirandin. Di sûreyeke din de jî tê gotin "Ew Xweda bû ku erd û esman ji tunebûnê, bêyî nimûneyekê, çêkir û afirand. Ku ew biryara hebûna tiştekê bide, bi tenê bibêje 'çêbe', ew tişt jî zû çêdibe" (Quran 2: 117). Ji bilî afirandina dinyayê ji tunebûnê, her wiha di pirtûka pîroz a misilmanan de behsa afirandina mirovan jî bi awayekî cuda tê kirin, "Hûn çawa dibin kafir li hemberî wî Xwedayî yê ku jiyan bexşande we dema hûn mirî bûn…" (Quran 2: 28). Lê wisa diyar e, di ayeteke din de jî, berovajî afirandina dinyayê ya ji tunebûnê ya ku ji hîçekê hatîye der, mirov bi keresteyekê hatîye çekirin wekî ku di Quranê de hatîye neqlkirin "Yê ku hûn ji herîyê afirandine û piştre jî emrê we diyar kirîye Ew e" (Quran 6: 2).

Vegêranên mîtosên kozmogonîk û antropogonîk ên Cihûtî û Xrîstîyanîyê dişibin ên Îslamê. Li gorî pirtûka pîroz a Cihûyan a ku wekî Pirtûka Afirandinê (*Book of Genesis*) tê zanîn, Elohîm (Xwedê) bihuşt û dinya di şeş rojan de afirandîye û roja heftemîn jî kirîye rojeke pîroz. Di heman pirtûkê de ya ku ji alîyê Xrîstîyanan ve jî wekî Ehda Kevn (*Old Testament*) tê bi nav kirin, Yehwa (Xwedê) mirovê yekem, Ademî ji tozê diafirîne û ew di Bihuşta Edin (*Garden of Eden*) de bi cih dike. Yek ji wan ayetên Pirtûka Pîroz (*Old Testament*) a Xrîstîyanan dibêje: "...li dinya û esmanan binêre. Li tiştên di nava wan de binêre û qebûl bike ku Xwedê ew afirandine dema tu tişt li holê tunebû û her wiha bizane ku mirov jî bi heman awayî hatin afirandin*"* (Makkabîyan:

28). Di heman demî de, di Ehda Nû (*New Testament*) de jî, ravekirinên li ser afirandina ji tunebûnê (*creatio ex nihilo)* dişibin ên di Ehda Kevn û Quranê wekî me di jor de jî behs kiribû.

> Ew metnên ku bi awayekî dubarekirî di Ehda Nû de derbas dibin di derbarê afirandina ji tunebûnê de ew in: di Romayî 4:17an de ya ku tê de Paul dibêje 'Xwedê emir kir û tiştên ku tune bûn, çêbûn'; û di Îbranî 11:13an de ku tê de tê gotin 'ya ku tê dîtin ji ya ku nedihate dîtin derhat (May, 2004: 27).

Alimên her du dînan, ên Cihûtî û Xrîstîyanîyê di wê bawerîyên de bûn ku Pirtûka Afirandinê ji alîyê Musa pêxember ve hatibû nivîsandin, lê xebatên zanistî nîşanî wan dide ku ew pirtûk sedan sal piştî zayîna Mûsa pêxember hatîye nivîsandin; ne yeke dîrokî ye lê pirtûkeke mîtolojîk e. Her sê dînên kitêbî fikra afirandina kâînat û dinyayê dispêrin bi hêzekê ku quweta wê li ser her tiştî re (*omnipotent*) ye; ew hêz di her wextê û her derê (*omnipresent*) ye û ew hêz her tiştî dizane (*omniscient*) û vegêranên dîn û bawerîyên din jî wekî xapînokekê wesf dikin. "Mirovên dînên Îbrahîmî (Cihû, Mesihî, Musilman) çîrokên xwe wekî rasteqînîyên xwedayî dibînin dema ku bi hêsanî jî kiryarên nepêkan ên fêlbaza Efrîkayî, Ananseyê an jî yên Jinepindira Amerîkî ya Binecih wekî mîtosê bi nav dikin." (Leeming, 2010: 37).

Me gotibû pêwendîyeke kûr di navbeyna mîtos û dînan de heye, lêbelê ew ne tênê dînên îbrahîmî ne, her wiha di dîn û çandên din de jî mîtosên li ser afirandinê hene: yên Mayayî, Brahmanî, Budîst, Amerîkîyên Niştecih (Çermsor), Misrîyên serdema Fîravûnan, Kelt, Îskandînav û yên çendîn bawerî û milletên din. Ji afirandina xwedawendê Haîtîyîyan, Taaroayê bigire heta afirandina gerdûnê ji alîyê xwedawendên Mayayîyan, Tepeu û Gukumatz; ji afirandina Ehrîman û Ehure Mazde bigire heta çêbûna dinya û mirovan ji ava bedena xwedawendên Misrîyên antîk û bi hezaran mîtosên din ên ku di vê kategorîyê de hatine tomarkirin îro li ber dest in. Bo nimûne, di *teogonîya* (çêbûn/afirandina xwedawendan) Brahmanîyan de jî, xwedawendê wan yê mezin Brahman ji tunebûnekê tê wicûdê:

> Berî her tiştî nebûn hebû, ne jiyan û mirin, ne şev û roj, ne deng û livîn… tunebûneke bêdawî û bêdengîyeke bêsînor… ev tunebûn guherî, bû Vishnu, Vishnu bû

> okyanûs…Dema wext tewaw bû, afirînerê mezin hişyar bû ji xewê. Navê afirînerê mezin Brahman bû. Ew, wext bi xwe bû, ezel û ebed bû; jiyan û mirin bû û jinûvedayikbûn bû… (Şanlı, 2020: 105).

1.2. Afirandin ji Kaosê (*Creation from Chaos*)

Peyva kaosê tê wateya alozî, geremolî, tevlihevî û hwd. Helbet di mîtolojîya Grekan de wateyeke spesîfîktir ji bo vê termê heye "…kaos cihekî nediyar (bêsînor, bêdawî) bû beriya dinya hat afirandin". (Probert Encylopedia Mythology, 2024). Di vî cureyê afirandinê de wisa tê zanîn ku gerdûn û xwedawend an jî mirov ji tevlihevîyekê an ku ji kaosekê dixuliqin an jî tên xuliqandin û dertên. Di afirandina ji tunebûnê de, tê zanîn ku berîya xwedewendan tu tişt tunebû û her ew hebûn lewra her ezel û ebed bûn û wan gerdûn û mirovantî ji tunebûnekê afirandin, beramberî vê bawerîyê, di afirandina ji kaosê de îddia ew e ku di pêvajoya afirîn û afirandinê de, an materyalek an jî tiştek her hebûye ku afirîner karîye sûd jê werbigire ji bo destpêka afirandinê. Di *creatio ex nihilo*yê de, me nîqaşa wê meselê nekir ka afirandin xwe bi xwe an jî bi rêya hêzek/xwedawendek/tiştekî rû dide; dema mirov bêje afirandina ji tunebûnê, ew çiqas tê wateya afirandina bêyî midaxaleya hêzek, xwedawendek an jî tiştekê? Lê di afirandina ji kaosê de mirov dikare bêje destwerdaneke derveyî, materyal û atmosfereke amade hene di pêvajoya afirandinê de. Bi xêra wê midaxaleya îlahî û ji 'tiştê' amade afirandin pêk tê, an ku materyal an jî tiştê heyî ji serî de nayê afirandin, bêhtir tê bi kar anîn. Herwiha, ew afirînerê herî bihêz, di her demî û her cihî de xwe dida nîşan, di vir de lawaztir e.

> Pirsgirêk ew e ku afirînerê ex nihilioyê dikare di kontekstekê fîzîkî wekî taritî û avê de hebe, lê nikare sûd ji wan wergire ji bo şiyana afirînerîyê, lê beramberî vê jî, di afirandina ji kaosê de, wisa tê hizrkirin ku materyal berîya afirînerî hebûye û wê rasterast bê bi kar anîn di pêvajoya afirandina kozmosê (pergal) ji kaosê (bêpergalî) de. Di encamê de, afirînerek bi kêmtir hêz û şiyan beramberî afirînerê di ex nihiloyê de radiweste. Dibe ku afirîner ji hêka kozmîk bihêz derketibe, lêbelê hêk berîya wî hebûye û ew jî nîşanî me dide ku afirîner bi xwe jî xwedî dayik e—wekî avên tarî û dayikî yên malzaroka gerdûnî (Leeming, 2010: 10).

Di vî cureyê afirandinê de, nîzamek/kozmosek çêdibe ji tevlihevîyê/kaosê. Ew kaos nediyarîyek e, lê tiştek e ku wekî materyalekê bi kelk tê ji bo afirînerî. Li dinyayê gelek nimûneyên vî cureyê afirandinê hene wekî di mitolojîyên *Kojiki'ya* Japonan,

Henaseya Kaînatê ya Çînîyan, *Şefê Esmanan a* Salişîyên Hindîstanê, *Hêka Krîstalî* ya Gelên Slavî, Behra Mayayîyan û çendîn ên din. Yek ji nimûneyên afirandina ji kaosê yên welatê Çînê jî vegêrana afirandina Panguyê ye. Ew di nav wan metnan de cihê xwe digire yên ku di salên 200 P.Z. û 500 P.Z hatine nivîsandin û zêdetirîn hûrgilîyên afirandinê di vê vegêranê de cih digirin beramberî vegêranên mîtîk ên Çînî. Wekî gelek mîtosên din, ew jî behsa derketin û pêkhatina pergal û kozmosekê ji tevlihevî û kaosekê û parastina vê '*kaosmosê'* dike—nîzama nû an jî kaosa teşeguhertî (veguhestî, *transformed).*

> Pangu di serî de, esmanan ji erdan ji hev vediqetîne û nîzamekê tîne... Di destpêkê de, hêkekê hemû dinya di nav xwe de dihewand. Di nav hêkê de girêyeke kaotîk hebû. Esman û erd yek bûn û hemû der di nav tarîtîyê de bû lewra ne tav û ne heyv hebû. Ji vê girêya tarî, bûnewerê ewil Pangu çêbû. Dema ku Pangu pê hesiya ku di nav tarîtîyê de, di nav hêkekê de ye û ji alîyê kaosekê ve hatîye dorpêçkirin, biryar dide nîzamekê bide kaînatê (Rosenberg, 2003: 562).

1.3. Afirandin ji Dê û Bavê Dinyayê (*World Parent Creation*)

Di vî cureyê afirandinê de, wekî ku ji navê wê tê zanîn, du *entîte (*tişt, kes, fîgûr) hene ku xwedî rolên sereke ne di pêvajoya afirandinê de; yek ji wan dê û yê din jî bav e. Her du jî bi awayekî wisa li hev zeliqîne û hev du hembêz kirine ku bûnewerên di navbera wan de difetisin, ji ber vê yekê, divê ji hev veqetin û xwe bidin alîyekî da ku hem erd hem jî esman pêk were ji bo ku zurrîyeta dayikê (erd, dinya) û ya bavî (esman) berdewam bike, ne tenê mirov û bûnewerên zindî, her wiha behr, çiya, dar û ber û tiştên din jî bi vî awayî tên afirandin. Bi li hev asêbûneke bê liv û bê colandin, erda dê û esmanê bav di nav taritîya bê dawî ya '*kaotîk'* de wisa tên fêhmkirin wekî ku di nav hêkeke kozmîk de ne, ji ber vê yekê mirov dikare bêje ev cure bi awayekî dişibe afirandina ji kaosê jî. Her çend ji ber hebûna materyalê, em bi awayekî, vî cureyê afirandinê bişibînin afirandina ji kaosê jî, di navbera wan de ciyawazîyek wisa heye ku beramberî afirînerên hebûna ji kaosê, di *entîteyên* afirandina ji dê û bavê dinyayê de taybetmendîyên nîvmirovane hene.

> Cudahiya sivik di navbeyna mîtosa kaosê û mîtosa dê û bavê dinyayê bi temamî hebûna dê û bavê dinyayê ye ya ku wekî bûnewerên antropomorfîk ên mayeyî

> têgehiştinê ne beramberî hebûna hêkan (yên kozmîk) an jî hebûna formên din ên ku kêmtir tên teswîr kirin û kêmtir tên diyarkirin (Leeming, 2010: 19).

Ji bo ku afirandin an jî veguhestinek rû bide li gorî mîtosên sereke, dê (erd) û bav (esman) ji rewşa xwe ya statîk û kevnare û heta radeyekê ji wê rewşa kaotîk divê derkevin û ji hev veqetin. Mirov dikare têkilîya erd û esmên wekî têkilîyeke cinsî jî bi nav bike. Bo nimûne, di mîtosên afirandina ji dê û bavê dinyayê yên baweriya Maorîyên ji Zellanda'ya Nû de, çend versîyonên cuda yên afirandina bi vî rengî hene ji bo ravekirina *kozmogonîya* wan. Di yek ji wan de, esman carinan dibe bihuşt jî. Yekbûna Rangi (Bihuşt) û Papa (erd) ya ku ji mêj ve rû dabû, diviya bi dawî bihata û her du ji hev veqetiyana ji bo pêkhatina afirandinê. Di mînakeke din de, piştî ji hev veqetîna du xwedawendên Japonî, Îzanamî (erd) û Îzanagî (bihuşt), li dû çavşûştina Îzanagîyî tav û heyv azad dibin.

Her çend pêştir hatibû diyarkirin ku di vê xebatê de binbeşên cureyên mîtosên afirandinê wê neyên behskirin, dîsa jî hêjayî gotinê ye ku li gorî çend pisporan, ji bilî cureyê di jor de hatîye behskirin, cureyên din ên afirandina ji dê û bavê dinyayê hene. Li gorî Leeming (20120: 16) di cureyekî din de, ne xwedawend bi xwe, lê perçeyeke laşê wê/wî vediguheze û dibe dinya. Bi nêrîneke femînîst, Shuxian Ye jî (2007:83-87) di gotara xwe de, ji bilî afirandina kozmosê ya bi jêkvebûna (*detachment*) dayik (erd) û bavî (esman, bihuşt), her wiha cih dide afirandina kozmosê ya ji hêka ezelî (*primordial egg)* û afirandina dinya û bihuştê ji alîyê Dayika Afirandinê (*Genesis Mother)* lewra tê de entîtekî nêr tune ye.

1.4. Hatina ji Dinyayeke Din (*Emergence*)

Di vî cureyê afirandinê de, ji *kozmogonî û teogonîyê* zêdetir pêvajoyeke *antro-pogonîk* bala mirov dikişîne, lewra ev cure afirandin behsa hatina ji dinyayeke din a mirov, nîvemirov û afirîdeyên din dike, an jî behsa derketina wan ji binê wê dinyayê ber bi jorê ve. Di vir de, her çend ji sedî sed di destpêkê de wekî mirovên henûke (hemçax) nebin jî peyva mirov dê bê bi kar anîn ji bo wan. Di afirandina bi hatina ji dinyayeke din de, wekî ji navê xwe diyar e, dinyayek an ku cihekî amade heye ku mirov jê tê an jî ji

binê wê dinyayê der tê bi ser rûyê erdî ve. Ji ber ku ji mêj ve dinyayek heye ji bo hatina mirovan, wî demî em dikarin bêjin xwedawend jî her hebûne û wan tiştan afirandine yên ku ji bo jiyana mirov pêwîst in, wekî roj, av û hwd. Beramberî cureyên din ên afirandinê, afirandina bi hatina ji dinyayeke din bêhtir *lokal* (herêmî) e. "Mîtosên afirandina bi hatina ji dinyayeke din, bi gelemperî, di nav Niştecihên Amerîkaya Bakur, bi taybetî jî —lê ne tenê— di nav ên herêma başûrê rojavayê wê de baw in." (Leeming, 2010: 21). Yanî, di nav Aztek, Maya, Gelê Pueblo, Meksîko û di nav qewmên niştecih ên Amerîkaya Navendî (*Mezoamerica*) de cihekî mezin digirin.

Di vî cureyê afirandinê de, mirov bêyî destwerdana *entîteyekî* nêr, ji dinyayeke din an jî ji malzaroka dinyaya heyî an ku ji binê erdî ve der tê li ser rûyê zemîn. Dinya her wekî berê, yeke mê ye, dê (dayik) ye ku zarok-mirov jê tên der (*emerge).* Lê ew hatin ne yeke hinde hêsan e. Rêwîngîyeke bi zehmet e û mirov naçar e ji çendîn qonaxan re derbas bibe ji binê erdî (yan jî dinyayeke din) heta ber bi ronahîya li ser rûyê erdî ve. Bo nimûne, li gorî mîtosa qewmê Navaho yê li başûr-rojavaya Amerîkayê, mirov ji çendîn dinya têperîne û ji çendîn azmûnên exlaqî re derbas bûne da ku bigihîjin vê dinyayê. Hetta mirov dikare, binê dinyayê bişibîne hêkeke *kozmîk* a ku mirov jê derdikevin. Qewmên niştecih ên Amerîkî (Indian Americans), di mîtosên xwe de, her bawer kirine ku mirov ji binê erdî, ji alema din a tarî hatine der, lê di rêwîngiya xwe de jî rastî azmûnan hatine. Ji bo ku bigihîjin li ser rûyê erdî, divê hin şert bînin cih da ku heq bikin wekî mirov li ser rûyê erdê hebin û bijîn. Di mîtosa Apaçîyan de, mirovên di binê erdî de gazî gamêşekî kirine da ku bi rêya şaxên wî hilkişin jor, an ku bi ser rûyê erdî ve. Qewmê Arikarayî erd kolane û wisa hatine der. Li gorî mîtosa Hopiyan jî, ew bi rêber û pêşengîya pîrehebokê ji binê erdî hatine der.

1.5. Afirandin bi Noqavkarê Dinyayê (*Earth-Diver Creation*)

Di vî cureyê afirandinê de bala me bi taybetî li ser afirandina dinyayê bi xwe ye an ku ji afirandina mirov û xwedawendan zêdetir, wekî beşeke *kozmosa* mezin, dinya bi xwe mijara afirandinê ye di vir de. Ji bilî xwedawendên ku carinan emrê afirandina

dinyayê didin, di vir de her wiha ajel hene ku xwedî roleke sereke ne di bi cih anîna wê emrê, an jî pirî caran ferîşte û xwedawendên ku di forma ajelan de hene, piranî balinde ne an jî yên wisa ne ku dikarin di nav avê de jî bijîn. Ji xeynî ajelan, avên ezel û ebed ên ku di forma okyanûs û behran de hene yên ku ajel li ser in, an jî çîya û şûnên dûr û nediyar hene ku ew ajel an jî ferîşte diçin kulmeke herî, kevir, tarçiq, ax an jî durr tînin da ku pê dinya/erd bê avakirin wekî Erminie Wheeler-Voegelin jî di berhema xwe de pênase dike:

> Di nav mîtosên orîjîna dinyayê yên Nişteciheên Amerîkaya Bakur, lehengê wê çandê çendîn ajel dişînîn di nav avên ezel an jî avên lehîyê da ku ji bo avakirina dinyayê ji binê avê perçeyeke herî/kurr/tarçiq an jî xîzê bînin. Ajelên curbicur ên wekî balinde û yên avî tên şandin ji bo binê avê ya ku erd nixumandîye. Ajel yek bi yek têk diçin; a dawî bi ser dikeve, lêbelê dema ku digihîje li ser rûyê avê, di kulm û pençên wê de piçek herî an jî xîz heye, ajel bi xwe jî nîv-mirî ye. Piştî beşeke mezin ji ajelên din têk diçin, carinan ên ku bi ser dikevin circ (*muskrat*) in, carinan jî qundûz (*beaver*), binavokên biçûk (*hell-diver*), kulîyên behrê (*crawfish*) û banevank*(mink*) in ku bi ser dikevin di anîna kulmeke herî an jî tarçiq û li ser rûyê avê û ew tarçiq jî bi awayekî efsûnî mezin dibe û vediguheze û dibe dinyaya îroyîn (Wheeler-Voegelin 1949: 334).

Mirov têdigehe ku dinya an jî gewhera wê bi xwe amade ye, yanî di bin avê de maye, an ji ber lehîyê, an jî ji ber kaosa ku pêştir rû daye hêj dor nehatîye avedankirina wê. Ji ber vê, ajel noqav dibin û diçin pençeke tarçiq tînin ji gewhera erdê îro ku em li ser dijîn. Ew gewher jî ji alîyê Leeming (2010: 24) ve wekî *prima materia* an ku kereste/materyala sermedî/ezel hatîye neqilkirin. Beramberî afirandina ji tunebûnê, xuya ye di vir de ji bo afirandinê materyalek pêwîst e. Ev cure mîtosên afirandinê helbet di nav piraniya milletên dinyayê de hene, lê bi taybetî jî di nav Nişteciheên Amerîkî û Asyaya Navendî û Rojhilata Dûr de hene: wekî mîtosa afirandinê ya Japonîyan, *Ainuya* ku tê de çûkek ji alîyê xwedawendê afirîner tê şandin ji bo ku biçe nav avê û avê bi vir de û wê de bipeşkîne û dêla xwe tê de vegezîne û dûrgeyan biafirîne da ku xelkê Ainu yên îro lê bijîn. Bi heman rengî, mîtosên milletên ji herêmên curbicur ên dinyayê jî hene: bawerîyên spîrîtuel ên Cherokeeyên Daristanên Başur-rojhilatê Amerîkayê, mîtolojîya Iroquouisên Nişteciheên Amerîkî, Mîtolojîya Fînlendî Väinämöinen û mîtosên qewmên Yoruba yên Efrîqî, mîtosên afirandinê yên Ob-Ugrîk ên qewmên Sîbîryaya Rojava û çendîn mîtosên din di vê kategorîyê de cih digirin. Yek ji wan mîtosên afirandinê ya

noqavkarê dinyayê di Mîtosên Afirandinê yên Altayîyan de bi vî rengî ye: “Bay Ûlgenî mirov (Erlîk) afirand, da ku ew jî karibe bifire wekî Ülgenî. Ülgenî ew xiste şiklê qazan…” (Şanlı, 2019: 26). Afirîdeyê ku Bay Ülgen diafirîne, ji hedê xwe derbastir dibe û hewl dide bi ser Bay Ülgenî ve bifire, Bay Ülgen jî vî tiştî qebûl nake û Erlik siza dike û ew dikeve li ser rûyê erdî, êdî baskên wî ter û şil in, nikare bifire, lêborînê ji afirînerê xwe dixwaze û afirîner jî ji bo ku wê bibexşîne jê re emir dike da ku noqî nav avê bibe û tarçiqê bîne ji bo ku pêşî dûrgeyek ava bibe û piştre jî veguhese bibe dinya.

> …bikeve nava avê, noqî herî jêr bibe, di binê avê de tarçiq heye, wê bîne û tu yê bigihîjî mirada xwe’. Erlîk spasdarê xwedawendê xwe bû ji bo ku daxwaza wî hatibû qebûlkirin, bi çoş noqî nav avê bû, ber bi cihê herî kûr ve çû, wekî xwedawendî gotibû, di kûrahîyê de tarçiq hebû, her du destê xwe tije kirin bi tarçiq, bi lez derket li ser rûyê avê, Bay Ülgen li bendê bû, Erlîk ew tarçiq pêşkêşî Bay Ülgenî kir. Bay Ülgen ev tarçiq belavkir li ser avê û tarçiq bû dûrgeyeke biçûk û li ser avê rawesta, bi emrê xwedawendî, mezintir bû, xwedawendî lê nihêrî û got ‘piçeke din jî tarçiq pêwîst e’. Erlik careke din noqî nav avê bû… (Şanlı, 2019: 27).

Wekî me di destpêka danasîna mîtosên di vî cureyê afirandinê de jî diyar kiribû, vegêranên mîtîk ên milletên curbicur bi taybetî qala afirandina mirov û ‘mirovantîyê’ dike. Bi rêya wan vegêranan, mirovan hewl daye behsa derhatinê an ku behsa hatina bav û kalên xwe ji kûrahîyên jêrzemînên tarî berew ronahîya li ser rûyê zemîn bikin. Wekî me di jor de jî behskiribû, di mîtosên hin milletan de, di pêvajoya afirandina mirovan de, afirîde, mexlûqat, xuliqandî û her bi çi awayî were bi nav kirin, mirovê nîvemirov, di rêwîngiya ji alema binê erdî berew li ser rûyê erdî ve, di çendîn qonax û alemên din jî têdiperin û tûşî zehmetîyan (azmûnên exlaqî û rêwiştî) dibin.

2. MÎTOSA AFIRANDINÊ LI GORÎ KURDÊN ÊZIDÎ

2.1. Kurdên Êzidî

Navê vî dînî ji xeynî Êzidîtîyê, bi bilêvkirinên cuda wekî, Êzdîtî, Êzîdîtî, Êzdayetî, Êzdîyetî jî tê zanîn di gel peyva Yezdanîtî (Izady, 1992: 153). Yezdan pirî caran li şûna peyva Xweda (afirînerê Êzidîyan, wekî Xwedê û Xuda jî tê bilêvkirin) jî tê bi kar anîn, her çend ji alîyê peyvnasîyê ve lêk neçin jî: Yezdan wekî 'yê ez dam' (ez afirandim)' û Xweda jî wekî 'yê ku xwe da' (xwe afirand) tê şîrovekirin. Hetta ji ber hebûna *avatarekî* Xwedê yê wekî Melekê Tawis û ji ber rêza ku li Melekê Tawis tê girtin, Êzidî ji alîyên cîranên xwe yên misilman ve bi awayekî şaş wekî şeytanperest tên bi nav kirin. Herwiha ji ber li hev nêzîkbûna peyvan, ji alîyên Şîeyan ve di navbera Êzidî û Yezîdê kurê Muavîye jî pêwendîyek tê avakirin. Heçku wekî peyrewên Yêzîdê kurê Muavîyeyê ne, an ku Yezîdî ne û dema bi Tirkî jî bê nivîsandin wekî *Yezidi* tê xwendin û ev tişt *konnotasyoneke* xirap pêk tîne. Lewra wisa tê zanîn ku ji ber zêdekirina tîpa Y'yê jî tûşî fermanan bûne. Di serdema dîrokmendbûna vî dînî de çend rewt û komên cuda hebûn ku di bin sîwana vî dînî de bûn û hemû wekî Êzidî dihatin zanîn, lê di sedsala 13em de bi tenê ji wan kesan re yên ku berê Adewî bûn, Êzidî dihate gotin.

> Êzidî civakeke biçûk a Kurdan e. …Şêx Adî di sala 1160 an jî 1162an de wefat kir. Peyrewên wî yekbûna xwe domand ji ber dilsoziya wan bo Şêx Adî. Paşê ew rewş wekî rewta (terîqeta) Adewîyye hat bi nav kirin. …Ji vir pê ve, tiştek nayê zanîn derbarê kesên ku dibin pêşengên rewta Adewî. Em nizanin ka peyva Êzidî ya ku di demên berê de ji bo komelgelekî dihate bi kar anîn çawa bûye bi tenê navê ev rewta taybet (Kreyenbroek û Reşow 2011: 23-25).

Bi taybetî, di nav deh salên dawî de, bi derketina rêxistina tirorî ya DAIŞê û piştî jînosîd û karesatên ku careke din bi ser Êzidîyên Kurdistanê de hatin, mijara Kurdbûn û Kurdnebûna Êzidîyan dîsa bi şêweyeke sîyasî derkete holê. Yek ji wan îddiayan Êzidîtîyê wekî civakeke *ethno-religious* (etnîkî û dînî) dide nîşan, wate: Êzidî civakeke yekgirtî ye xwedî ayîneke hevpar û paşxaneyeke etnîkî ye:

> Ez, Êzidîtîyê wekî bawerîyeke etno-dînî dibînim, bi gotineke din ez vê wekî serçaveyeke nasname-damezrîner dinirxînim. Tê zanîn ku Îslamîyet, Xrîstîyanî û Budîzm xwedî *dîskurên* gerdûnî ne; dixwazin bigehin zêdetir kesan û di nav wan de

> ji her rengî mirov û nasname hene. Lê Êzidîtî derîyên xwe ji yên derve re girtine ji ber ku dînê civakeke taybet e û bi tenê yên ku ji dayik û bavên Êzidî bûne, wekî Êzidî tên qebûlkirin (Suvari, 2019: 16).

Li gorî Suvari sedema etno-dînîbûna Êzidîtî ew e ku di serdema niha de mirov nikarin bibin Êzidî, an jî Êzidîtîya wan wekî nasnameyekê nayê qebûlkirin an ku divê ji dê û bavên Êzidî werin dinyayê da ku karibin nasnameya Êzidîtî bi dest bixin û nabe dev ji dînekî din (*conversion)* an jî dev ji bawermendnebûnê (*atheism)* berdin û piştre bibin Êzidî. Lê ji xwe dema mirov li dîrokê dinihêre hem di asta girseyî û hem jî di ya tekane de, *îhtîdakirin (*dînguhertin) bi rêjeyeke pir berz ji Êzidîtî berew Misilmanî pêk hatîye, ne ji Misilmanî berew Êzidîtî. Bi fermana kuştin û koçkirinan ji serdema Moxolan û Bedrredîn Lûlûyê Zengîyan bigirin û paşê jî bi hewldanên *îhtîdayê bi* taybetî jî di serdema Împaratorîya Osmanîyan de, hejmara Êzidîyan her kêm bûye û bi destwerdanên di dawîya 1800an de wekî Guest (2007) jî amaje pê dike bi taybetî yên Emer Wehbî Paşeyê Osmanî, ew kêmbûn gihiştîye lûtkeyê. Mirov nikare bêje hewldanek an jî daxwazek ji bo guhertina berew bi Êzidîtîyê rû daye, ji xwe guherîneke bi vî rengî ji alîyên lêkolîneran ve jî nehatîye tomarkirin. Heta wan dawîyan jî niqaş ser qebûlkirina zarokên jinên Êzidî dihatine kirin, ên ku di encama destdirêjiya DAIŞa terorîst ji dayik bibûn. Suvarî (2019) her wiha dibêje nabe mirov Êzidîyan bi kurdan ve girê bide bi tenê ji ber ku heman zimanî diaxivin. Hetta li beramberî vê hizra lawaz mirov dikare bi nêrîneke heman rengî bersiv bide: nabe mirov Êzidî wekî Kurd nebîne bi tenê ji ber ku bawerîya wan cuda ye. Bo nimûne, dema mirov li Misrîyên îro binêre, ew xwe wekî berdewamîya milletekî dîrokî yê serdema fîravûnan dibînin ku ne bawerîya wan yek e û ne jî zimanê wan li yek diçin. Lê mirov dizane ku hem zimanê Kurdên Êzidî û ne-Êzidî yek e û hem jî şopên ayînên Kurdî yên kevnare (Mîtrayî, Mazdekîtî, Zervanî, Zerdeştî) di nav Êzidîyan de hene. Ew argûmanta Suvarî yeke sûbjektîf û sîyasî ye. Herwiha, di nav beşeke biçûk a Kurdên Êzidî de jî ew îddia (ne-Kurdbûn an jî Kurd-ne-bûn) yeke baw e û hetta hin ji wan, milletê xwe Êzidî, welatê xwe Êzîdxan û zimanê xwe jî —her çend bi Kurdî dipeyivin jî— wekî Êzidkî û dînê xwe jî wekî Şerfedîn bi nav dikin.

Nivîskarê Kurd ê ji herêma Kavkazê Tosinê Reşîd ê ku bi xwe jî Êzidî ye li dijî vê hizra sîyasî ya li ser Kurd-ne-bûna Êzidîyan wisa dibêje:

> Êzidî ew kurd in ku bi hezar salan, piştî ew qas zilm û zorê, piştî ew qas kuştin, hêsîrkirin, wêrankirina gund û bajarên wan, bi zorê ji wan standin û nemakirina nîşanên olî, ola xwe ya bi bingeha xwe ve Kurdî, zimanê xwe yê Kurdî, toreya xwe ya Kurdî parastine û gihandine sedsala XXIê. Berxwedana Êzidîyan a hezar salan serbilindiya gelê Kurd e! Li vir, gotineke Serokê Herêma Kurdistanê û Partîya Demokrat a Kurdistanê, Rêzdar Mesud Barzanî tê bîra min: 'Heke Êzdî ne Kurd in, wisa ye li cîhanê miletekî bi navê Kurd tune (2010: 230).

Ji bilî hebûna dehan xebatên zanistî yên derbarê Kurdbûna Êzidîyan ên wekî pirtûkên Roger Lescot (2014), Khana Omarkhali (2014/2014), Tosinê Reşîd (2010) û Philip Kreyenbroek&Xelîl Cindî Reşow (2011), her wiha daxuyaniya Mîrê Êzidîyan a van salên dawî jî hêjayî behskirinê ye di wir de. Mîrê Êzidîyên îro, Mîr Hazim Beg (2019) jî di axaftina xwe ya di kanala têlevîzyona Rûdawê de ji alîyê bawerîyê ve Êzidîbûn û ji alîyê neteweyê ve jî Kurdbûna Êzidîyan tîne zimên. Îddiayên berovajî yên di derbarê Kurdnebûna Êzidîyan di bin dîktatorîya rejîma Seddam Hisên jî hebûn û Êzidî ji bo ku bi Kurd neyên zanîn, wekî Erebên Umeyye dihatin bi nav kirin. Hetta beşek ji Êzidîyan ew tişt bi xwe jî dikir ji bo ku xwe ji fermanan biparêzin. Dema ku mirov di dîroka ku tije bi çewisandin û zordarî û xwedî *epîstemîyeke* desthilatdar a serweran dinihêre, nabe mirov biheyire eger îro jî ew gengeşe (Kurdbûn û Kurdnebûna Êzidîyan) hêj berdewam e.

Di bawerîya Êzidîyan de bihuşt û dojeh nînin, li şûna mirinê kirasguhertin (*tenasux– reînkarnasyon)* heye. Piştî ku mirov kiras diguherînîn eger mirovên baş û pak bin, rihê wan dê bikeve bedena yên din, lê eger ên xirap û nebaş bin rihê wan dê bikeve bedena se û rawirên din. Lê hinek ji wan jî mefhûma bihuşt û dojehê qebûl dikin, ew jî li gorî Guest (2007: 62) encama danûstandina endamên wî dînî ya bi Misilman û Xrîstiyanan re ye. Helbet hin Êzidî jî wisa bawer dikin ku giyanên kirasguhertîyên Êzîdiyan jî piştî paqijbûnê di dawîya dawî digihije Xwedayê Mezin.

> Koça ruhan xîma dînê Êzidîyan ava dike. Carûbar, kesayetîyeke ezîz, bi zanebûn an jî bê zanebûn bi ruhê Êzidîyeke oldar tê dagirtin, dema wext hat, ew kes jî wî ruhî

> derbasî yekî din dike. Di mînaka herî dawî ya koçkirina pîroz a ruhî ji bo laşeke din bi Şêx Adî pêk hatîye (Guest, 2007: 64).

Êzidîtî dînekî monoteîst e. Yek Xweda heye, Xwedayî kaînat afirandîye û ew Xweda di sê avatarên girîng de xwe dide der: Sultan Ezî, Melekê Tawis û Şêx Adî. Xwedê an jî Xweda bi çendîn navên din tê zanîn: Bînaya Çavan, Rebê Alemê, Êzidê Sor, hwd. Melekê Tawis mezintirîn ferîşte ye ku serî li ber hz. Ademî xwar nekirîye û sicde nebirîye wî ji ber ku li gorî vegêranên Êzidîyan nabe ji bilî Yezdan (Xwedê) ji hêzekî an jî kesekî din re sicde bê kirin. Ji ber vê yekê jî Xwedê ew bi tohmeta bi cih neanîna emrê xwe siza dike û dişîne li ser rûyê erdî û ew ruh dikeve bedena curbicur kesên pîroz di nav pîr û şêxên Êzidîyan de. Ji ber ku ew xwedî ruhekî ebedî û bêdawî ye wekî Pîrê Her û Her jî tê bi nav kirin.

> Di bawerîya Êzidîtîyê de, Melekê Tawis hakim û keyê Esmên, Heyvê, Rojê û vê Dinyayê ye: bi xêra wî Adem sêva sor xwarîye û bi wî awayî jiyana li ser rûyê erdî guncav bûye. Ew ji bo ku alikarîya Êzidîyan bike hatîye vê dinyayê, ji ber vê yekê ji Êzidîyan re Gelê Melekê Tawis tê gotin (Korkmaz, 2015: 184).

Di civata Êzidîyan de sîstemeke çînayetîyê heye ku ji şêx û pîr û mirîdan pêk tê, ew çînayetî yeke *hereditary* (ji bavan derbasî lawan dibe*) e*, an ku nabe kesek ji derveyî *kasta* xwe bi yekê/î din re bizewice. Ji bilî çînayetîya ruhanî, hîyerarşîyeke fonksîyonel jî heye ku endamên her komê erkên xwe bi awayê ku hatine erkdarkirin bi cih tînin: qelender, koçek, qewwal, feqîr, xizmetkar û hwd. Wekî îbadetê, divê Êzidî rêzê li kesayetîyên pîroz û dînî bigirin, biçin tirbeyan, beşdarî pîrozbahî û rîtûelan bibin. Diakirin, dayîna sedeqeyê û pabendbûn bi qedexeyên dînî û civakî erkên endamên vê civata *teokratîk in.* Hin kesayetîyên dînî yên payebilind havînan 40 roj (çilê havînê) rojî digirin û her wiha zivistanê jî 40 roj (çilê zivistanê) rojî digirin, Êzidîyên din jî 3 rojên dawî yên her du serdeman rojî digirin. Nimêjek wekî ya Misilmanan tuneye lê Êzidî rojê sê dan; di hilatina rojê, nîvro û di avaçûna rojê de diayan dikin û di dema diakirinê de tevgerên wekî xwe xwarkirin ji bo rêzgirtinê û dest li hev gihandinê paşguh nakin. Sinnetkirina zarokan û wekî rîtûela *vaftîzê* morkirin jî heye, ew jî şûştina zarokan e bi ava ku ji Kanîya Spî ya li Lalişê der tê. Li gorî Maisel (2014: 151) sê şertên civakî-dînî hene ku divê rîayet lê bê kirin: Şerîet, zewaca bi tenê bi Êzidîyan re; terîqet, zewaca bi

tenê bi endamên *kastê* re; û 'derba xerqe Şêx Adî nede' an ku rêzgirtin ji bo otorîteya dînî. Her wiha pênc ferzên heqîqetê jî hene ku ji kîjan kastê dibe bila bibe nabe Ezidîyek xwe jê muaf bigire "naskirina hostayî (an ku afirîner), li dû rêberîya dînî ya pîrekî de çûn, li dû rêberîya dînî ya şêxekî de çûyin, hilbijartina *merebbîyekî (*mamoste), hilbijartina xwîşk û birayê axîretê" (Tagay û Ortaç, 2016: 74) li dû rêberîya dînî ya pîrekî de çûyin. Di Êzidîyan de cejnên herêmî û giştî hene, hin ji wan di demên diyarkirî de tên pîrozkirin û demên hin cejnan jî sal bi sal diguherin. Şeva Beratê, Cejna Erefatê, Cejna Sersalê, Gurga Gayê çend ji wan cejnan in. Lê girîngtirîn û şêntirîn cejnên Êzidîyan Çarşema Sor (ji nû ve bûn) û Cemaîye ne. Çarşema sor di biharê, Cemaîye jî payîzê tên pîrozkirin. Berîya Çarşema sor peykera Melekê Tawis di heft senceqên Êzidîyan de tên gerandin û alîkarîya aborî tê berhevkirin. Hec bi ziyaretkirina tirba Şêx Adî pêk tê. Di nav Êzidîyan de îro ji alîyê doktrînên ayînî ve cudahî di navbeyna klîkên Şengal û Şêxan û Kavkazê rû didin. Li Şêxanê Şêx Adî li Şengalê Şerfedîn kesayetên girîng in.

Îro, Kurdên Êzidî, di serî de bi nêzîkî hejmareke 600 hezar kesî li Başûrê Kurdistanê dijîn, Li bakurê Musilê û li Dûhokê, li Laliş, Baedrê, Şêxan, Beşîqe û Behzaneyê bigirin heta rojavayê Musilê li derdora Çiyayê Şingalê hene. Li Rojavayê biçûk ê Kurdisanê jî li alîyê Çîyayê Kurmênc û Cezîreyê nêzîkî 15-20 hezar Kurdên Êzidî hebûn, helbet hem li başûr û hem jî li rojavayê biçûk de guhertineke mezin çêbû di demografîya wan de piştî jenosîd û karesatên bi destê DAIŞê ve. Taşgın (2001: 737) hejmara Êzidîyên li Tirkîyeyê wekî 423 nîşan dide. Li Tirkîyeyê, bi taybetî piştî salên 1980î gelek Kurdên Êzidî koç kir ber bi Ewropayê ve, ji ber vê, îro bi tenê li Riha, Mêrdîn, Batman û gelek kêm jî li Diyarbekirê dijîn. Her çend hejmara 423 yeke kêm xuya bike jî li gorî texmînên îro ji 2.5-3 hezar zêdetir nemane. Piştî Kurdistanê, mezintirîn civata Kurdên Êzidî li herêma Transkavkazê ye, ji ber zexta olî ya dewletên serwer, cih û warên xwe bi cih de hêlabûn, gelheya wan ji nêzîkî 70-80 hezar Kurdan pêk tê. Herwiha, li gorî zanyarîyên ku Omerkhali (2014: 24-25) ji Perta Uphoff neqil dike, hejmara Êzidîyan li Rojhilatê Kurdistanê teqrîben di navbeyna hezar û çend

hezaran de ye û hindî ku ji destê wan hatîye, ji çavan dûr jiyane. Digel ku Omerkhalî wisa dibêje, derbarê Êzidîyên Rojhilatê de zanyarîyên têrker nîne û hebûna wan başebaş nayê zanîn. Bi koçkirinên ji her çar alîyan di demên cuda de, lê ji ber heman sedeman, li Ewropayê jî gelheyeke mezin pêkhatîye ku li gorî Şengul (2010: 25) bi tenê li Almanyayê 25.000 kes dijîn.

2.2. Çavkanîyên Rîwayetên Mîtolojiya Kurdên Êzidî

Ji ber nebûna serçaveyên nivîskî û teşwîqnekirina xwendin û nivîsandinê, her wiha ji ber zilm û kuştin û talanên di warên Êzidîyan de, bi awayekî sîstematîk zanyarîyên têrker ên di derbarê metnên resen ên dînî, dîrokî, felsefî û hwd. ên Êzidîyan negihiştine îro û wî dînî xwe sîstematîze nekirîye û nebûye xwedî doktrîn û têgihiştineke hevpar di nav hemû Êzidîyan de, lewra di nava nêrînên bawermendên Êzîdiyan û lêkolîneran de jî cudahî hene di warê têgehiştina Xwedê, Melekê Tawis, Şêx Adî û şêx û pîrên din, ilmîhal û rê û rismên civakî yên Êzidîtîyê û hwd. Bo nimûne, îro hem di nav beşeke ji Êzîdiyan û hem jî di nav lêkolîneran de li ser resen/*authentic*nebûna çavkanîyên wekî Mishefa Reş û Kitab el-Cilwe de gengeşe têne kirin. Giuseppe Furlani yek ji wan rojhilatnasan e ku li ser Êzidîtîyê lêkolîn kirine û bi nêzîki heştê sal beriya niha amaje bi vê kêmasîyê kirîye:

> Lîteratûreke berfireh heye li ser Êzidî û dinê wan, lêbelê kalîteya zanyarîyên tê de lawaztir e beramberî hejmara rûpelên ku li ser vê bawerîya Asyaya Rojavayî û beramberî lêkolînên ku nivîskarên curbicur li ser vê bawerîyê kirine, ku zêdetir ji wan lêkolîneran jî seyyah bûne û dema ku gihîştine Musilê sûd ji dîtina rûbirû ya bi wan kesan girtine, yên ku wekî Şeytanperest tên bi nav kirin. Hêşta, kêmasîya lêkolîneke kûr û bi her awayî zanistî heye. (Furlani, 1940: 43).

Ji bilî qewlên ku heta niha gihîştine ber dest, pirtûkên pîroz ên Êzidîyan ên sereke Cilwe û Mishefa Reş in. Cilwe wekî kitêba wehîyan tê dîtin û heqîqet tê de bi destxetan hatîye nivîsandin. Mishefa Reş jî bêhtir li ser afirandina kaînat û melek û kesan û rê û rismên jiyana Êzdîtîyê ye. Li gorî Furlani (1940: 42) di naveroka Cilweyê de, tê behskirin ku Xwedê Melekê Tawis e û mirov dikare bi vê pirtûkê û bi bi cih anîna rê û rismên vî dînî xwe bigehîne Tawis. Di her pênc beşên Cilweyê de, Xwedê kerem dike û

xwe nîşanî bawermendên xwe dide, wan hişyar dike û amojgarîyan pêşkêşî wan dike. Eger mirov vê pirtûkê bişibîne kitêbên pîroz ên Xrîstiyanan, mirov dikare bêje ku Cilwe Ehda Nû (New Testament) temsîl dike. (Furlani, 1940: 42). Mishefa Reş jî wekî Ehda Kevn (Old Testamen) e. Di Mishefa Reş de vegêran heye, behsa afirandinê, peywira Şêx Adî, çîroka hz. Adem û gunehê wî, behsa mîrên Êzidîyan, sînordarkirin û qedexeyên di Êzidîtiyê de hatine kirin. Li dijî şibandina ji alîyê Furlani ya ku tê de Melekê Tawis wekî Xwedê tê behskirin Xanna Omerxali ji Cilweya ku Isya Joseph di sala 1909an de çapkirîye neql dike ku Melekê Tawis ji alîyê hêzekî hatîye şandin an ku ne Xwedê bi xwe ye. "Beriya hemû afirandinê ev wehîy bi Melek Tâûs re bû, ku 'Abd Tâûs şand vê dinyayê ku bikaribe heqîqeta ji xelkê wî yê taybet re nas e, ji hev derxe." (Omerxalî, 2021: 54). Bo nimûne, ev rewş bi me dide zanîn ku naveroka Cilweyê wekî me pêştir jî gotibû, cihê gumanê ye. Ev her du kitêb bi çend ziman û tîpên cuda bi çend versîyonên cuda di demên cuda de derketine pêş lêkolînan. Wekî Furlanî (1940: 39) jî tîne zimên her çend her du pirtûk di salên 1162 (Cilwe) û 1342an de (Mishefa Reş) hatibin nivîsandin jî, lêkolînerên serdemê, di wê bawerîyê de bûne ku bêhna zimanekî nêzîki sedsalekê ji pirtûkan hatîye. Ew nêrîn gumanbarîya otantîkbûna naveroka her du pirtûkan zêdetir dike helbet.

Ji xeynî wan her du pirtûkan berhevkên destxetî yên ku ji qewlan pêk tên ên bi navê *Keşkûl û Mişûr* jî hene. Di nav destxet û berhevkên ku hatine peydekirin de forma qewl (nerîta devkî ya helbestên pîroz), beyt (bo serpêhatiya egîd û mêrxasan), qesîde (bo sîtayîşê) û diadiroz (dia) hene. Di beşa analîzkirina hêmayên mîtolojîk de, em ê bi giştî li ser qewlan rawestin. Wekî pêştir jî hate behskirin, qewl nerîta devkî ya helbestên pîroz e. Kreyenbroek û Reşow (2011: 90) iddia dikin ku li gorî kevneşopiya Êzidîtîyê qewl ji alîyê mirovên ezîz û zana yên "serdema Şêx Adî" hatine nivîsandin û carinan jî tê gotin ku rasterast ji alîyê Şêx Adî ve hatine wehîykirin. Her çend Furlani jî (1940: 39) Şêx Adî wekî nivîskarê Cilweyê bi nav dike jî, li gorî Kreyenbroek û Reşow (2011: 90) ji bo nivîsandin an jî wehîykirina qewlan ji alîyê Şêx Adî ve tu belge nîne vê argûmantê piştrast bike û ji ber vê çendê, li ser kevneşopa qewlan pirsên bêbersîv hêşta hene. Êzidî

taybetmendîyên mîtos û bûyerên sersirûştî yên di derbarê rah û derketina civaka xwe de, bi rêya qewlan ronak dikin. Kirasguhertin û bûnewerên ku taybetmendîyeke xwedawendî lê tê barkirin û tenasûxkirina wan bûneweran di şiklê mirovan de û mijarên bi vî rengî bandora xwe li ser naveroka qewlan hiştîye. Qewl ji nifşekê bo nifşeke din hatine veguhestin. Zimanê nifşekê dibe ku piştî heyamekê biguhere, ji ber vê çendê her çend di vegêranê de ciyawazîyên zimanî hebin jî wate, nerît û naverok her wekî xwe dimînin. Mirov nikare bêje ku bi tenê yek cureyê qewlan resen û yên din jî çêkirî ne, bo nimûne di dîroka Êzidîtiyê de jî wekî me pêştir jî gotibû derbarê kes û bûyer û hin nêrînan de cudahî hene û heta radeyekê nakokî jî hene.

> …di gel ku hejmareke zêde ji Êzidîyên ku bi hatina Şêx Adî ya ji bo Lalişê û bi qewlên ku rastiya bûyerên li du hatina wî qewimîne bawer dikin, bi heman rengî qebûl dikin ku çîrokên derbarê Şehîd b. Cer, jidayikbûna mucîzewî ya Yezîd û çîrokên wekî wê, ji efsaneyê pêvetir ne tiştek in (Kreyenbroek, 2014: 42).

Di derbarê vegêranên cuda de Kreyenbroek her wiha ji Êzidîyekî wisa neqildike:

> Ji bo me, dilên me (an ku bîrên me) pirtûkên me ne. Di derbarê cudabûna vegêranên ku heta îro hatine de –bo nimûne yek (mirovek) ku bêje agirê dojehê hatîye temirandin û yeke din bêje netemirîye; an jî yek bêje mirî wê ji nû ve sax bibin û yeke din jî bêje wê sax nebin– ev ne ew şaşî û nakokî ne ku nerîta Êzidî pê bê pîvandin lewra yên ku xwedî nêrînên cuda ne di serdemên cuda de jiyane, ne ku hemdem bûne (nql., Kreyenbroek, 2014: 42).

2.3. Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Êzidî de

Li gorî ilmîhala wan, Êzidî bawerî bi yek Xwedayî tînin ku ew jî afirînerê bihuştê, dinyayê û hemû bûnewerên zindî ye. (Furlani, 1940: 72). Qewlê afirandinê yê jêrîn behsa bûyerên afirandinê dike, di navendê de durr û afirîner hene. Vegêrana jêrîn ji qewlê afirîna dinyayê yê Êzidîyan pêk tê ku ji alîyê Kreyenbroek û Reşow (2011: 116-121) hatine berhevkirin. Xwedê ji gewhera xwe ya nûranî durrekî spî diafirîne û paşê jî vê durrê dike texta xwe. Di qewlê afirandinê yê di jêr de jî tê dîtin ku afirandina ji kaosê cureyê sereke ye ku xwe bi tarîtî û bêsînorîyê dide der.

1. Ya Rebbî dinya hebû tarî
   Tê da tunebûn mişk û marî
   Te xênda kir tezehalî
   Çu nema gul jê barî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 116).

Çarîna jorîn bi duayek (lavayîyek, lavlavek) destpê dike ku tê de gazindeya tarîbûn û nediyarbûn/şêlûbûna kozmosê tê kirin. Tarîtî helbet şêlûbûn û tevlihevîyê dixe bîra mirov. Di nav wê tevlihevîyê de jî derfeta hebûna tu zindîyan tunebû ku heta 'mişk û marî' jî an ku tu tiştek tunebû, di vir de hêjayî gotinê ye ew jî mînakeke afirandina ji tunebûnê ye û mirov dikare bêje di nav vê qewlê de mirov ne tenê cureyekî afirandinê dibîne. Bi taybet, ev gotina ''te xênda kir tezehali'' nîşan dide ku dinya ji nû ve hatîye afirandin, ew jî vî tiştî bi mirovî dide hizrkirin ka gelo berîya kaosê nîzameke din hebû? An jî gelo mirov dikarê bêje ku barîna gulan derbasbûna ji kaosê ber bi nîzamekê ve ye?

2. Ya Rebbî, tu hostayê kerîm î
   Te vekir rê û dirba tarî
   Tu hostayê her tiştî
   Bihuşt çêkir rengebî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 116).

Xwedê hostayekî afirîner û comerd e ku rêya tarî ronî dike an ku kaosa heyî û tarîtîya bêsînor serûbin dike ku ew jî rênîşandêrî û wesfê wî yê nûranî ye. Hostatîya li vir nîşan dide ku hêza Xwedê bêsînor e (*omnipotency)* û ew afirînerê her tiştekê ye. Bihuşta ku di vê qewlê de tê behskirin ne bihuşta ku *antîdota* dojehê ye, ev şibandina dinyayê ye ya bi bihuştê ve. Divê bê bi bîr xistin di vir de, hebûna dojehê di hin vegêranên Êzidîtîyê de encama danûstandinên wan e yên bi Misilman û Xrîstîyanan re. Ev çarîn zêdetir mehtê hêza Xwedê dike û şanazî bi destverdana îlahî dike, ji dêvla ku mirov bêje di vir de amajepêkirinek ji bo cureyekî afirandinê heye, di vir de zêdetir dua û nîşaneyên îbadetê hene ji bo teslîmbûn û pesendkirina serwerîya gerdûnî ya Xwedê.

3. 'Erd û 'ezman tu hebûn
   Dinya fire bê bine bû
   Însan heywan jî tunebû (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 116).

Bi gotina 'erd û 'ezman tu hebûn' tê diyarkirin ku ji rewşa destpêkê ya ku tê de tiştek tunebû, ber bi hebûna erd û esmanî ve derbasbûnek heye. Destpêkeke wisa dikare bi me bide hizrkirin ku di vir de mînakeke afirandina ji tunebûnê heye lê dîsa jî bi awayekî rasterast ew gotin têrî nake ku piştgirîya wê îddia û îmayê bike. Herwiha ji bo cureyên din ên afirandinê jî babetên têrker nebin jî, di vî qewlî de tê dîtin ku dinya û

esman ji mêj ve hebûne û di firewanîyeke mezin de bûne û heçku dinya ji alîyê dê an bavekî hatîye afirandin.

4. Te xa lê saz kir
Di behra da tenê hebû durr
Ne dimeşiya, ne dimeşiya
Te xaş ruh anî ber
Nûra xa lê peyda kir (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 116).

Her çend gotina "Di behra da tenê hebû durr" hebûna bênîzamîyê û kaosê îma bike jî zêdetir gotina "Te xa lê saz kir" behsa afirandina ji kaosê dike. "Te xaş ruh anî ber" bi me dide nîşandan ku hêzekî afirîner ruh û jiyanê dide dinyayê. Afirandineke bi vî rengî zêdetir têkildar e bi afirandina dinyayê ji alîyê dayikûbavekî wekî xwedawendekî an jî otorîteyekê. Lê divê bi cureyê afirandina ji dê û bavê dinyayê re neyê têkelkirin. Her çend behsa okyanus û durrê hebe jî, ji bo ku mirov bikare bêje ew cureyekî afirandina noqavkarê dinyayê ye, divê di vir de bi awayekî spesîfîktir behsa fîgurek an jî hebûneke xwedawendî bê kirin.

5. Goşt û ruh hatine ber
Nûra çavan lê hatine der
Dest û pê kire leş
Lê şirîn kir gotûbêj (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 116).

Di qewlê jorîn de behsa hebûna kaosekê an behsa serastkirina tevlihevîyekê nayê kirin lê pêvajoya temamkirina zindîkirinê wekî îmayekê ji bo afirandina ji tunebûnê dikare bê hisabkirin. Herwiha goşt, ruh, nûra çavan, dest û pê xwe bi xwe nayên cem hev lê hêzek wan tîne cem, bûnewerek ji alîyê hêzeke afirîner tê afirandin.

6. Xudawendê me hostayê rehmanî
Rê û dergeyê dinyayê vekir
Her tişt ji me ra deranî
Bû bihuşt 'erd û avanî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Di vî qewlî de mînakeke afirandina ji tunebûnê diyar e; bi gotina 'her tişt ji me ra deranî, tê destnîşankirin ku hêza îlahî di atmosferekê ku tê de tu tişt nîne her tiştî diafirîne. Di qewlî de, vekirina rê û dergeya dinyaye tê behskirin, ev jî heta radeyekê bi me dide hizrkirin ku di vir de dibe ku behsa afirandina bi hatina ji dinayeyeke din

(*emergenc*e) hatibe kirin, eger na, vî demî hewldanek heye ji bo ravekirina hebûn û potansîyela dinyayê.

7. Xudawendê me tiştî dinase
Durra kasê jê kir 'esas e
Jê peyda kir mêrê xas e
Got, eve hê ne bes e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Di qewlê jorîn de, zêdetir, mirov taybetmendîyên cureyê afirandina ji tunebûnê dibîne; pêvajoya afirandina bûnewerên şênber ên wekî durra kâseyê û mirovên pîroz a ji tunebûnê bi hizra afirînerekî bi hêz xuya dikin. Ji alîyekî din ve, belkî mirov nekaribe bêje ew qewl rasterast mînaka afirandina ji tunebûnê ye ji ber ku bi risteya "Xudawendê me tiştî dinase" referansek tê kirin ji bo zanîna afirînerî bi ya her tiştî (*omniscience*) û wî afirînerî her tişt ji tiştekî ne şênber an ku ji zanîna xwe, ji tiştekî razber diafirîne.

8. Durr ji heybeta Êzdan hincinî
Taqet nekir, hilgerî
Ji rengê însan xemilî
Sor û spî lê hêwirî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Teqîna durrê bi destê afirînerekî nîşan dide ku di wir de bûyereke nûwaze ya bi biryar qewimîye an ku ne ji kaosê ne jî ji tunebûnê hatinek heye. Her çend ji durrê derhatin û veguhestinek diqewime jî mirov nikare bêje ew mînakeke afirandina bi hatina ji dinyayeke din e û her wiha ji bo cureyên din jî nîşaneyên berbiçav nînin di vir de.

9. Êzdanê me bi rehmanî
Husn û cemal ji me ra anî
Destûr da qelemê qudretê
Em avêtin nav surra mihbetê (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Di qewlê jorîn de, mirov dikare tenê nîşane û îmayeke ji afirandina ji tunebûnê bixwîne lewra tevgera nîvîsandina pênûsê dibe wekî tevgera afirandinê bê hisab, lê dîsa jî afirandineke wisa yekser ji tunebûnê nîne. Herwiha, her çend bi rehma afirînerekî behsa bexşandina xweşîyê hatibe kirin jî, mirov nikare bêje di vir de hêmayên cureyê afirandinê yê ji dê û bavê dinyayê hene.

10. Havên avête behrê

Behr pê meyanî
Dexanek jê dexinî
Çardeh tebeq 'erd û 'ezman nijinî
Êzdanê me durr deranî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Di qewlê jorîn de, havên avêtina di nav bêhrê de û meyandina behrê derbasbûna ji qonaxeke destpêkî ber bi yeke birêkûpêktir nîşanî me dide. Derketina dexanê (dûkêl) û organîzekirina çardeh tebeqe erd û esman referansek e ji bo derbasbûna ji rewşeke kaotîk û ber bi yeke bi birêkûpêkkirî, ji ber vê yekê, ew qewl mînakek e ji bo afirandina ji kaosê. Her çend temaya avê û behrê tê de hebe jî ji ber ku noqavbûnek nîne, nabe behsa cureyê afirandinê yê noqavkarê dinya (*earth-diver creation)* bê kirin.

11. Mihbet avête nav e
Jê peyda kir du çav e
Jê herikî pir av e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Girêdayî bi qewlê dehem, pêvajoya derhatina ji durrê û dûmahîka wê di vir de tê qalkirin. Ji ber vê yekê pêvajoyeke afirandinê bi taybet di vir de nîne; an ku evîn (mihbet) û av her hebûne û hatine bi kar anîn û bêhtir tên peydakirin: Du çav ji durrê peyda dibin û piştî ku afirîner muhbeta xwe davêje nav, ji wan çavan av diherike ji ber vê çendê mîrov dikare heta astekê bibêje av tê xuliqandin.

12. Av ji durrê herikî
Bû behra bêserî bêbinî
Bêrê û bêderî
Êzdanê me ser behrê gerî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Di qewlî de tê dîtin ku di serî de behreke bêserî, bêbinî, bê rê û bê derî heye ku ew jî nîşan dide rewşeke aloz û kaotîk heye. Geryana afirînerî li ser wê behrê û deranîna durrê (girêdayî bi qewlê pêştir) amaje bi afirandina nîzamê ji kaosekê dike. Temaya sereke jî her pêkhatina nîzamê ya ji kaosê ye.

13. Êzdanê me sefîne çêkir
Însan heywan teyr û tû
Cot bo cot li sefîne siyar kir (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 118).

Di qewlê jorîn de, Êzdan keştîyekê çêdike, mirov û ajelan lê siwar dike; ew rewş nîşanî me dide ku fîgûrekî afirîner dinya û bûnewerên tê de organîze dike. Çêkirina

keştîyê referansek e ji bo afirandinê lê ne ku cureyên afirandinê yên di vê xebatê de derbas dibin.

14. Xudawendê me sefîne-ser e
    Serîkî digere çar kinar e
    Sefîne qul bû, av kete ser
    Marî xirê xa dane ber e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 118).

Di qewlê jorîn de, bûyereke kaotîk rû dide wextê ku keştî qul dibe û av dikişe hundir. Lêbelê, bergirîya maran ji bo ku av nekişe hundir hêmana afirandina nîzamê ji koasekê bi hêz nake, bêhtir parastina rewşa heyî sembolîze dike. Disa jî girtina her çar alîyê keştîyê ji alîyê afirînerî ve û bergirîkirina maran, safîkirina tevlihevîyekê û avakirina nîzamekê temsîl dike ku heta astekê wekî afirandina ji kaosê dikare bê senifandin. Ji alîyê din ve, her çend tê de disa behsa av û bûneweran hatibe kirin jî mirov dîsa nikare behsa afirandina bi noqavkarê dinyayê bike.

15. Xudawendê me sefîne ajot
    Ji kenar çû ber kenar e
    Ajot Lalişê got, "Heq war e

16. Siltan Êzdî xweş rêber e
    Laliş ko riknê beşer e
    Niha Êzdî jê xeber e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 118).

Di her du qewlên jorîn de, wekî cureyên sereke yên mîtosên afirandinê yên Kurdên Êzidî, ne behsa afirandina ji kaosê ne jî bi awayekî rasterast behsa afirandina ji tunebûnê tê kirin. Di vegêranê de, Laliş wekî şûna heqîqetê û cihekî girîng tê vegotin ku Êzidî êdî bi hebûna wê agahdar in û ew der xîmê mirovantiyê ye. Keştî digihîje Lalişê û Laliş wekî ciheke ezel hatîye teswîrkirin, ne ku Laliş tê afirandin. Dibe ku Laliş hatibe afirandin, lê çawa û ji alîyê kê ve? Ji ber vê yekê, di wan her du qewlan de mînakên mîtosên afirandinê nayên dîtin.

17. Ya Rebbî, bang dikim Şêxê Mezin
    Çavkanî, av jê dizên
    Ya Rebbî, te dinya çêkir, dinya bi xêr
    Însan tê da dijîn bi têr

18. Şevêt reş, şevêt tarî

Cî nema gul jê barîn
Xudawend î kerîm û rehman î (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 118).

Di her du qewlên jorîn de, behsa pêvajo û encama afirandinekê tê kirin di gel hêz û qudreta afirînerê dinyayê, lê nîşaneyên cureyê afirandina ji kaosê nînin. Her çend şevên reş û tarî kaosê tîne bîra mirovî jî em disa nikarin bêjin alozîyeke berbiçav hebû û paşê bi barîna gulan nîzam û aramîyek destpêkir. Lê bi barîna gulan lewane ye referansek hebe ji bo afirandina ji tunebûnê bi bexşandina nîmetan ji bo mirov û zîndeweran.

19. Kire rikn 'erd û 'ezman
Da ber me ruh û ziman
Xudawendê me 'Rebb-il semed'
Afirandin şeş milyaket,
Cuda kir doj û cennet (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 118).

20. Xudawendê me 'erda çêkir, 'ezman guhastin
Mecal e 'erdê bi rast in
Nobeta qeza guhastin
Li gunehbaran bû ruhstîn (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 119).

Di qewlê nozdehem de, tê fêhmkirin ku afirîner ji tunebûnê erd û esman çêdike, ruh û zimên li mirovan dike, ferîşteyan diafirîne û dojeh û bihuştê ji hev vediqetîne. Her çend çêkirina hêmanên wekî erd-esman û dojeh-bihuşt afirandina ji dê û bavê dinyayê (*world parents creation)* bîne bîra me jî divê ev cudahî ber çavan bê girtin: di cureyê mîtosên afirandinê ji dê û bavê dinyayê de ji afirandina erd-esman û dojeh-bihuştê bêhtir pêvajoya jêkvebûna (*detachment)* wan entîteyan û pêvajoya çêbûna bûnewerên tê de girîng in. Di vî cureyê afirandinê de erd dê ye, esman bav e û şibadineke bi vî rengî têkilîyeke cinsî tîne bîra mirovan. Esman û bihuşt li şûna hev tê bi kar anîn, her çend esmên re wesfekî bihuştî tê barkirîn jî erd bi tu awayî wekî dojehê nayê dîtin. Di wan qewlên nozdehem û bîstem de, afirandina ji tunebûnê heye û hêjayî gotinê ye wekî di beşa Kurdên Êzidî de jî hatîye diyarkirin konsepta dojehê di dînê Êzidîtîyê de tuneye û ji ber vê çendê dibe ku di wir de dojeh di şûna erdî de hatibe bi kar anîn wekî bihuşta li şûna esmên tê bi kar anîn. Belkî jî dojeh şûna erdî de neyê hisabkirin an jî heta qonaxekê wisa bê hisabkirin ji ber ku di qewlê bîstûduyem de jî wê bê dîtin ku Laliş ji jor tê jêrê an ku erdî, ji ber vê çendê nabe Lalişa hinde pîroz ji cihekî dojehî re bê şandin. An jî

dibe ku bi hatina Lalişê, erd jî ji rewşa dojeha kaotîk derbasî bihuşta bi nîzam dibe. Di gel wan gotinan, disa mayeyî dubarekirinê ye Guest (2007: 62) behsa hebûna konsepta dojehê di nav hin Êzidîyan dike û wê yekê jî bi danûstandinên wan ên bi cîranên Misilman û Xristîyan re girê dide.

21. Çiqas Xudawendê me dinya kir sefer e
    Sixir dikir dar û ber e
    Pê nijinîne riknê menber e

22. Laliş jor da anî xwar e
    Laliş bû xaş, cî û war e
    Li 'erdê şîn bû nebat e
    Pê zeyinî zindî qinyat e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 119).

Di qewlê panzdehem de wisa hatibû diyarkirin ku Laliş nehatibû afirandin lê warek bû wekî ku ji mêj ve hebû û afirînerî xwe bi sefereke keştîyê lê gihandibû. Lêbelê, wekî di qewlê bistûduyem de bi risteya "Laliş jor da anî xwar" tê dîtin ku Laliş tê afirandin û bi 'jor û jêr' referansek tê kirin ji bo têkilîya esman û erd. Ev dibe ku bibe beşeke ji afirandina ji dê û bavê dinyayê lewra jêkvebûn û li hev asêbûna erd û esmên di navenda vî cureyê afirandinê de ye, lê rasterast figûrên dê û bav nehatine diyarkirin di qewlê jorîn de. Hetta ku jor eger ne wekî esman lê wekî alemeke din were hisabkirin, dibe ku hatina Laliş ji jorê ber bi jêrê ve wekî afirandina ji dinyayeke din jî bê hisabkirin. Di qewlê bîstûyekem de bûnewer îtaatê dikin ji afirînerî re û di bîstduyem de giha şîn dibin, ew her du jî nîşaneyên afirandina nîzamekê ne.

23. Xudawendê me rehmanî
    Çar qisim ji me ra danî
    Pê hebîba Adem nijinî
    Xudawendê rehmanî
    Çar qisim li rû dinê danî

24. Yek av e, yek nûr e
    Yek ax e, yek jî agir e
    Xudawendê me bi rehm e
    Diyar kir saz û qudûm e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 119).

Temayên her du qewlên jorîn pir nêzîkî hev in, hetta mirov dikare bêje her du qewl behsa heman tiştî dikin: her du qewlan de behsa rehm û hêza afirînerekî tê kirin ku di

encama li hev anîna çar elementên cuda yên wekî agir, av, ax û ronahî ew afirîner Adem diafirîne. Di vir de, ne ku Adem ji tunebûnê tê afirandin, lêbelê elementên di jor de hatine diyarkirin ji tunebûnê tên afirandin û bi xêra wan elementan Adem teşeyekê digire. Di vir de jî referansek heye ji bo afirandina ji tunebûnê an ku ew elementên ku dibin sebeba afirandina Ademî di gerdûnê de bi awayekî bênîzam hebûn û afirînerî ew birêkûpêk kirin da ku Adem çêbibe. Herwiha bi afirandina saz û qudûmê ji alîyê Xudawendî ve, mînaka cureyê afirandina ji tunebûnû xwe dide der: saz di vir de wekî şîyana karînê û qudûm jî wekî şîyana vînê û taqetê bi mirovan ve hatine bexşandin.

25. Nîveka Adem û Hevsur zor tixûb e
Hefsur geriye, hat hendav e
Qalibê Adem mabû bê gav e
Go, "Ruho, çima naçî nav e? (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 119).

Geryana heftsir (heft nihênî) û neketina ruhî di bedena Ademî ve wekî destpêkeke kaotîk tê guhê mirov, lê nîşaneyek tuneye ku di vir de dinyayeke bi nîzam ji kaosê hatibe afirandin. Laşê Adem amade ye, lê bi hewldana têketina ruh ji bo laşê adem, mirov dikare bêje ku di vir de mînaka afirandina ji tunebûnê tuneye, lêbelê ji ber ku laş li alîyekî ruh li alîyekî de ne, alozîyek an ku kaosek heye.

26. Xudawendê me qudret e
Zeyinandî çiqas xulyaqet e
Jê ra çêkir doj û cennet (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 119).

Di vir de jî disa wekî di jor de hatibû behskirin, afirandina dojeh û bihuştê tê dîtin. Bihêzbûna afirînerî, xemilandina bûneweran û afirandina bihuşt û dojehê nîşan didin ku afirandin pêvajoyek berfireh û piralî ye.

27. Xudawendê me 'erd çêkir, 'ezman guhastin
Mecal e 'erdê bi rast in
Nobeta qeza rast in
Ji însan qencîtî xwastin (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 119).

Di qewlê jorîn de her çiqas behsa serastkirinê an ku referansek ji bo afirandin ji kaosê bê kirin jî, di vir de bêhtir bi afirandina erd û esmên ji afirandina ji tunebûnê mînakeke din xwe dide der.

28. Laliş ji 'ezman dihat e
'Erd şîn dibû giya hat e
Pê çeyran çiqas qinyat e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 120).

Wekî ku di qewlê bîstûduyem de jî hatibû behskirin, di vir de jî ji ber ku heman sehne berdewam e, ev dibe ku heta astekê bibe mînakeke ji afirandina ji dê û bavê dinyayê, her çend bi aşkerayî behsa entîteyên dê û bav wekî erd û esman nehatine diyarkirin.

29. Xudawendê me înî kir 'esas e
Şembî birrî keras e
Çarşemê kir xilas e
Hevsed sal paş Hevsur hat durran û kas e

30. Hevsed salî ji berî Adem jimar e
'Erdê xiyare negirtî şiyar e
Heta Lalişa Nûrî nav da henar e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 120).

Wekî di qewlên jorîn de jî xuya ye, di navenda mîtosên afirandinê yên Êzidîyan de zêdetir hêmayên afirandina ji kaosê û afirandina ji tunebûnê hene. Her çend rasterast nîşaneyên rewşeke kaotîk tunebin jî, hatîye diyarkirin ku di destpêka dinyayê de erd tam cihê xwe negirtîye an ku nîzamek birêkûpêk nehatîye avakirin, ji ber vê yekê, her çend başebaş kaosek tunebe jî, kêmasîya nîzamê aşkere ye. Di vegêranên jorîn de tê dîtin ku afirîner di serdemên cuda de dinya dişikilîne û pêvajoya afirandinê pêngav bi pêngav bi rê ve dibe: roja înê xîman dadine, roja şemîyê plansazîyekê dike û roja çarşemê diqedîne. Ev pêvajo jî nîşan dide ku tiştên ku pêştir tunebûne di demên cuda de tên afirandin û ev jî bi pêvajoya afirandina ji tunebûnê re hemahengiyê de ye. Di vir de tiştekî balkêş heye ku

Heta vî qewlê jorîn, êdî diyar e dinya hatîye afirandin, Laliş cihê xwe girtîye, dar, ber, av û beşer hatine afirandin û bi tenê tê çaverêkirin ku ruh (mirov) jî têkeve laşê beşerî (Ademî). Ji vir û pê de, di qewlên jêrîn de pir kêm nimûneyên mîtosên afirandinê hene, ji ber vê çendê ji bo vegêranên jêrin, ji lêgerîna hêmayên mîtosên afirandinê bêhtir peyamên wan ên sereke wê bên diyarkirin.

31. Û ban da ruh rehmanî

Hat û çû bihurî

Nûra mobetê hingavte serî
Hat qalibê Adem da êwirî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 120).

Hatin û ketina ruh bi laşê Ademî ve dibe ku bibe beşeke ji nîzama destpêkê be, lê rewşeke kaotîk ne kifş e di vir de. Ruh ji xwe mevcûd e û diyarbûna ruhî di laşê Ademî de tê vegotin, ji ber vê yekê afirandina ji tunebûnê jî di vir de tuneye.

32. Xudawendê me rehmanî
Kasa surrê ji Adem ra anî
Av ji kasê vexwar, vejiya
Cî da mest bû, hejiya

33. Goşt jê xwast wî ruhî
Xwîn canê wî gerî
Xêret kete nav serî

34. Adem xwar ji wê kasê
Surra kasê xaş lê tê
Keremeta kasê gihîştî bi hûş tê
Meleka mile wî girt avête bihuştê (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 120).

35. Adem ji kasê vedixwar e
Keremeta kasê pê ve diyar e
Xa pê nijî, bû hişyar e

36. Go,"Ev 'erd çi xaş e
Gîhayê şîn ser geş e
Roj roja mêrê keleş e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 122).

Anîna kaseyê û zindîbûna Ademî bi vexwarina ji kaseyeke îlahî dibe ku bibin nîşaneya têkilîyekê ya ber bi bi rêkûpêkkirina rewşekê, lê dîsa jî behsa rewşeke aloz û kaotîk nehatîye kirin. Di vegêrana afirandina dinyayê ya Êzidîyan de, wekî ji qewlê sîûduyem heta sîûşeşem tê dîtin, peydabûna jiyanê di bedena Ademî de bi emrê îlahî û kaseya nihênîyan, bi hûrgilî hatine teswîrkirin. Afirîner bi dilovanîya xwe kaseya nihênîyan dişîne ji Ademî re, ev kase remza zanyarîya xwedayî, jiyan û ronakbûna ruhî ye. Dema ku Adem ji kaseyê vedixwe zindî dibe, ji beşerîyetê derbasî mirovbûnê dibe, hişyarbûneke ruhî diqewime û hebûna wî watedar dibe. Piştî vexwarina ji kaseyê, mest dibe û diricife, ev jî nîşan dide ku ew azmûna îlahî yeke kûr e û mirovî tûşî şok dike. Piştî ruh dikeve laşê Adem, laşê wî zindî dibe û xwîn diherike, ew jî destpêka jiyana

fîzîkî ye. Xêra kaseyê an ku bandora mûcîzewî wî hişyar dike. Di qewlê sîûpêncem de, Adem careke din ji kaseyê vedixwe û kerameta kaseyê xwe lê dide der: wî dipişkîne û ew jî nîşan dide ku Adem hişyar dibe. Wexta ku Adem bi alîkarîya ferîşteyan diçe bihuştê, li xweşî û şînahîya li derdora xwe dinêre, şînahî remza bereket û jiyanê ye. Kaseya nihênîyê ya ku afirîner pêşkêşî Ademî dike çavkanîya jiyan û zanyarîya îlahî ye.

37. Xudawendê me rehmanî
Ji me ra keremek anî
Dem û dezgê baş danî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 122).

Di qewlê jorîn de refaranseke hevpar heye ji bo her du cureyên sereke yên mîtosên afirandinê: yek ji wan afirandina ji kaosê ye ji ber vê yekê danîna dem û dezgehan ji bo safîkirina rewşa kaotîk û aloz pêwîst e, ya duyê jî afirandina ji tunebûnê ye ku bêyî rewşeke tevlihev afirîner ji dilovanîya xwe kerem dike û pergalekê ava dike.

38. Hey Ademo rû dinê
Her dem bike îmanî
Xudawend em xilas kirin ji tofanê

39. Gelê mirîdan bikin karê
Xêra qudretê me hate xwarê
'Erd û 'ezman didin xêrê
Hûn jî bibin xudanê xêrê
Qet ji bîr nekin vê xeberê (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 122).

Di gel qewlê sî û heftem, her du qewlên jorîn bala xwe didin ser dilovanî û rênîşandêrîya afirînerî ku du hêmanên sereke yên bawerîya Êzidîyan in. Di wan qewlan de jî, ji nimûneyên mîtosên afirandinê bêhtir, şîret û pend cih digirin. Bi rêkûpêk kirina gerdûnê ji alîyê afirînerî ve cihê rêz û minetê ye di nav komalgeha Êzidîyan de. Di vir de, peyameke afirînerî heye ji bo Ademî ku tê de Adem tê hişyarkirin ku ew nûnerek e ji bo mirovên li ser rûyê erdî. Herwiha bibîrxistinek ji bo Ademî heye ku divê girêdayî afirînerî be û her dem bi îman bimîne. Dilovanî û mihrîbanîya afirînerî remzên hêza berdewamkirinê ne ji bo hebûna Êzidîyan û ji bo wateya jiyana wan. Rizgarkirina wan ji tofanê dide zanîn ku peyrewên Êzidîtîyê divê di wê rêyê da biçin a ku afirînerî ji wan re diyar kirîye û li gorî qaîdeyên ku wî danîye tevbigerin. Afirîner bi rêya erd û esmên ve ji mirovahîyê re xweşî û bereketê dibexşîne, ew jî hêza litûfkirina afirînerî ya ji her cihekî

(*omnipresent)* ve nîşan dide. Vegêranên jorîn û yên wekî wan, bi giştî mijarên wekî bawerîya bi afirînerî, îman, rizgarbûn û kerametên afirînerî dihundirînin û ji bo Êzîdiyan jî pir giring in ji ber ku xwedî wateyeke kûr in ji alîyê rênîşandêrî, parastin û dilovanîya afirînerî ji bo mirovahîyê.

3. MÎTOSA AFIRANDINÊ LI GORÎ KURDÊN YARSAN

3.1. Kurdên Yarsan

Kurdên Yarsan yek ji wan civakên Kurdistanê ye ku di derbarê wan de kêm lêkolîn hatine kirin beramberî Êzidî û civakên din. Her çend endamên dînê Yarsanî ne tenê Kurd bin jî Azerîyên Yarsan jî ji çavkanîyên pîroz ên ku bi Kurdî hatine tomarkirin sûd wergirtine. Di deverên nêzîkî Kurdistanê jî Yarsanên nekurd hene "…li Azerbaycan û derên din ên Îranê jî çend civatên Yarsan hene ku ne Kurd in" (Vali**,** 2018: 14). Ji ber ku mebesta vê xebatê lêkolîna *mîtosên* wan Yarsanan e ku li Kurdistanê de dijîn û Kurd in, bala me jî wê li ser wan Kurdan be ku li Kurdistanê dijîn û endamên dînê Yarsanîyê ne û ayinên xwe bi Kurdî pêk tînin.

Dema bi Kurdî bê nivîsandin, peyva Yarsan (bi Ingilîzî *Yaresan)* pirî caran bi xeletî û şaşî bi Kurdî wekî Yarisan, Yarîsan, Yaresan jî tê nivîsandin. Ji bo vî dînî bi xwe Yarsanî û ji bo diwakewtên vî dînî jî Yarsan tê gotin. Yarsan navê bawermendên Yarsanîyê ye û ji du peyvan (yar û san) pêk tê ku xwedî çend wateyên cuda ne:

> …ew tercîh dikin ku navê Yarsan an jî forma kurtir "San", an jî "Tayfeyî San" wekî mirovên "San" bi kar bînin. "Yar" peyveke Kurdî û Farsî ye, wateya wê heval, hevrê, partner, xulam, dost, nas, alîkar û hezkirî ye. diwakewtên (bawermendên) wê olê, peyva "Yar" bi kar tînin ji bo ku nîşan bidin Xwedê hem hezkirî û hem jî alîkar e. Ji Hevrêyên Xwedê re jî "Yar" tê gotin, ji ber vê, bawermend bi vî navî wekî hevrêyên Xwedê bang li hev dikin. Di pêkhatina her du peyvên di "Tayfeyî San" de, diyar e "San" navdêrek e, li devera Hewramanê de, ew wekî forma kurt li şûna "Sultan" tê bi kar anîn. Di serdema serhildana l, Hewraman an jî li Ciwanroyê (1926-1930) de, serokê serhildanê Jaferekî San an jî Jaferekî Sultan bû. Eger "San" forma kurt a "Sultan"ê be, wî demî wateya wê an hevalê Sultên (mînak: Sehakê ku yek ji teofanîyên wan e) e, an jî eger em ji bo Xwedê peyva "Yar" bi kar bînin, wî demî dibe ku wateya wê bibe "Xwedayê Sehakî" an jî "Xwedayê Sultan" an jî hetta "Xwedayê Xwedê)" ya ku nêzîkî peyva "Rebbî Reb" e ku ji alîyê Sufîyan dihat bi kar anîn (Hamzeh'ee, 1990: 28).

Ji bilî Yarsanî ji bo vî dînî û diwakewtên wê, ji ber sedemên cuda, çend navlêkirinên cuda hene. "Li rojavayê têgeha herî navdar û herî zêde tê bi kar anîn Ehlî Heqq e ku wateya wê "Mirovên Rastiyê ye" (Vali, 2018: 14). Herwiha Hamzeh'ee (1990: 28) jî piştrast dike ku bi kar anîn û nasandina navê Ehl-î Heq ji alîyê dîplomat û

nivîskarê Feransî Arthur (Comt) de Gobineau'yî ve pêk hatîye. Li Başûrê Kurdistanê, ji wan re Kakeyî tê gotin û Shahab Vali (2018: 15) dide zanîn ku ew jî ji ber peyva 'kake' (kekê, birayê mezin) bi mebesta rêzgirtinê hem ji bo Sultan Sehak û hem jî ji alîyê Sultan Sehak, wisa hatîye dariştin. Ji xeynî Kakeyî, Yarsan û Ehl-î Heqq, an bi mebestên xirap an jî ji nezanîyê ji wan re qulat, Elî Îllahî an jî Nûseyrî jî hatîye gotin.

> Li gorî Minorsky têgeha ewil, yanî qulat ku hemû şiîyên tundrev dihevîne, têgeheke pir fireh û ne tam zelal e. Di têgeha duyemîn Elî Îllahî (yên ku hz. Alî wek Xweda dibînin) de jî heman pirsgirêk heye, Minorsky diyar dike ku ev têgeh di sîstema dînî de ku mijara me ye, detayek e. A dawî Noseirî aîdê dînekî Sûrîyeyî ye ku dişibe doktrîna Ehl-î Heqq (îbadeta ji bo Elî, kom hwd.) (Vali, 2018: 15).

Yarsanî ji herêma Goranê derketîye û her li wê derê geş bûye û ew der kirîye herêma navendî ya Yarsanîyê. Goran ew herêma dîrokî ya Kurdan e ku kevntirîn berhemên nivîskî û nîşaneyên Kurdbûnê jê derketine. Îro, piranîya Kurdên Yarsan li Rojhelatê Kurdistanê, di serî de Kirmanşah, (Kirmanşan) Loristan, Îlam, Hemedan û Hewramanê dijîn. Li gorî Selahattin Ali Arik (2015: 84) navenda wan bi xwe jî Gehwara ye. Ew deverên din ên ku her lê hebûne, an jî pişt re koç bûne ji bo nişteciihbûnê ev in: Gundê Tûtşamî, navçeya Goran, Asmanwand, Sehne, herêma Piştîkûh, Kerkuk, Xaneqîn û Xorasan.

> Li Xaneqîn û Qesr-î Şîrîn'a li rojavayê Kîrmanşahê, di navçeya navbeyna Kîrmanşah û Hemedanê, li Şehrizora başûrê Kerkûkê de, li Zohab û herêmên Tebrîz û Meregeyê de, li Makuyê, li Hewramanê, li Qezwîn, Têhran, Gîlan û Mazenderanê, li derdora Musil û Loristanê de civatên Yarsan hene (Arik, 2015: 84).

Helbet ji bilî cihên jorîn bi sedan gundên din jî hene di gel bajar û bajarokên din. Bo nimûne, li Loristanê yanzdeh tayfeyên (hoz, eşîr, xandan) Yarsan hene. Li Şahabad û Kengawar, Kerend û Hersînê jî nişteciihên Yarsan tên dîtin. Kurdên Yarsan ên ku li koçî Tehran û Kerecê bûne jî hene. Lê di nav hemû cihan de, çend cih hene ku bi raya Yarsanan girîngtir û pîroztir in, ji ber vê yekê beramberî cihên din zêdetir kes diçin serdana wan cihan û li wan deran zêdetir kes kom dibin. Girîngtirîn û pîroztirîn ziyaretgah a Sultan Sehakî ye ku li gundê Nowsûda Hewremanê ye, tiştê balkêş ew e ku piraniya nişteciihên wê deverê dînê xwe guhertine û bûne Misilmanên sûnnî. Cihekî din

yê ku Yarsan girîngî pê didin li Dalahoyê ziyaretgeha Baba Yadgar e. Bi wan her du cihên pîroz, wekî di jor de hate behskirin, tekyeya Sey (Seyîd) Birake li Tûtşamîyê jî yek ji wan girîngtirîn navendan e. Helbet cihên ziyaretgehên Pîr Binyamîn û Pîr Mûsî jî dibin şûna kombûna Yarsanan di rojên girîng de.

Kurdên Yarsan ji alîyê hin nivîskar û lêkolîneran ve bi Elewî û Şîeyên dozdeh îmamîyan ve jî hatine şibandin. Mehmet Bayrak (2014: 38) bi nêrîneke *senkretîk* dînê Yarsanî dinêre û dibêje Yarsanî veguhestîye û teşeyeke Elewîtîyê girtîye. Bi şêweyekî din, Mehrdad Izady (1992: 137) îddia dike ku Yarsanî qolek ji dînê Yezdanîtî bû di gel Êzidîtî û Elewîtî. Li hember van helwêstan û helwêstên lêkolînerên din ên ku Yarsanîyê bi dînekî din ve girê didin; an jî dikin mezhebeke dînekî din, an jî bi giştî wekî dîn û bawerîyeke serbixwe nabînin û li ser *senkretîkbûna (*têkelbûna çendîn doktrînên cuda yên bawerîyên din) vî dînî rijd in, bersîva H. Corbin û M. Tardieu ya ku ji alîyê Vali ve (2018: 19) hatîye neqilkirin wisa ye: "Corbin peyva 'senkretîzmê' red dike, li gorî wî ev peyveke pir vala ye û bi vê peyvê doktrînek tê xirabkirin, valakirin. Ji ber ku lêkolîneke kûr li ser van bawerîyan nehatîye kirin, rasterast lêkolîner wan peyvan bi kar tînin."

Her çend hêşta jî beşeke mezin a doktrînên îrfanî yên Yarsanan nayên zanîn û wekî sirekê (Sirrê Megû) bimînin jî, li ser dîroka avabûna dînî, pirtûkên pîroz, şexs û kesayetên girîng û şûnwar û demografîya vî dînî de çendîn çavkanîyên cuda li ber dest in. Yarsanî li gorî hinekan li Lorîstanê bi Şah Xoşîn destpê dike û bi nêrînên hinekên din jî bi Behlûlê Madî (Mahî) an jî Balûlê Dana cara ewil xwe dide der. Behlûl helbestvanek e, bi zaraveyê Goranî jî helbest nivîsîne û di sedsala nehem de jîyaye. Şah Xoşînê ku bi kelamên pîroz li tenbûrê daye, hem tenbûr kirîye semboleke pîroz a Yarsanan û hem jî bi rêya *immaculate conception* (jidayikbûna bêyî hazirbûna bavî) jî taybetmendîya xwe ya mûcîzewî û pîrozewer di nav hezkiriyên xwe daye zanîn. Li gorî texmîna Vali (2018: 48) di sedsala yanzdehem de dibe ku jîyabe. Nêzîkî 300- 400 sal piştî Şah Xoşîn Sultan Sahakê kurê Dayrak (Remzbar) û Derwêş Îsa ji dayik dibe, ew jî lewane ye biçe sedsalên 14-15em, ew serdema ku —li gorî lêkolînerên wekî Minorsky û Ewropayîyên

din— Ehl-î Heq derketîye holê. Lê ji alîyekî din ve, hin lêkolîner hene ku li gorî wan nabe ku Yarsanî ewende dereng (sedsala 14-15) derketibe holê.

> Bawa Serhengî Dewdanî helbestvanek û pêşengekî dînê Yarsanî bû ku di navbeyna sedsala 9em û 10em de jiyaye û çarîna wî ya di jêr de wisa dibêje:
>
> "Serhengî Dewdan, Serhengî Dewdan,
> Ez me namîman Serhengî Dewdan,
>
> Çenî êrmenan, megêlim her dan,
> Mekoşim perî ayînî Kurdan (Arik, 205: 82)

Ji ber ku piraniya cîranên wan Misilman in, hin senkretîst wan dişibîn peyrewên îslamî yên ji rêderketî an jî hinên din xwezîya xwe bi bişavtina wan berew bi Îslamîyetê tînin, bi taybetî bi Şîetîyê ve. Lê gelek cudahî hene di navbeyna Yarsan û Şiîyên Îslamê de. Yarsan Quranê naxwînin, yek ji pîroztirîn pirtûkên wan Serencam e ku ji kelaman pêk tê û bi şêwazeke helbestane hatîye nivîsandin, di ayinan de tê xwendin û gotin di gel jenîna tenbûrê. Vali (2018: 65) dibêje ji ber ku Şah Xoşîn yekem kes e ku tenbûr daye destê xwe û bi tenbûrê tevî ayinan bûye, tenbûr pîroz e û dengê tenbûrê wekî Nîda el Heqq an ku "dengê rastî" tê bi nav kirin.

Di Yarsanîyê de hedîs û rojî û nimêjên wekî yên misilmanan nînin. Bi tenê rojî li cem Yarsanan 3 roj in. Wekî Kabeya li Mekkeyê, ji bo Yarsanan mabedeke bi vî rengî nîne, heca xwe li tekye û ziyaretgehên şexsên girîng ên wekî Sultan Sehak, Baba Yadgar û Şah Xweşîn de bi cih tînin. Di nav civata Yarsanan de, bi şêweyekî, çînayetîyeke fonksîyonel —her çend bişibe sîstema *kastê* jî— heye û tê de Seyyîd, Baba, Pîr, Qelender, Dîdar, Kelamxwan û Mirîd hene. Bo nimûne, zewac di navbeyna hin çînan de qedexe ye. Konsepta seraneyê (bacê) heye, ku divê her malbatek bacê bide Pîrê xwe. Di Yarsanîyê de dinyayeke din, roja qiyametê û roja mehşerê, bihuşt û dojeh nînin. Abdulfettah (2017: 23) dojehê wekî dûrketina ji Xwedê û bihuştê jî wekî nêzîkbûna li Xwedê dide zanîn. Yarsan, wekî di gelek dînên din de, baweriya xwe bi cureyekî reînkarnasyonê tînin ku jê re laşguhertin an jî dûnadûn tê gotin.

> …dema mirov dimire, bi tenê laşê wî dimire û dibe ax, lê gîyan ji laşê wî derdikeve û dikeve laşekî dîtir, wekî nû ji dayik bûbe. Asta wî mirovê nû jidayikbûyî û pileya

> qencbûn xirapbûna wî ligor asta kesayetîya wî, giyanê ku derbasî laşê wî bûye, berçav dibe. …Di her giyanekê de qonaxa 50.000 salan li ber wî vekirî ye. Di vê qonaxê de, derfeta 1000 (1001) laşguherînan li pêşîya wî heye, ta ku bigihije bihuşta xwe ya xwedayî (Ebdulfettah, 2017: 6).

Di nav Yarsanan de pêxemberî tuneye, li şûna pêxemberan, ferîşte (milyaket) hene. Ferîşteyên sereke heft in û ji wan re jî "heftan" tê gotin, Pîr Binyamîn, Dawid Dowdanî, Pîr Musî, Mistefa Dawidan, Xatûn Dayrak (Remzbar), Baba Yadgar, Şah Îbrahim. Afirîner di bedena wan ferîşteyan de xwe nîşan dide, ji ber vê yekê, ew ferîşte nemir in û giyanê wan her seferê dikin heta cihê dawî. Di nav cureyên laşguherînan (cihguhertinên ruhî) de, di forma dûnadûnê de cihguhertineke ruhî ya zatên mezin ên wekî Şah Xweşîn û Sultan Sehak û çendîn mirovên din berew bedena yekî din heye ku ew jî dînamîkbûna wê ruhê pîrôz dide nîşan.

> …belku xudî mirov e û legel mirov, le geşe da ye, lem têgeyîştine da, xuda xaliqê nîye ke dinyayî xulqanduwe û îtir karî tewaw bûwe û danîştûwe weku hûkmêk berrêwe bibat, belku xweda bûnêyî le geşe da ye ke rûyî le kamilbûn e. Xuda îmkanêk e le mirov da, potansîyelêk e le potansîyelekanî mirov û le rastî da, diwa menzîlî mirovbûn e (Kîyanî, 2017: 5).

3.2. Çavkanîyên Rîwayetên Mîtolojiya Kurdên Yarsan

Di serî de, divê mirov bide zanîn ku her çend serçaveyên wan wekî 'pirtûk' bê zanîn jî, ew di eslê xwe de "lênûsk" (defter) in, lewra ew ne kelamên xwedayî ne, lê ji alîyê mirovan ve hatine nivîsandin li defteran de hatine komkirin, lê divê pîrozbûna wan neyê paşguhkirin. Ji bilî Nameya *Serencam,* çendîn serçavyên din ên wekî *Defterê Newroz, Diwana Gewre, Defterî* Şêx Emîrê Zoleyî, *Defterê Kelam* ê Xan Elmasê Loristanî û hwd. hene. Wisa tê hizrkirin ku *Dîwana Gewre* di serdema Sultan Sehak de hatîye nivîsandin û ji diyalogên di navbeyna Sultan Sehak û Yaran pêk tê. Li gorî bawerîya Yarsanan, Xan Elmas yek ji kesayetên xwedî cewhera îlahî tê hisabkirin û di sedsala 17-18an de jiyaye. Xan Elmas xwedî gelek kelamên pîroz e û dîwana kelamên wî wekî *Defterê Xan Elmas* tê bi nav kirin. Şêx Emîrê Zoleyî jî li gorî bawerîya Yarsanan her wiha di sedsala 17-18an de jiyaye û xwedî kesayetîyeke îlahî bûye û kelamên wî yên ku gelek pîroz in wekî Defterê Şêx Emîr hatine bi nav kirin. Nerîta Yarsanan li ser taybetmendîya îlahî ya metnên wan dimeşe, metnên pîroz hem wekî

wehîyên rastîn hem jî wekî gotinên şexsên teofanîk tên dîtin. Newaya kelaman di dema xwendin û guhdarîkirinê de xwe dide hîskirin û di ber re tembûr jî tê jenîn. Her defter ji alîyê şexsekî pîroz ve hatîye nivîsandin, an jî wekî defterê serdemekê hatine tomarkirin. Lê dîroka nivîsandina wan defteran ne diyar e û ew nediyarbûn jî li gorî gotinan pîrozbûna wan diparêze.

> Kêşeya herî giring bi xebata van metnan berawirdkirina dîroka wan e, lewre dîroka nivîsîna van ne diyar e. Li gorî Mohammad Mokri, dîroka nivîsîna van kelaman nehatîye qeydkirin da ku pîrozbûna gotinan xira nebe. Ev pirsgirêk bêguman dê çareser nebe, lewre ne em dikarin dîroka rastîn a derketina kelaman bibînin, ne jî dikarin dîroka zayîn û an jî mirina xwediyên wan bibînin. Li gorî Jean During, wisa xuya dike ku metna herî kevn a ku hatîye qeydkirin wek 1770 hatîye nîşandan lê li nav Yarsanan de destxetên gelek kevintir jî hene (Vali, 2016: 113-119).

Defterên din ên ku di serdemên cuda de hatine tomarkirin li gorî dewreyan jî hatine senifandin ev in: Defterê Dewreyê Behlûl, Defterê Dewreyê Baba Serheng, Defterê Dewreyê Şah Xoşîn, Kelama Baba Nawis, Defterê Perdîwerî, Defterê Heftewaneh, Barge Barge ku ew jî beşeke Defterê Perdîwerî ye, Gelîm wa Kûl, Defterê Çiltan, Xurd-a Ser, Defterê Abidîn û çendîn dewre, defter û kelamnûsên din. Di nav çavkanîyên di jor de çend ji wan bi taybetî mijara afirandinê wekî mijara sereke bi kar anîye di gel Defterê Şêx Emîr Zoleyî û Defterê Xan Elmasê Loristanî.

> Dewreyê Heftewane "yên ku xwedî heft nîşanên îlahî"ne. Çêbûna wan a berîya Afirandinê tê behskirin. Ev metn jî bi goranî hatîye nivîsin. …Dewreyê Çiltan beşek din a Serencam e. Li gorî vê beşê, cîhan ji ronahî û tariyê pêk tê. Beriya afirandina dinya, roj, heyv û stêrkan, du kevirên sereke hebûne: ronahî û tarî, ku ev her du li hev nekirine. Xwedê çil ronahî (Çiltan) afirandîye ji ronahiya Xwe, ji bo ku tariyê bitemirîne. Ev beşa Serencamê di baweriya Manîehîstan de jî heye. Ev çil ferîşte ji alîyê Xwedê ve hatine afirandin da ku di serdema Sultan Sehak de alîkariya wî bikin (Vali, 2016: 113-119).

Her dewre veguhestina hizr û îbadetên spirîtûel li gorî metnên xwe yên ku nerîta Yarsan temsîl dike dihewîne digel pêşveçûn û guhertinên di doktrînên vî dînî de. Meseleya dewreyê ji alîyê Kreyenbroek jî wisa tê pênasekirin ku:

> "dubarekirin" wekî binemayekê, xwedî roleke sereke ye di jiyana dînî ya Yarsanan de. Nêrîna wan a di derbarê dîrokê yeke dewreyî ye, wateya wê ew e ku her "serdema" (dewreya) dîrokê nexwe serdema mîtîk a Afirandinê dubare dike û

cewhera takebûneweran di formeke din de vedigere (dûnadûnî, veguhestin ji qalibekê bo qalibeke din) (Kreyenbroek, 2022:).

Yek ji wan çavkanîyên ku behsa afirandinê dike wekî pêştir jî hatibû behskirin Defterê Newroz e, kelama jêrîn ji *Defterê Newroz* e û ji 56 malikan pêk tê

Ne behrbî ne ber ne ‘erz ne sema
Ne ab ne ateş ne xak çenî ba

Ne tarîkî tar ne rûşen çon ro
Ne zengî siwar firengê duho

Ne sal bî ne mang ne fesl çiwar reng
Ne weqt ne bêweqt ne zûd ne dereng

Ne berz bî ne nizm ne lîz ne mekan
Ne beyzey durr bî ne behru’l- ‘Uman (Newroz, çapnebûyî: 265-270).

3.3. Mîtosa Afirandinê di Rîwayetên Kurdên Yarsan de

3.3.1. Mîtosa afirandinê di Defterê Şêx Emîr de

Ha ve şûnewe
Şûnê[1] ray[2] Yarî ha ve şûnewe[3]

Gewher baweran[4] ne Ceyhûnewe[5]
Ha vey[6] şûn ray dûnadûnewe[7] (Şêx Emîr, çapnebûyî: 18-19).

Di malikên jorîn de, tê diyarkirin ku hebûn (*existence)* xwe bi berdewamî nû dike û destpêk û dawî bi hev re girêdayî ne û her tişt dubare vedigere destpêkê ku ew jî nîşan dide ku gerdûn her di pêvajoya xwenûkirinê de ye. Dînamîkbûna vê pêvajoyê dibe ku piçekî rewşeke kaotîk bîne bîra mirovî, lêbelê îddiaya hebûna ji kaosê paradoksekê derdixîne holê ji ber ku pêvajoya afirandinê yeke dînamîk û domdar e. Di Yarsanîyê de

[1] Peyman
[2] rê ya
[3] şop
[4] bînin
[5] Ceyhûn: navê rûbarek e
[6] vî
[7] kiras guhartin, reankarnasyon

Yar hêmanekî girîng e ku hêz û evîna xwedayî û afirînerekî dinimîne, di vir de jî rêya afirînerî û çerxa hebûnê bi hev re berdewam in û hêz û evîna îlahî di vê berdewamîyê de cihekî sereke digirin. Ji ber ku di heman kelamê de li jêrê behsa rûbara Dicle hatîye kirin, Ceyhûna jorê ya ku gewher jê tê anîn ne rûbara Ceyhûnê ye ne jî Ceyhûnabada Kirmanşanê ye, bêhtir şûneke derûnî û ruhî ye ku ew jî nîşane ye ji bo hatina bawerîya pak a ji rêwîtîya manewî ne ku ji ya maddî. Ji ber vê yekê, mirov nikare bêje di vir de rasterast cureyê afirandinê yê bi noqavkarê dinyayê (*earh-diver)* heye ku tê de balinde an ferîşte noqî bin avê dibin û keresteyekê tînin, lê ji ber nebûna materyalekî di meydanê de, destpêkeke fîzîkî rû nade bêhtir hebûneke razber ji tunebûnê (*creatio ex-nihilo)* tê dîtin. Wekî Êzîdîtîyê, di Yarsanîyê de jî mijarên mirin, bihuşt û dojehê ji têgihiştina her sê dînên kitêbî cudatir in, (bnr. Kurdên Yarsan). Dûnadûn cureyekî *reenkarnasyonê* ye û her çend bi hêsanî wekî laşguhertinê an ku rêwîtîya ji bedenek bo bedenekê din bê zanîn jî, di vir de îmaya guhertin û tevgerê dike ku ew jî beşeke çerxa afirandinê û gerdûna guhêrbar e.

Ewsa Padişam ne dûnê Ya[8] bî
Ne erz[9] ne sema ne Sureya bî

Ne zat ne beşer ne şert ne îqrar[10]
Ne lewh ne qelem ne dengda yar

Ne şêwey[11] murxî[12] ne daney zelal
Ama west ew dûn murxê zêrînbal (Şêx Emîr, çapnebûyî: 18-19).

Di malikên jorîn de veguhestinek ji rewşeke aloz û tevlihev ber bi *kozmoseke* nîzamî nîne, zêdetir bal tê kişandin li ser tu-nebûna hêmanên afirandinê an ku bi nebûna erd, esman, stêrk û tiştên din. Amaje bi vê yekê tê kirin ku tunebûn û valahîyek bêhempa hebû beriya afirandinê ku ew jî bi cureyê afirandinê yê ji tunebûnê re di hemahengîyê de

[8] Dawiya her tişt
[9] erd
[10] qebûl kirin- erê kirin, mebest peymana Xwudê û afirîdeyên Wî ye
[11] deng
[12] murx: teyr, çûk

ye. Padişah an ku afirîner wî demî di dûnê (şiklê) Ya de bû an ku di merheleya beriya derketina durrê de ji destpêkê heta dawîyê hebû, erd û esman û stêrk nebûn, mirov û rêûrism û qanehbûn tunebûn, qeder û deng û dadger nebû, ew (ruh-cewher) bi şiklê teyrekê ji libekê (hebekê) paqij derdikeve ku ew lib jî durr e, dikeve laşê teyrê zêrînbal. Ev teyrê zêrînbal gelek teyrên mîtosên çandên din jî tîne bîra mirov ên wekî Sîmurq, Zûmridê Anqe, *Phoenix* û hwd. û her wiha Teyrê Enqer ê ku "teyrekî mîtîk e û nerîtên rîwayetî dibêjin ku Teyrê Enqer Tawusî Melek bi xwe ye".(Omarkhali:, 2017: 323). Lêbelê divê bê zanîn ku rehendeke ferîşteyî ya Siltan heye ku ew jî bi vê şiklê mîtolojîk xwe di vê kelamê de dide der.

Di Yarsanîyê de, afirîner bi gelek şêweyan tê bi nav kirin, ji bilî navên wekî Padşah, Mewlam, Siltan, Hz. Heq, Xawenkar û çendîn navên din, Selîmî (2023) meqama herî bilind di Yarsanîyê de bi navê Yar dide zanîn ku wate Mîrê Mîran e û hevsengên vî navê jî li gorî wî ew in: Şahê Şêrîn Bazan, Kake Hekak, Zatê Yekdane, Xwacay Kawe, Sahib Kerem, Şah Baz, Berze Mel, Şahê Zêrînbal, Şahê Şêrînkelam, Siltan Serheng, Siltan Sercem, Şahînşahê Şahan, Rehberê Rehberan û Şahê Heqanî. (Selîmî, 2023). Di gel navên jorîn yek ji navên afirînerî wekî di malikên jorîn de jî tê dîtin Ya ye, ku ew jî dawîtirîn navê afirînerî ye berîya ku ji durrê derkeve.

> Ceyhûn cihan Dicle esrar pirr
> Dûn ve dûn ama ta ve qabê durr
>
> Ewsa Padişam ne Xuwa ne durr bî
> Durr ne betnê[13] behr xeybxaney sirr bî (Şex Emîr, çapnebûyî: 18-19).

Di malikên jorîn de "Ceyhûn cihan Dicle" wekî pêştir jî hatibû behskirin îmaya alemeke derûnî û ezel e ku bi nihênî û potansîyelê ve tijî ye, ew nihênî bi rengekî jî afirîner bi xwe ye wekî sireke ebed û ezel e û dûn bi dûn an ku bi şêweyekî gûherbar û berdewam tê û dikeve qalikê durrê. Wê çaxê afirîner bi wesfekî xwedayî ji durrê ye durr jî wekî nihênîyekê di bin avê de bûye. Her çend behsa avê û hebûna durrê di bin avên

[13] hundur, di nav

nediyar bên kirin jî ji ber ku noqbûn û ji bin avê anîna keresteyekê nînin, nabe mirov bêje ew mînakek e ji afirandina bi noqavkarê dinyayê (*earth-diver)* ye. Ji alîyê afirandina ji tunebûnê ve, yekser afirandinek ji tunebûnê nîne lê hatina dûn bi dûn a wî ruhî û gihiştina bi durrekê derbasbûnek e ber bi aramîyekê ve. Lê her çiqas bi giştî hizra afirandina ji tunebûnê di vir de heta radeyekê xwe bide der jî, di vir de nîşaneya herî bi hêz a cureyê afirandina ji kaosê ye lewra ew rewşa kaotîk û bi sir û nihênî bi derbasbûna nav qalikê durrekê aramtir dibe an ku ew serdema tijî bi sir (tiştên heyî) bi çêbûna durrekê watedartir dibe.

Tenyayîş[14] mekird nemana[15] huner
Yekreng[16] xulaman awird[17] ev nezer

Şertê biyaş[18] best[19] çenî[20] xulaman
Pay[21] çep west[22] ew pêş ne durr beraman[23] (Şêx Emîr, çapnebûyî: 18-19).

Tenêtîya afirînerî dibe sebeba nîşandana hûnera wî an ku afirandina ferîşteyan û di gel wan ferîşteyan peymanê dadine û piştre jî bi lingê çep lêdixe pêş û ji durrê derdikeve. Afirîner bi şiyana xwe ferîşteyan diafirîne ku ew mînakek e ji bo cureyê afirandina ji tunebûnê, lê berîya ferîşte ji durrê bi wî re derkevin peymanek tê çêkirin, şertên rê û rismê Yarsanîyê an ku qaîdeyên hebûnê. Wisa xuya ye berîya her tiştekî din xîmên gewhera dînê Yarî tên danîn. Pêdiviya bi vê peymanê jî nîşaneya nebûna nîzam û hebûna valahîyekê ye ku divê ji vê rewşa nediyar û nezelal veguhestinek pêk bê ber bi rêkûpêkîyekê ve, lewra tenêtî jî formeke kaosê ye û rewşeke bêbinyad e. Di heman demî

[14] tenêtîya Wî
[15] nîşan da, eşkere kir
[16] pak, saf
[17] anî
[18] Şertê Beyabes: mebest yekem peymana Xwedê û firîşteyên sereke ye
[19] girêda, çêkir
[20] ligel
[21] ling
[22] avêt
[23] derketin

de, ji xwe bi kelama “Yekreng xulaman awird ew nezer” jî afirîner disa ji tunebûnê bi carekê de ferîşteyan tîne der an ku ji tunebûnê diafirîne ji ber vê çendê nimûneyên her du cureyên behskirî heta astekê diyar in.

Ne[24] mekanê durr dûn ve dûn aman[25]
West[26] ew Baba Adem çenî xulaman

Ama west ew dûn zile[27] dinyayî
Xurûş kird[28] cihan ne gav[29] ta mahî[30]

Seraser cihan kirdin musexxer[31]
Mird[32] ne camey[33] wêş[34] neyarû xeber[35] (Şêx Emîr, çapnebûyî: 18-19).

Bi giştî wekî hemû kelamên jorîn, di wan her sê malikên dawî yên ku ji alîyê Şêx Emîr hatine tomarkirin de jî, bi awayekî dubarekirî behsa durrê tê kirin: gihiştinek, derketinek û hatinek ji durrê. Ew rewş ne derketinek e ji alemek an dinyayeke din wekî di cureyê afirandinê yê bi hatina ji dinyayeke din lewra durr di bin avê de bû. Tê dîtin ku di malikên jorîn de jî hatina ji vê durrê ya ruh bi ruh û bi berdewamî heye ku ew ruh jî di gel ferîşteyan tê û digihîje ruhê Baba Ademî. Îhtimal e di vir de jî Baba Adem wekî şûna yekem mirovê ku hatîye afirandin tê teswîrkirin, lewra ruh pêşî digehe durrê ku tê de Padşah giyandar dibe û paşê ferîşte û dû re jî mirov tê afirandin. Hêjayî gotinê ye, afirînerê ku ji durrê derdikeve disa bi gewhera ezel û ebed bi ruh dibe ne ku heta durrê afirîner tunebûye. Piştî hatina wî ruhî bo dinyayê, dengê gurminekê dikeve dinyayê “ji

[24] ji
[25] hatin
[26] avêt
[27] tijî ji deng
[28] qêriya
[29] ga
[30] masî
[31] dagir
[32] meriv
[33] cil, mebest laş e
[34] xwe
[35] haydar nebû

ga ta masî" an ku seranserî cihanê ew deng vedide ku heta wî demî mirov ji hebûna laşên xwe agahdar nebûn. Wisa xuya ye, vê kelamê de behsa pêvajoyeke afirandinê ya gavbigavî tê kirin an ku afirandina mirovan bi taybet piştî çend merheleyên kaotîk û aloz rû dide lewra "zile" û "xurûş" du peyvên sereke ne ku vê alozîyê bi aşkerayî nîşanî me didin. Heta dikare bê gotin ku ew dengedeng û gurminîn dişibe teorîya teqîna mezin (*big bang)* a ji bo çêbûna dinyayê.

Celîlê Cebbar
Biwanîm[36] senay[37] Celîlê Cebbar

Ne lewh ne qelem ne yar ne exyar[38]
Padişam ne durr bî durr ne derya bar

Ne çeray[39] çirr bî
Ne galay[40] gal ne çeray çirr bî (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

Di malikên jorîn de meth û sitayîşek heye ji bo afirînerê ku meqama wî berz û bi xwe serkeftî ye û dubare ji hatina durrê û şûna durrê tê behskirin wekî di jor de jî hatîye ravekirin. Disa tunebûna amûr û mirovan di navenda malikê de ye di gel nebûna deng û awaz û gazîkirinan. Bi awayekî aşkere xuya dike ku afirîner qeder û dost û neyaran di gel deng û awazan ji tunebûnê diafirîne. Ji ber ku di vir de îmaya têperînekê heye ji rewşeke mîstîk, ezelî û nediyar ber bi yeke nîzamî û bi binyad di gel rewşa tunebûnê (bêdostî, bêneyarî, bêqederî û bêdengî), dikare bê gotin ku her du cureyên afirandinê bi awayekî têkel di vir de cih digirin.

Ta çend Padişam ne daney durr bî
Binyadiş[41] ne yurt[42] kesnezan sirr bî

---

[36] bixwînin, bibêjin
[37] pesn
[38] yê ku ne yar/dost e, biyanî
[39] ronahî
[40] êriş
[41] bingeha Wî
[42] cih, cihê mayîn

Ne qabê gewher
Padişam ne durr bî ne daney gewher

Ne sirrê qudret İlahê ekber
Çarten[43] ve mu'ciz awird[44] ew nezer

Xawendikar bî
Î sirr ne sîney[45] Xawendikar bî (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

Binyada afirînerî cihekî sirrî bû ku kes pê nedizanî, ew nîşaneya nediyarî û nihênîya ku di destpêka afirandinê de xwe dide der, lê bi tu awayî nabe diyardeya kaos û tevlihevîyê. Afirîner ji durrê bû, heba gewherê bû, bi vê gotinê jî mirov di vir de nikare bêje afirandinek ji tunebûnê pêkhatîye lewra hebûna durrê aşkere ye. Di malika dawî de, afirîner ji sirra hêza xwe *Çarten* an ku çar ferîşte ji mucîzeya xwe diafirîne ku ew jî bi awayekî dikare wekî mînaka afirandina ji tunebûnê bê hisabkirin lê disa jî ji ber ku sirra hêza afirînerî her çend tiştekî razber be jî, di vir de ji bo afirandinê hebûnek heye, an ku cewhera îlahî her amade ye, ji ber vê yekê belkî ew nîmûne wekî afirandina ji tunebûnê neyê dîtin. Hêjayî gotinê ye ku, ew çarten çar ferîşte ne ku di destpêka afirandinê de, afirîner di gel wan girêbestek çêdike, şertê dînê Yarî dadine û ew jî diafirîne: Dawid, Pîr Binyamîn, Pîr Musî û Mistefa. Xawendikar an ku afirîner ew ji sirra dilê xwe, bi gotineke din, ji cewhera xwe diafirîne. Di kelamên li jêr de, ji bilî Mistefa navê sisêyan derbas dibe.

Ve şert Binyam Dawidiş yar bî
Ve xidmet pak kirde Remzbar bî

Îqrarişan kird
Ewsa[46] çenî hem îqrarişan kird

Zat şî ne camey nezad[47] nemird[48]

---

[43] Çar melek
[44] anî
[45] Sing
[46] wusa
[47] çênebûyî
[48] nemir

Pîr Mûsî wezîr ve defterdar kird (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

Di malikên jorîn de, ji afirandinê bêhtir, pêngavên pêvajoya li dû afirandinê tên behskirin. Pîr Binyamîn bi navekî din wekî Pîrê Şert tê naskirin "...afirîner daxwaza ferîşteyan a ji bo afirandina dinyayê qebûl kirîye bi şertê ku fermanên wî were cîbîcîkirin û ferîşte ji dinyayê werin hizûra wî. Erkê parastina peymanê jî bi Binyamîn ve hatîye spartin" (Kreyenbroek, 2014: 60) û Dawid jî wekî yar an ku dost û yarmetîdar tê teswîrkirin. Remzbar jî ew jin e ku afirîner ji bedena xwe di gel Reza diafirîne. Remzbar pîra xizmêtên baş û pak e. Hemû bi hev re qaneh bûn ku ruh kete bedena zatê her çênebûye û her namire ku di vir de mebest Hz. Heq e an ku geh Xawendikar e geh Siltan Sehak. Afirîner berpisyarîyê dixe stûyê Pîr Musî wekî defterdarî û leqeba pîr Musî wezîr û qelemzêr e.

Yarê Celîlî
Damê[49] şert ve dest Pîrê Celîlî

Padişam ew roj kird hacet qebûlî
Bestişan Beyay[50] pîr û delîlî

Mertebey[51] şahî
Ewsa da ne tebil[52] mertebey şahî (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

Di vir de, pêngavên li du afirandinê berdewam in û binyada hîyerarşîyekê tê danîn. Pîrê Celîlî Pîr Binyamîn e ku afirîner şert û qaîdeyan radestî wî dike, ew roj wekî roja qebulkirina dia û niyazan ji alîyê afirînerî ve tê diyarkirin. Bi pîr û delîl an ku bi Binyamîn û Dawid re peyman tê çêkirin, meqama bilind a Xawendikar wî demî bi defikan tê pîrozkirin.

Cihan xurûşa[53] ne gav ta mahî

---

[49] tor
[50] peyman
[51] qad
[52] defik
[53] qirîn

Awird ew besat mewcê[54] roşinayî[55]

Nişt[56] ne rûy exzer[57]
Derbî[58] asiman nişt ne rûy exzer

Heft tebeq[59] ne pişt mahî da lenger[60]
Mahî nîşt ne gav gav nişt ne hecer[61] (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

Qêrîn û dengek bi seranserî dinya dikeve, afirîner ronahîyê dişîne bo dinyayê û îhtimal e ew ronahî dibe ku afirandina tavê be. Taw şewqa xwe dide zemînê kesk an ku dinyayê, ji asîman derdikeve ew ronahî û li ser zemînê kesk bi cih dibe. Heft tebeqeyên dinyayê li ser pişta masî cih digirin, masî li ga û ga jî li kevirekê siwar e. Di wir de ji nişka ve şewqdana tavê an ku afirandina tav û ronahîya wê nimûneyeke berbiçav e ji bo cureyê afirandina ji tunebûnê lewra qet tiştek nîne afirîner tav pê afirandibe. Yek jî hêjayî gotinê ye ku ga û masî ji bilî wateya 'hertişt' bi wateya hêza nihênî dikare bê şîrovekirin. Her wiha dema mirov dibêje her tişt, an ku behsa her tiştê ji jêr heta li jorê tê kirin, bi vî rengî referansek dertê holê ji bo veqetîna (*detachment)* erd û esmên jî ku ev jî afirandina ji dê û bavê dinyayê tîne mirov. Ji bo zêdetir zanyarî derbarê ga û masî de, li beşa çarem a berawirdkirinê binêrin.

Awird ew cihan
Mang der ewsa awird ew cihan

Ve mu'ciz bend kird[62] ne rûy asiman
Perî rewşenî zemîn û zeman

Heva û Baba Adem
Ewsa afirîd Heva û Baba Adem (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

---

[54] pêl
[55] ronahî
[56] rûnişt
[57] kesk- li vir mebest gerdûn e.
[58] derket
[59] qad
[60] lengerdan: bi cihbûn
[61] kevir
[62] girêda

Heta niha dinya û ferîşte hatibûn afirandin û di jor de behsa nîşaneyên ronahîya tavê jî hatibû kirin. Di malikên jorîn de afirandina tavê tê dupatkirin di gel a heyvê. Mang û wer an ku heyv û tav bi awayekî mucîzewî tên afirandin û li asîman tên daliqandin û dinya jî ronak dikin û wî demî Heva û Baba Adem jî tên afirandin. Di vir de ji bo afirandina her sêyan pêvajoya afirandinê bi afirandina heyv û roj û beşer, pêngav bi pêngav digihije amanca xwe. Ji ber ku di dema afirandina her sêyan tu tişt nebû, di vir de dikare bê gotin afirînerî ew ji tunebûnê afirandin.

Ve tav û te'cî[63]l new saet new dem
Can ve can ferma Mûsî ve qelem

Cihan cuftê cam
Seraser saxtin cihan cuftê cam

Erkan û edeb eqil û hûş fam
Kird ve çihar[64] 'enasir temamî temam[65] (Şêx Emî, çapnebûyî: 36-37).

Afirîner bi lez û bez di wê rojê di vê demjimêrê de, zû bi zû ferman dike bi Pîr Musî da ku pênûsa xwe hilbigire û tomar bike ku li dinyayê her tişt cot bi cot hatine sazkirin wekî erkan û edeb û eqil û hiş. Di malika dawî de ku tê de behsa afirandina çar enasir (hêman) tê kirin ku ew jî li gorî hizra endamekî vî dînî: ba, ax, av û agir e. Bi afirandina unsûrên sirûştî û konseptên razber, pêvajoya afirandina cîhanê digihîje asta kamilîyê. Wekî di qewlên Êzidîyan de jî hate dîtin, di vê kelamê de jî cureyên sereke yên afirandinê an afirandina ji tunebûnê ye an jî afirandina ji kaosê ye. Her çend hêmayên avê û behsa hatina ji nav durrekê bê kirin jî cureyên wekî afirandina bi naqovkarê dinyayê û bi hatina ji dinyayekê din di vê kelama Şêx Emîr de nînin.

3.3.2. Mîtosa afirandinê di Defterê Xan Elmasê Loristanî de

Zatê Heq "Ya" bî[66]

---

[63] lez
[64] çar

[66] bû

Ne ‘ehdê[67] zerrat[68] Zatê Heq “Ya” bî

Ûsa[69] ke ne Lewh ne Sureyya bî
Ne ‘erş bî ne ferş cihan derya bî

Mewlam ve durr bî durr ne tayê[70] derya
Je durr ber ama[71] cihan kird ihya

Namê[72] wêş[73] niya[74] ve Xawendikar
‘Erş û kursî û ferş ûsa da qerar[75] (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Wekî ku di versîyona Şêx Emîr jî de hatibû behskirin, Zatê Heq an ku afirîner di şiklê *Ya*’yê de bû ku ew jî ezel û ebedbûna wî nîşan dida. Di vir de dewreya pêş durrê tê dîtin ku berîya durrê ne zerreya madeyê an ku *atom* an jî *quark* ne jî ji bilî şiklê *Ya*’yê afirenerî tiştekî din hebû. Di malikên jorîn de tê têgehiştin ku wî demî ne qeder ne felek û stêrk, ne erd ne jî esman hebû dinya seranser bi avê ve dagirtî bû. Afirîner li durrê bû ya li binê avê û ji durrê derhat û dinya afirand, navê xwe danî Xawendikar û meqama xwe, esman û dinya ava û seqamgîr kir. Wekî di vê ravekirinê de jî xuya dike, nimûneyên aşkere yên afirandina ji tunebûnê heye. Afirandina erd, esman, qeder û felek bêyî keresteyekê aşkeretirîn mînak e ji bo afirandina ji tunebûnê. Lê behra bê şikl û bêdawî îmajeke kaotîk û bêserûber radixe ber çavan û afirandina erd û esmên û tiştên din li pey birêkûpêkkirina wê deryayê pêk tê, ji ber vê çendê heta astekê dikare bê gotin ku di vir de nîşaneya afirandina ji kaosê jî heye. Her çend di navenda malikên jorîn de behsa behr û binbehrê hebe jî nabe mirov pêvajoya afirandina jorîn bi afirandina bi

[67] serdem
[68] dinok
[69] wusa
[70] binî
[71] derket
[72] nav
[73] xwe
[74] danî
[75] mezrand

noqavkarê dinyayê ve girê bide lewra zêdetir rewşeke nediyar û nezelal bi pêşveçûnek diguhere û bingehek jê re tê avakirin an ku birêkûpêkkirinek diqewime.

> Heftad hezar sal tak û tenya ferd
> Ve rêw[76] derya we çogan bazîş[77] kird
>
> Je xakê besat saza Cebre'îl
> Ta bî ve hamrazê[78] Xaliqê Celîl
>
> İmcar[79] îcad kird[80] çen[81] melek yek car
> Ji ew be'd[82] zemîn û asiman da qerar (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Di maliken jorîn de xuya dike ku demeke dûr û dirêj, afirînerî bi tik û tenê di avên bêsinor û bêdawî de serwerîya xwe domandîye û wekî di metafora leyîstina çoganê de, birêvebirîye. Dû re, Cebraîlê ku ferîşteya sereke ye ji axê diafirîne ku ew jî dost û pêbawer e ji afirînerê mezin re. Cebraîl, li gorî Hamzeh'ee (1990:99) di dewreyeke din de teqabûlî Pîr Binyamîn dike ku ew jî di kelama deftera Şêx Emîr de jî tê behskirin. Herwiha Kreyebroek (2014:60) ev zanyarîya derbarê Cebraîl û Pîr Binyamîn de piştrast dike. Afirîner, di heman demî de, çend ferîşteyên din diafirîne û dawiyê de jî erd û esman diafirîne. Malikên jorîn de, her çend bi afirandina melek û zemîn û esman îmayek ji bo afirandina ji tunebûnê hebe jî, zêdetir nîşaneyên afirandina ji kaosê hene. Cebraîl ne ji tunebûnê lê ji axê tê afirandin û malika bi dû wê de jî nîşan dide ku çend ferîşteyên din jî hatine afirandin di heman demî de, nabe mirov bêje Cebraîl ji axê û melekên din jî ji tunebûnê hatin çêkirin di gel erd û esmên ve. Ji serî heta binî pêşveçûnek aşkere heye ji bineretî, tenêtî û hebûna kaotîk ber bi *kozmoseke* birêkûpêk ve. Veguhestina ji axê

---

[76] bêdawî
[77] Lîstika çoganê
[78] hevraz
[79] Dûv re
[80] Çê kir
[81] çend
[82] paşê

berew bûnewer, ferîşte û erd û esmên ve nimûneya mîtosên afirandina ji kaosê ne ku tê de hêmanên ji hev cuda tên li cem hev û atmosfereke teşegirtî ava dikin.

Ve sirrê qudret[83] sazena ‘Alem
Heft teweq[84] je piştê mahî[85] kird muhkem

Ve qudretê wêş Xaliqê Ekber
‘Enasir[86] yekca awird[87] ew nezer

Muddet[88] medîdî[89] je mabeyn[90] wiyerd[91]
Xilqetê[92] Adem ve xeyal awird (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Afirîner bi nihênîya hêza xwe alem saz dike, heft qatên dinyayê li ser pişta masîyê durist dike. Bi hêza wî afirînerê tekane, di heman demî de element têne der. Demeke dirêj derbas dibe, di asteke din de, hizra afirandina însanî dike. Di vir de rewşeke destpêkî ya hêz û potansîyela îlahî heye ku ew hêz û potansîyel xwe bi veguhestinekê an ku bi dinyayeke teşegirtî dide der a ku ji heft qat û elementên cuda ve pêk tê. Ew têperîna ji haleta destpêkî ya nediyar û nezelal ber bi sazkirina tebeqeyên dinyayê û elementan, ji bo *kozmoseke* biserûber, nimûneyek e ji bo cureyê mîtosên afirandina ji kaosê. Nabe di vir de behsa afirandina ji tunebûnê bê kirin ji ber ku behsa nihênîyekê tê kirin û alem ji nihênîya hêza afirînerî tê sazkirin.

Ferma[93] melekan çenî[94] Cebre’îl
Biçin xak barin[95] je kuyê[96] Serendîl[97]

---

[83] hêz
[84] qat
[85] masî
[86] element
[87] anî
[88] mawe
[89] dirêj
[90] navber
[91] çû
[92] afirandin
[93] Ferman kir
[94] digel

Belkem[98] binyadê Ademîzad[99] kêym[100]
Dilê Ayiman[101] wê dinya şad kêym

Melekan her yek ‘azim biyen[102] ve xak
Ve hukm û mucizê Padişayê[103] bê bak[104]

Xak haşa mekeru[105] û megirîwe[106] şîwen[107]
Amanen[108] taqetê Ayemim niyen (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Di malikên jorîn de hatûçûneke ferîşteyan heye di navbeyna ax û afirînerî de. Afirîner ferman dide ferîşteyan da ku bi serperiştîya Cebraîl biçin axê bînin ji çiyayekê bi navê Serendîl ê ku wekî çiyayê Qaf çiyayekî efsanewî ye. Dibe ku bi vê axê bingeha Ademî bê danîn û dilê mirovan bê şadkirin. Li ser fermana Padişahê bêtirs, hemû ferîşte yek bi yek bi rê dikevin. Ax daxwaza wan qebûl nake û dest bi şîn û gîryanê dike û dibêje taqetê wê nîne ku bibe însan. Malikên di jor de, yekser bi cureyê afirandina bi naqoavkarê dinyayê ve girêdayî ne, ji ber ku di vê xebatê de heta niha gelek nimûneyên vî cureyê mîtosa afirandinê nehate dîtin, mayeyî dubarekirinê ye ku di vî cureyê afirandinê de ferîşte, teyr an jî ajelên ku dikarin noqî bin avê bin ji binê behran, ji çiyayan û cihên dûr re tê şandin ji bo anîna herî, ax, tarçiq, kevir û hwd. da ku pê alem,

---

[95] anîn
[96] çiya
[97] Cihek mîtolojîk
[98] Dibe ku
[99] însan
[100] bikin
[101] mirovan
[102] çûn
[103] xwedê
[104] tirs
[105] Haşa kird
[106] girîn
[107] şîn
[108] eman

erd, mirov û hwd. bên afirandin. Di vegêrana jorîn de jî ferîşte bi rêberîya Cebraîl diçin Serendîlê ji bo anîna axa ku pêwîst e ji bo afirandina mirovan. Ev anîna axê ji çiyayekê bi amanca afirandinê û dawiyê de bersîva axê ji vê daxwaz û fermanê re bi cureyê mîtosa afirandinê ya bi noqavkarê dinyayê re hemahengîyê de ne.

Melayik aman ‘erz kirdin ve Şa
Xak je Ayemî mekerû haşa

Şa ferma ve ‘Ezra’îl ve taw û tacîl[109]
Tu me’murê xak û kuyê Serendîl

‘Ezra’îl ve qar[110] daxil bî ve xak
Ve hukm û mucizê Padişayê sehmnak[111]

Xak haşa mekird megiru zar zar
Biwexşim[112] ve zatê bê tayê[113] Kirdigar[114]

‘Ezra’îl zerreî ram[115] nawir[116] ve dil
Nîşê[117] serkeciş[118] muhkem west ve gil[119]

Quwet da ve bal ew ca werîza[120]
Şehper[121] da ve hem nîşt ve rû yê heva

Xak hawird niya[122] ve huzurê Şa
Vatiş[123] emrê tu hawirdim ve ca[124] (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

---

[109] Bi lez
[110] enir
[111] tirsehêz
[112] bexşandin
[113] Bê mînak
[114] xwedê
[115] rehm
[116] Ne anî
[117] nîçik
[118] kuleng
[119] herî
[120] rabû
[121] per
[122] danî
[123] got

Ew heft malikên jorîn wekî çarên din ên pêştir, senaryoya anîna axê û cureyê afirdandina bi noqavkarê dinyayê didomînin. Ferîşte diçin hizûra afirînerî û jê re dibêjin ku ax naxwaze bibe mirov. Afirîner careke din bi zûyî ferman dide bi Azraîl û jê re dibêje ew bi xwe berspirsyarê ax û çîyayê Serendîl e. Azraîl jî bi hêrs û qêrînekî diçe nav axê li ser ferman û mucîzeya afirînerê tirsnak. Ax dixwaze bê bexşandin. Bi qasî zerreyekê rehm di dîlê Azraîl de nîne û bi nîçika kulengê zexm lêdide û herî ji axê derdixe. Bi hêza baskên xwe radibe û berê xwe dide esmên, axê dîne dadine li ber afirînerî û jê re dibêje emrê wî bi cih anîye. Ji ber ku di ravekirina jorîn de behsa cureyê afirandin bi noqavkarê dinyayê hatibû kirin û nimûneyên wî hatibûn dayin, di vir de careke din nayê dubarekirin, ji ber ku malikên jorîn û çarên pêştir bi heman senaryoyê ve girêdayî hev in. Cureyê afirandinê heman cure ye, lêbelê, yek û du pêşveçûn hene ku ew jî di vir de êdî Azraîl vê carê tê erkdarkirin û di dawiyê de fermana ku afirînerî ji mêj ve dabû bi cih tîne û axê tîne. Sedema şandina Azraîl di şûna Cebraîl de wisa diyar e ji ber ku Azraîl wekî di malikan de jî diyar e, bêrehm û bi xof e. Lê bi giştî, ev pêvajoya anîna axê ji bo avakirina bingeha mirovan yekser nimûneya cureyê afirandina bi noqavkarê dinyayê ye lewra fermanek tê kirin û her çend zor û zehmêtî tê de hebin jî ew axa şênber tê anîn û afirandina mirovan destpê dike.

Şa vat melekan çenî ve zatê pîr
Ew qebzeyê[125] xak bikin ve xemîr[126]

Xakê teyar[127] in xemîr jîş[128] bisaz[129]
Ayim îcad ken ve sidq û niyaz

---

[124] Bi cîh anî
[125] kulm
[126] hevîr
[127] pak
[128] Ji wê
[129] Saz ke

Ve çwar[130] ‘enasir xemîriş saxtin[131]
Ve şêkl[132]ê Mewlam qalibiş saxtin

Elmas kêmtirînê yaranê Mewla in
Ve Dînê Yarîş Allah û Eyvellah in (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Di malikên jorîn de jî pêvajoya ax anînê qediyaye û ya afirandina mirovî destpê dike. Afirîner bi ferîşteyan dibêje ku bi serperîştiya zatê pîr an ku pîrê ferîşteyan Cebraîl hevîrê çêbikin ji wê kulma axa pak û mirovên sadiq û xwedî amanc durist bikin. Bi çar element: ba, ax, av û agir hevîr tê çêkirin û di dawiyê de, tê dîtin ku ew mirovên ku hatine afirandin dibin endamên dînî Yarî an ku Yarsanî û ji endamên wan re jî tê gotin Yar(an) an ku Yarsan. Xan Elmas jî xwe yek ji nefsbiçûktirinê wan hevrêyên afirînerî dibîne û kelamê jî bi sipartina hevrêyên xwe ya bi afirînerî diqedîne. Wekî heta niha jî hatîye dîtin, zêdetir ji nîva malikên Xan Elmas de cureyê mîtosa afirandinê ya bi noqavkarê dinyayê cureyê sereke ye beramberî afirandina ji tunebûnê û afirandina ji kaosê ya di versîyona Şex Emîr de. Ev pêngava anîn û bi kar anîna axê ji bo çêkirina qaliba mirovan yekser nimûneyên afirandina bi noqavkarê dinyayê ne. Disa jî xaleke giring di vir de divê bê bibîrxistin, wekî di beşa yekem de û di binbeşa cureyê afirandina bi noqavkarê dinyayê de hatîye diyarkirin, ji mirov û xwedawendan zêdetir, afirandina dinyayê di navenda vî cureyê mîtosên afirandinê de ye.

---

[130] çar
[131] Çê kirin
[132] teşe

4. BERAWIRDKIRINA MÎTOSÊN AFIRANDINÊ YÊN KURDÊN ÊZIDÎ Û YARSAN

Mîtolojîya berawirdî bi giştî ji bo diyarkirina temayên hevpar û qalibên gerdûnî yên di vegêranan de tê bi kar anîn. Ji bo vê qada xebatê, gelek bîr û boçûnên bi nav û deng hene: teorîya Monomît a Joseph Campbell (Rêwîtîya Lehengî), Arketîp a Carl Jung, Şitlê Zêrîn a James Frazer, Binyadgerîya Lévi-Straus, Pîroz û Nepîroza Mircea Eliade, Îdolojîya Sêrehendî ya Geoerge Dumézil û Mîtolojîya Rojê ya Max Müller. Li gorî Max Müller (1877) "mîtos hemû ji çavdêrîya bûyerên sirûştî bi taybetî jî ji ya rojê derhatine ku ew jî bi xwe re mîtolojîya rojê (solar mythology) anîye". An ku di bingeha her tiştî de roj heye û temayên hevpar li derdora rojê tên avakirin wekî ku di Êzidîtî û Yarsanîyê de temaya durrê heye. Durr jî wekê destpêkek e û durr û hêza afirînerî di wan vegêranan de têkel in.

Bi diyar kirina curbicurbûn û hêmanên hevpar ên di nerîta mîtolojîk a dinyayê bi giştî de, wan bîr û boçûnên jorîn derfet dane me da ku em bi awayekî kûrtir fêhm bikin ka mîtos di nav gelan de çawa tevgeriyaye. Zanista lêhûrbûna li ser hêmayên hevpar ên mîtolojîyan, bi taybetî ji alîyê Max Müller (1977) ve wekî Mîtolojîya Berawirdî hatîye bi nav kirin; wekî rêyeke alternatif ji bo fêhmkirina bingeha dîn, çand, netewe, teorîyên psîkoanalîtîk û hwd.

Mîtosa afirandinê ji bo têgihîştina bingeha bawerîyên spirîtûel ên civakên curbicur amûreke sereke ye. Êzidîtî û Yarsanî, her du dînên ku ji Kurdistanê derketine, derbarê bingeh û destpêka dinya û mirovantîyê de bi qewl û kelaman vegêranên bêhempa pêşkêşî me dikin. Mîtosên di nav wan vegêranan de bi cureyên cuda yên afirandinê dikare bên analîzkirin ku di nav de cureyên afirandin ji kaosê, ji tunebûnê, ji dayikûbavê dinyayê, bi hatina ji dinyayeke din û bi noqavkarê dinyayê hene. Di navenda mîtosa afirandinê ya Êzidî û Yarsanan de durr heye.

> "Di eslê xwe de, hêmanên mîtosa afirandina gerdûnê, di her du nerîtan de wekî hev in. ...her du nerît afirînerekî qebûldikin ku berîya dîrokê hebûye û teşeyek daye durrê, durra ku objeyek e biçûk û gilover e û hemû elementan dihundirîne yên ku şikl dane dinyaye." (Kreyenbroek, 2014:51-62)

û ew durr jî temsîla haleta yekgirtî û potansîyel a alemê ye ku di nav kaoseke bineretî (*primordial chaos)* de ye ku ew jî bi avên bêsînor û bêteşe tên teswîrkirin. Her çend di jor de ji bo Êzidîyan bi tenê qewlê afirandina dinyayê hatibû pêşkêşkirin, hêjayî gotinê ye ku di çend qewlên din de jî, bo nimûne di qewlê Zebûnî Meksûr de jî hevtayîya sembola durrê heye di gel durra di nav kelamên Yarsanan de.

6. Wekî Pedşayî li durê bû
   Hisyatek jê çihê bû
   Şaxa mihbetê ava bû

12. Padşê min dur ji xwe cihê kir
    Bi yarekî ra erê kir
    Xerqê nûranî çêkir (Kreyenbroek û Reşow, 2011:100).

    Mewlam ve durr bî durr ne tayê[1] derya
    Je durr ber ama[2] cihan kird ihya (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

    Şertê biyaş[3] best[4] çenî[5] xulaman
    Pay[6] çep west[7] ew pêş ne durr beraman[8] (Şêx Emîr, çapnebûyî: 18-19).

Di vegêranên jorîn de, durr ji cihekî bêhtir, rehendek e, rehenda nihênî ya cewhera îlahî ku afirîner jê tê der û xwe dide naskirin an jî hîskirin û ancax bi vî rengî hewldanên têgihiştina hebûna wî watedar dibe û mirov bi vî awayî wateyekê li hebûna wî bar dike û ji bo vê yekê jî metaforeke wekî durrê pêwîst e. Durr di vir de objeyek e û kirde jî afirîner e. Durr, ji ber rengê xwe yê spî pakî, duristî û evînê; ji ber şiklê xwe jî yekîtî,

---

[1] binî

[2] derket

[3] Şertê Beyabes: mebest yekem peymana Xwedê û firîşteyên sereke ye

[4] girêda, çêkir

[5] ligel

[6] ling

[7] avêt

[8] derketin

yekgirtîbûn û bêdawîbûnê tîne bîra mirovan. Helbet di çand û civakên cuda de jî nêrînên li ser durrê ew in:

> Di çanda Hindûyan de, durr bi hevyê ve dihat girêdan û her du jî sembolên evîn û pakbûnê bûn. Li gorî metnên Hindûyî, Krishna durrê peyda dike û diyarî keça xwe dike di roja şahîya wê de. Nerîta Îslamî nirxeke hêj bilindtir bi durrê didin, Quran wekî yek ji heft xelatên mezin ên bihuştê jê behs dike. Di Xrîstîyanîyê de, durr hezkirin, bereket, pakî û berevanîya li dijî xirabîyê ye (Eusharon, 2024).

Li ser hemû gotinên jorîn û di gel îddiayên derbarê ezelbûn û ebedbûna afirîneran, mirov eger durrê bişibîne hêka kozmîk, wî demî îhtîmala wê yekê jî heye ku belkî afirîner jî hatibin afirandin "...Dibe ku afirîner ji hêka kozmîk bihêz derketibe lêbelê hêk berîya wî hebûye û ew jî nîşanî me dide ku afirîner bi xwe jî xwedî dayikê ye—wekî avên tarî û dayikî yên malzaroka gerdûnî*"* (Leeming, 2010: 10). Ji bilî nêrînên jorîn, wateyên din ên ku durr temsîl dike ev in: "navenda mîstîk, sembola bihuştê, cihê ku av û agir digihijin hevdu, giyanê mirov (Cirlot, 1962: 251).

> …sembola nîzameke hevta bi durrên li ser bendikekê jî tê dîtin ku dema dibin wekî tizbîh an jî *siitratmayekê* an ku tebeqeyên cuda yên dinyayê bi ruhekî gerdûnî lihevgirêdayî, wekî *atman*. Bi wî awayî, Gerdenîyên durrî, pir-tebeqeyîbûna yekîtiya kozmik û yekgirtina elementên belawela û avakirina têkilîya ruhî di navbeyna du an zêdetir takekesan de temsîl dike". "…Hêmaya arketip a durrê tiştekî wisa temsîl dike ku pak, neaşkere, di kûrahîyan de veşartî û ne li berdest e. Hariri pesnê durrê dide û dişibîne Rêya Mîstîk a ku di qalika dadgerîya îlahî de parastî ye. Durra parastî, sembola qîzbûnê ye di nivîsên terîqeta Ehl-î Heqq bi giştî di nav Kurdan de. Li alîyekî din, bawerîya Ehl-î Heq a di derbarê qîzbûna dayikên avatarên Xwedê û bûyina navê sereke ya Ramz-bar (Nihênîya Okyanûsê) bi vê sembolê re têkildar e. Li gorî kozmogonîya wan, di destpêkê de, bûnewerek tunebû ji bilî Rastîya pîroz, bi tenê, zindî û mezin. Cihê jiyana wî di durrekê de bû û cewhera wî veşartî bû. Durr di nav qalikekê de bû û qalik di nav behrê de bû û pêlên behrê ew herdu pêça bûn. Di helbesta xwe ya bi navê *Îskendernameyê* de, Nîzamî jidayikbûna Îskenderî dişibîne bi şînbûna durreke keyanî ya di nav qalikekê de û bi baranên Biharê tên tuximkirin…" …di sembolîzma xewnan a rojhelatî de, ev karakterîstîkên taybet ên durrê baw in û bi giştî wekî zarok an jî hevjînekê an jî hewîyekê tên ravekirin. Ji bilî vê yekê jî, wekî sembola zanayî û dewlemendîyê tê dîtin (Chevalier&Gheerbrant, 1994: 744-745).

Di kelam û qewlên jêrîn de dîsa xaleke hevpar heye ku ew jî metafora 'mişk û marî' û 'ga û masî' ye. Mar hêmaneke pîroz e di Êzidîtîyê de ji ber ku Êzidî ji tofanê rizgar kirine. Lê ew mar cuda ye ji mara temamker a cotepeyva 'mişk û marî'ya jêrîn lewra di qewlê jêrîn de bi wateya 'her tiştek' hatîye bi kar anîn, an ku nebûn û

şêlûbûneke sertaserî. Bi heman awayî ‘ga û masî’ jî bi hev re di cotepeyvekê de tê bi kar anîn û wateya wê cotepeyvê li gorî kelama jêrîn jî wekî diyar e: seranser, ji erd heta esmên û hwd. û hêjayî gotinê ye di vir de qewlê jêrîn nimûneya afirandina ji tunebûnê ye lê kelam bi xwe nîşaneyên afirandina ji kaosê dihundirîne.

1. Ya Rebbî dinya hebû tarî
Tê da tunebûn mişk û marî
Te xênda kir tezehalî
Çu nema gul jê barî (Kreyenbroek û Reşow, 2011:116).

Ama west ew dûn zile[9] dinyayî
Xurûş kird[10] cihan ne gav[11] ta mahî[12]

Cihan xurûşa[13] ne gav ta mahî
Awird ew besat mewcê[14] roşinayî[15] (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

Her çend mişk, mar, ga û masî bi wateyên cuda hatibin bi kar anîn jî, di mîtolojîyê de wateyên wan jî ew in: “mişk wekî sembola nexweşî û mirinê tê pêşiya me. Mişk di sembolîzma serdema navîn de, bi şeytanê ve dihate girêdan.” (Cirlot, 1962: 271). Mar jî her wiha ji alîyê Cirlot (1962: 285-290) wekî sembola enerjî, parêzvanê kanîya jiyanê, xwezaya *dualî*, vejîn, jinûvebûn, zanayî, zanyarî, berhemdarî, afirînerî, parêzvanî, kaos, enerjîya binereti, veguhestin û wekî qencbûnê hatîye behskirin. Chevalier û Gheerbrant (1994: 845) dide zanîn ku “mar ne ku bi tenê arketîpekê, lê komplekseke arketîpan teswîr dike ya ku bi binerdên sar û avzên ên destpêka tiştan ve tê girêdan”. Di Avestayê de, mar û mişk temsîla binerd, tarîbûn û xerabûnê dikin, ga jî temsîla bereket, av, roj û qurbanîyên xwedawendên roj û avê dike. Li gorî Cirlot (1962: 2) ga bi erd û heyvê re tê girêdan, her wiha xwedawendên heyvî bi şaxên gayan dihatin teswîrkirin. Li Loristan û

[9] tijî ji deng
[10] qêriya
[11] ga
[12] masî
[13] qirîn
[14] pêl
[15] ronahî

alîyê Kengaverê, çandeke bi navê gadizî heye, dema gayê yekî tê dizîn û paşê ew ga tê dîtin an peyda kirin, tê bawerkirin ku dê hişkesalî rabe û baran bibare û bereket dê were. Li Misrê, ga kelekela germê û di Brahmanîyan de jî bereketê temsîl dikir. Li gorî bawerîya Hindûyan, boxe û ga alîyên aktîf û pasif ên hêzên berhemdar ên gerdûnî temsîl dikin. Chevalier û Gheerbrant (1994: 237-238) jî gayê wekî koka hemû diyardeyan û wekî dêya Rojê didin zanîn di gel heyv, dewlemendî, berhemdarî, ji nû ve jîdayikbûn, rênîşandêrî û wekî di Vedayan de jî hatîye behskirin ga xwedî roleke îlahî û kozmik e wekî arketîpa berhemdarîya *maternal.* Masî jî li gorî Cooper (1987: 68-69) berhemdarî, bereket, veguhestin, vejîn, spirîtûalî, parêzavanî, dewlemendî û şensê temsîl dike. Masî her wiha di Xristîyanîyê de jî pir girîng e, li gorî rîwayetên Xrîstîyanîyê hz. Îsa bi mûcîzeyekê, pênc hezar mirov bi du masî û pênc nan têr kirine. Li Misrê, tijebûna rubara Nîlê bi masîyan ve ji bo berdewamîya jîyanê nîşaneyek bû. Masî Di mîtolojîya Hindûyan de wekî Matsya tê teswirkirin ê ku yek ji heft avatarên xwedawend Vishnu bû û rizgarkerê Vedayan bû ji tofanê. Disa di vir de hêjayî diyar kirinê ye ku di pêwenda afirandina ji tunebûnê de jî wekî hevtayê qewlê jorîn, divê li kelama li jêr bê nêrîn:

> Ûsa[16] ke ne Lewh ne Sureyya bî
> Ne ‘erş bî ne ferş cihan derya bî (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Ji bilî wateya ku cotepeyva ga û masî di jor de temsîl dike, di bawerîyeke kevnare ya Kurdan, di Mîtrayîyê de jî mirov pêrgî peyva gamasî tê ku nîşaneyên wê di malika jêrîn de jî tê dîtin:

> Heft tebeq[17] ne pişt mahî da lenger[18]
> Mahî nîşt ne gav gav nişt ne hecer[19] (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37).

Gamasî: Gamasî, li gorî bawerîya Mîtrayî, ew ga ye ku wisa tê bawerkirin di kûrahîya behran de dijî, li ser pişta masîyekî mezin siwar e û dinya li ser şaxên wî

[16] wusa

[17] qad

[18] lengerdan: bi cihbûn

[19] kevir

disekîne. Dema Gamasî biwestiya û dinya ji ser şaxekî veguhestanda li şaxekî din re, wisa dihat bawerkirin ku dinya dihejiya û erdhej rû didan. Li gorî mîtolojîyê, ev ga, salê carek dilive û her livîn gihayên nû, zindîyên nû û tovên nû tîne der (nql, Özmen, 2021:208)

Yek ji wan hêmanên hevbeş ên Êzidîtî û Yarsanîyê av an jî behr e ku ew jî bêhtir nîşaneyeke afirandina ji kaosê ye di vegêranên her du çandan de. Dema av di navendê de be, wisa tê hizrkirin ku wê tê de nimûneyên afirandina bi noqavkarê dinyayê hebin an ku bûnewerekî wê bê şandin ji bo binê avê da ku tiştekê bîne ji bo afirandina dinya an jî mirovî. Lêbelê di qewl û kelaman de av zêdetir bûye mijara afirandina ji kaosê ji ber ku beriya afirandina dinya, ferîşte, mirov, erd û esman û hwd. amaje bi rewşeke nezelal, bêdawî, bêbinyad û bêteşe tê kirin di gel deryayên bêbinî û bêsînor.

4. Te xa lê saz kir
Di behra da tenê hebû durr
Ne dimaşiya, ne dimeşiya
Te xaş ruh anî ber
Nûra xa lê peyda kir (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 116).

Ewsa Padişam ne Xuwa ne durr bî
Durr ne betnê[20] behr xeybxaney sirr bî (Şêx Emîr, çapnebûyî: 18-19).

Di vegêranên Yarsanîyê de cext her li ser vê yekê ye ku durr di nav avekê an jî di bin avekê de ye, lê di Êzdîyan de qewl hene ku hem wekî di jor de durr di nav avê de ye û hem jî wekî qewla jêrîn ê ku tê de tê behskirin av ji durrê derdikeve.

12. Av ji durrê herikî
Bû behra bêserî bêbinî
Bêrê û bêderî
Êzdanê me ser behrê gerî (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Herwiha av û behr di mîtolojîyê de wekî Copper (1987:121) nîşan dide, hem kaosa binerетî û hem jî jiyan û berhemdarîyê temsîl dike digel afirandin, jidayikbûn, nihênî, kûrahî, gorankarî, rêwîtîya spirîtûel, pakbûn û paqijbûn, mirin û vejîn û hwd. Av û behr

[20] hundur, di nav

Ji alîyê Cirlot (1962) wekî sembola bêhayîya girseyî (*collective unconscious)* tê nîşandan a ku temsîla rehendên psîşîka (*psychic)* mirovî ên kûr û hevbeş e.

> Bi vî rengî, derya bi bêhayîya girseyî (collective unconscious) re yeksan tê dîtin ku jê ronahîya ruhî berz dibe (32). Wekî hêmayeke helbestî an jî wekî xewnekê, behra bi bahoz, nîşaneya rewşeke hevta ye ya di kûrahîyên jêrtir ên bêhayîya hestîyar *(affective unconscious)* de (Cirlot, 1962: 242).

Di afirîna dinyayê de, erd û esman bi heft qatan ve tên teswîrkin. Ew mijara heftane di her du çandan de, di gelek cihan de xwe dide dubarekirin: heft qat, heft ferîşte, heft sencaq, heft sir. Her wiha di olên din de jî roja heftem a qedandina avakirina dinyayê, heft xelatên li bihuştê, heft gunehên mezin û hwd. hene. Jimareya heft pirî caran wekî jimareya nûwaze tê dîtin ku sembola temambûn û tevayîyê, nîzama kozmîk, mîstîsîzm û spirîtûalî, pîrozewerbûn û îlahîbûn û her wiha sembola dewr û çerxên xwezayî ye. "...ew bi heft Alîyên Fezayê re di hemahengîyê de ye (ku ew jî şeş rehendên hebûnî û navend bi xwe ye) ..." (Cirlot, 1962: 233). "Heft bi awayekî aşkere semboleke nawneteweyî ya temambûnê ye, lê temambûneke ne statîk, yeke dînamîk." (Chevalier&Gheerbrant, 1994: 860). "Şikefta Mîtra xwedî heft derî û altaran e di gel nerdevanê heft pêlekanî ku ew jî heft merheleya nihênîyan e. Heft herêmên erdî..., ...Dara Jîyanê, her yek xwedî heft pelan, heft derîyên dojehê..." (Cooper, 1990: 860). Di Êzîdiyan de behsa çardeh qat erd û esman tê vegotin û di Yarsanîyê de jî heft qat erd. Hejmara heft, kemalat û kamilbûnê jî nîşan dide. Her wiha, afirandina di şeş rojan de û bêhnvedana di roja heftan de nîşaneya kemalatê yan jî peresînê (*evolution)* ye ku gav bi gav afirandin pêk hat wekî ku di qewlê Ezidîyan de jî tê nîşandan. "Xudawendê me înî kir 'esas e" (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 120)

10. Havên avête behrê
    Behr pê meyanî
    Dexanek jê dexinî
    Çardeh tebeq 'erd û 'ezman nijinî
    Êzdanê me durr deranî. (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 119)

Ve sirrê qudret[21] sazena ‘Alem
Heft teweq[22] je piştê mahî[23] kird muhkem (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Wekî mijara jimareya heft, heftê hezar û heftsed hezar sal jî ji bo teswîrkirina tikûtenêbûna afirînerî tên bi kar anîn. An ku demeke dûrûdirêj pêwîst bûye ji ser derbas be da ku pêvajoya destpêkirina afirandinê destpê bike.

30. Hevsed salî ji berî Adem jimar e
'Erdê xiyare negirtî şiyar e (Kreyenbroek û Reşow, 2011:120).

Heftad hezar sal tak û tenya ferd
Ve rêw[24] derya we çogan bazîş[25] kird (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Di afirandina mirovan de afirîner ji çar elementan kelk werdigire ku ew çar element jî di Êzidîyan de wekî çar qisim û di Yarsanan de wekî çar enasir an ku çar hêmanên bingeha afirandina mirov û cihanê ne. Çar qism di Êzidîyan de ax, nûr, av û agir in, lê di Yarsanan de jî her çend bi awayekî aşkere kifş nebe jî, wekî pêştir jî hatibû gotin, li gorî şîroveya endamekî vî dînî ax, ba, av û agir in.

24. Yek av e, yek nûr e
Yek ax e, yek jî agir e
Xudawendê me bi rehm e
Diyar kir saz û qudûm e’ (Kreyenbroek û Reşow, 2011:117).

“Erkan û edeb eqil û hûş fam
Kird ve çihar[26] ‘enasir temamî temam” (Şêx Emîr, çapnebûyî: 36-37)

Her çend ji alîyê endamê vî dînî ve tê îddiakirin ku ew çar unsûr di Yarsanîyê de ax, ba, av û agir in, ew îddia ji alîyê Îrfan Mistefa tê redkirin:

> Ewey lêre da serincradekêşêt ewe ye ke le têkste Êzidîyekan da ew çiware be çiwar tuxme maddî ye ke diyarî krawin û le zorêk têkstekanîş da nawî bergekan nehatûwe û

[21] hêz
[22] qat
[23] masî
[24] bêdawî
[25] Lîstika çoganê
[26] çar

> tenha nawî çiwar texmeke hatûwe wate (agir, aw, ax, ba) le katêk da em bînîne bo çartenî Yarsanekan bo Yarsanîyek zehmet qebûl bikrêt û çûnke le hîç têkstêkî yarsanî da çarten be tuxme gerdûnîyekan guzarşit û wesfîyan nekirawe (Mistefa, 2020:).

Çar hêmanên ku di jor de tên behskirin av, ax, ba û agir tiştên curbicur temsîl dikin. Bi giştî av sembola çavkanîya sereke ya jîyanê, pakbûn, nûbûn, kûrahîya hestên mirovan û veguhestin û hwd. e. Erd sembola stabîlîte û binecihbûnê ye û her wiha rehenda materyalî ya hebûnê ye an ku binemaya şênber a ku jiyan li ser ava dibe. Ba an ku hewa sembola eql û ferasetê ye di gel henaseya jiyanê ya ku ji alîyê hêza îlahî tê dayîn. Taybetmendîya herikbarbûna ba û hewayê azadî, tevger û têperîna ji astengîyên dinyewî (erdî) nîşanî me dide. Agir gorankarî, enerjî û hêzên dinamîk ên gorankarîyê sembolize dike digel viyan û arezûyê yên ku mirov tevdigerîne. Agir xwedî taybetmendîyeke dualî ye an ku şiyana xerabkirin û afirandinê pê re heye; dikare pak û nû bike û her wiha dikare xelas bike û ji holê rake. Ev çar element her yek bi sembolîzma xwe ya cuda, bi hev re alîyên cuda yên jîyanê û serpêhatîyên cuda yên mirovan temsîl dikin. Bi awayekî kollektîf jî çarçoveyeke berfireh pêşkêşî me dikin ji bo têgehiştina têkilîyên di navbeyna rehendên fîzîkî, hestiyarî, zihnî û spirîtûel di mîtolojî û nerîtên çandî de.

> Di nav wan çar elementan de, ba û agir aktîf û nêr; av û ax jî pasîf û mê tên hisabkirin. Di nav hin kozmogonîyên elementî de, agir cihê herî girîng digire û wekî orîjîna her tiştî tê hisabkirin, lê bôçûneke bawtir ew e ku ba (hewa) elementa sereke ye. Kompresîyon û konsantrasyona hewayê germahî û êgir dertîne. …. Hewa bi sê tiştan ve tê gire dan: henaseya jiyanê an ku dengkirin (*speech);* bayê bahozî ku di gelek mîtolojîyan de bi afirandinê ve têkildar e; û dawîyê de jî valahî-feza wekî amûra tevgerê û derhatina pêvajoyên jîyanê. …Ax amûra tîpîk a derhatina hemû cure maddeyan e. Plastîsîte taybetmendîya wê ya sereke ye û ji ber vê yekê jî, bi awayî analojik, bi pêvajoyên bîyolojîk û haletên bineretî re nêzîkî hev in. …Agir wekî avê sembola veguhestin û ji nû ve derhatinê ye. … agir di tewera agir-erdî de sembola erotizm, germahîya rojê û enerjîya fîzîkî ye û agirê ku di tewera agir-hewayê de sembola mîstîsîzm, pakbûn, helçûn û hêza îlahî ye (Cirlot, 1962: 6, 105- 106).

Êzidî û yarsan li gorî karakter û taybetmendîyên afîrînerê xwe di tekstên xwe de navên curbicur bi kar anîne: navên afirînerê Êzidî yên ku di vê xebatê de di qewlên Êzidîyan de derbas dibin ev in: Reb, Xudawend, Êzdan, Siltan Êzdî, Rebbil Semed û navên afirînerê Yarsanan jî wisa ne: Padşa, Xuwa, Celil Cebbar, Zatê Heq, Ya, Mewlam, Xawendikar, Xaliq, Şa, Kirdigar, Allah. Di mîtolojîyê de, bandora sedemên çandî û dînî

û zimanî hene li ser pirbûna navên afirîneran. Mîtos bi demê re diguherin û di nav civakên cuda de belav dibin û ji ber vê yekê wesfên xwedawendan û vegêranên di derbarê wan de her diçin dewlemendtir û berfirehtir dibin. Wekî ku di jor de jî hatibû diyarkirin, ji bo diyarkirina taybetmendî û erkên afirîneran, navên cuda tên bi kar anîn, ew jî sirûşta têkel û pir-tebeqeyî ya afirîneran nîşanî me dide, bi vî awayî dewlemendî û curbicurîya hêmanên mîtolojîyê zêde dibin.

Kase û qabê durr wekî du hêmanên baw di qewl û kelaman de hatine bi kar anîn, wekî li jêr de jî tê dîtin:

35. Adem ji kasê vedixwar e
Keremeta kasê pê ve diyar e
Xa pê nijî, bû hişyar e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 122).

Ceyhûn cihan Dicle esrar pirr
Dûn ve dûn ama ta ve qabê durr (Şex Emîr, çapnebûyî: 18-19).

"Kaseya avê, mêtî, çemkê wergir (*receptive principle)* û zayînîyê (bereket) temsîl dike." (Cooper, 1990:24). Kase bi piranî di pêwenda dînî û rîtûelî de tê bi kar anîn. Kase ew qab in ku ji bo pêşkêşkirinê, lîbasyonê (pêşkêşkirina vexwarinan: şerab, xwîn, av û hwd.) û dayîna materyalên din ên pîroz tên bi kar anîn. Di kaseyê de meseleyeke kîmyewî jî heye; kase dikare bibe qaba ku tê de veguhestin pêk tê an ku di wê qabê de madde tên pakkirin, guhertin ku ew jî gorankarîya navxweyî (derûnî) û geşedana spirîtûel sembolize dike. Qabê durr wekî qalika durrê jî sembola zayîn û mêtîyê, bedewîya veşartî, nihênî û bêhayî, veguhestin û geşedana spirîtûel, parastin û nixumadinê ye. "Sembolîzma durrê ji nêzîk de bi ya qabê ve girêdayî ye. Jidayikbûna mîtîk a Afrodît ji qabê têkilîyeke aşkere ye." (Cirlot, 1962: 293). "Di ayînên cenazeyê de, qab sembola vejînê ye; di heman deme de rêwîtîyeke li ser behrê ye; her wiha arezûya cinsî ye bi nêzîkbûna her du nîvan. Amblema Afrodît/Venûs ku ji behrê ji dayik bûne..." (Cooper, 1990:152)

Di her du vegêranan de, qewl û kelaman de, behsa du cihan tê kirin: Laliş û Serendîl. Ji bo Êzidîyan Laliş ciheke pir pîroz e û wekî di jor de hatîye diyarkirin xîmê mirovahîyê ye. Di wir de Laliş wekî cihekî ye ku ji esmên hatîye xwarê û piştre dibe

cihê heqîqetê ku afirîner mirovan bi keştîyan dişîne wê derê. Lêbelê, Çiyayê Serendîl ew cih e ku mirov naçinê, lê bi axa wî mirov tê afirandin an ku Laliş ne cihekî wisa ye ku ji axa wê ji bo afirandina mirovan kelk bê wergirtin, lê Serendîl di versîyona Xan Elmas da bingeha maddeyî ya afirandina mirovan e. Balkêş e ku Laliş cihekî dîrokî û sirûştî ye, lê îro di nexşeyan de cihekî bi navê Çîyayê Serendîl nîne. Laliş her çend riknê beşerî be jî, mirov ji Lalişê û li Lalişê nayê afirandin.

22. Laliş jor da anî xwar e
Laliş bû xaş, cî û war e
Li 'erdê şîn bû nebat e
Pê zeyinî zindî qinyat e (Kreyenbroek û Reşow, 2011: 117).

Ferma[27] melekan çenî[28] Cebre'îl
Biçin xak barin[29] je kuyê[30] Serendîl (Xan Elmas, çapnebûyî: 69-71).

Di mîtosa afirandinê ya her du vegêranan de, di pêvajoya afirandinê de rola aktîf a hêzeke îlahî tê dîtin. Mîtosa afirandinê ya Êzidîyan de veguhestinek heye ji kaos û tarîtîyê berew dinyayeke nîzamî û tê de jiyan heye. Mîtosa afirandinê ya Yarsanan, afirandina erd û esman û tebeqeyên dinyayê wekî pêşveçûnek ji haleteke binerетî ber bi hebûneke nîzamî dibîne. Di Êzidîyan de afirîner mirov û dinyayê diafirîne, di Yarsanan de cewhereke pîroz di gel ferîşteyan di navenda pêvajoya afirandinê de ye. Di her duyan de bi giştî ji tunebûnê derbasbûnek heye ber bi kozmoseke binyadgirtî. Bi taybetî di afirandina mirovan de, di her du çandan de, têkelbûna cewhereke pîroz heye, di her du çandan de mirovê ewil ê ku tê afirandin Adem e. Di qewl û versîyona Xan Elmas Loristanî de mirovê ewil Adem dixuye û di versîyona Şêx Emîr de jî Heva û Adem in. Hemû ev dahûrandinên jorîn û gelekên din, di nerîta vegêranên mîtosên afirandinê yên Kurdên Êzidî û Kurdên Yarsan de, balê dikişînin li ser mijarên hevbeş ên wekî

[27] Ferman kir
[28] digel
[29] anîn
[30] çiya

afirînerîya îlahî, bi kar anîna hêmanên pîroz, avakirina nîzameke gerdûnî û dabînkirina cewhera ruhî û îlahî û hwd.

ENCAM

Amanca vê xebatê analîzkirina vegêranên Êzidî û Yarsanan bû li gorî cureyên mîtosên afirandinê. Bi nêzîkbûneke mîtolojîk nîşaneyên cureyên afirandinê yên baw hatin kifşkirin di gel bandora wan a çandî û dînî di nav her du civakên navborî de. Hat dîtin ku cureyên herî berbelav afirandina ji kaosê û afirandina ji tunebûnê ye di gel çend nimûneyên afirandina bi noqavkarê dinyayê. Di her du nerîtan de bi aşkere hate dîtin ku her çi cure dibe bila bile, hêza îlahî ya afirînerî di avakirina gerdûneke nîzamî de beramberî kaos û alozîyê serkeftî û serdest e. Di her sê cureyan de jî, serwerîya îlahî û afirînerîya otorîter heye.

Di vê pêvajoyê de, çavkanîyên me yên sereke kelamên ji Defterê Şêx Emîr û Xan Elmas Loristanî bûn di gel qewlên Êzidîyan ên encama berhevkarîya Kreyenbroek û Reşowî ye. Metnên ku hatine bi kar anîn vê derfetê bi xwîneran dide ku ew xwe berdin kûrahîya kozmolojîya Êzidî û Yarsanan û hewl bidin wan têbigehin. Qewl û kelamên ku hatine bi kar anîn her çend agahîyên dewlemend û bi hûrgilî pêşkêşî xwîneran kiribin jî, ew çavkanî bi tenê beşeke biçûk ji potansîyela okyanûsa lîteratûra dînî ya Êzidî û Yarsanan e. Beramberî vê sînordarkirinê, bi dahûrandin û kategorîzekirina li gorî cureyên mîtosên afirandinê, vê xebatê hewl daye rêya têgehiştina mîtosên afirandinê yên herdu nerîtên navborî heta astekê ronî bike û çemkên sereke yên çandî û teolojîk ên ku teşe dane wan vegêranan rayêxe ber çavan. Lêbelê, ji bo têgehişteneke berfirehtir, divê ji metnên navborî zêdetir çavkanî bên bi kar anîn wekî metnên berfirehtir ên dînî, nerîta devkî, dahûrandinên berawirdî di gel mîtolojîyên din ên herêmî û navneteweyî û hwd.

Encamên ku ji vê xebatê hatine der girîng in lewra derfetê didin xwîner da ku xwîner mîtosên afirandinê yên Êzidî û Yarsanan bizanin û hewl bidin cihê wan ê di nav pêwenda mîtolojîyên cîhanê têbigehin. Motîfên cureyên afirandina ji kaose, afirandina ji tunebûnê û afirandina bi noqavkarê dinyayê yên di her du nerîtên navborî de hêmayên hevbeş ên bi çand, dîn û milletên din re nîşanî me didin ku em bi vê berawirdikirinê taybetmendîyeke gerdûnî li metnên her du nerîtan bar dikin. Xebatên dahatû, divê

bingeha vê xebatê berfirehtir bike û çavkanîyeke kûrtir bi kar bîne. Xebatên etnografîk, analîzên zîmannasîyî, mîtolojîya berawirdî û hwd. lewane ye di têgeheştina mîtosên Êzidî û Yarsanan de zêdetir sûdbexş bin.

Wekî encam, vê xebatê hewl daye di derbarê mîtosên afirandinê yên Êzidî û Yarsanan de dahûrîneke binereti, lê heta astekê jî amadekarîyeke ronakker pêşkêşî xwîneran bike û bide zanîn ka di wan vegêranên kevn de kîjan cure mîtosa afirandinê berbelav in, heta çi astê mîtosên Kurdî bi qalibên gerdûnî re di hemahengîyê de ne û hwd. Her çend çarçoveya wî ji alîyê çavkanîyan ve sînordarkirî be, ev xebat amaje bi vê yekê dike ku metnên Kurdî yên dijwartir bi awayekî hej kûrtir, bi nêzikbûneke mîtolojîk dikarin bê analîzkirin û tegihiştin û di nav cureyên mîtosên afirandinê yên gerdûnî de bên senifandin û nasandin.

ÇAVKANÎ

Adamski, A. (2011). “Archetypes and the Collective Unconscious of Carl G. Jung in the Light of Quantum Psychology”. *NeuroQuantology.* Vol. 9. Issue. 3, 553-571

Arık, S. A. (2015). Aryan İnançlar ve Rêya/Raa Heqîyê: Mithra, Zervan, Zerdüşt, Mani, Mazda, Yarsan, Êzdaiyati ve Kürd Aleviliği. İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları.

Abdulfettah, D. (2017). Yarsan An jî Ehlî Heq. Stembol: Weşanxana Lîs.

Bayrak, M. (2014). Êzidî, Kızılbaş, Yaresan KÜRTLER: Belgelerle Kürdistan’da Gizli Dinler, Ankara: Özge Yayınevi

Cirlot, C. E. (1962). A Dictionary of Symbols. J. Sage (trans.). London: Routledge

Cooper, J. C. (1990). An Illustrated Encyclopaedia of Traditional Symbols. London: Thames & Hudson.

Eliade, M. (1963). Reality and Myth. New York and Evanston: Harper & Row Publishers

Furlani, G. (1940). The Religion Of The Yezidis: Religious Texts Of the Yezidis, Translation, Introduction and Notes. J. M. Unvala (Çev.). Bombay

Guest, J. S. (2007). Yezidilerin Tarihi: Melekê Tawus ve Mishefa Reş’in İzinde. İ. Bingöl (Wer.). İstanbul: Avesta.

Hamzeh’ee, M. R. (1990). The Yaresan: A sociogical, Historical and Religio-Historical Study of a Kurdish Community. Berlin: Klaus Schwarz Verlag.

Izady, M. (1992). The Kurds: A Concise Handbook. New York: Taylor&Francis

Chevalier, J., Gheerbrant. A. (1994). Dictionary of Symbols. J. Buchanan-Brown (trans.). Paris: Penguin

Kreyenbroek, P. G. (2014). Ezidilik: Arka Planı, Dinî Âdetleri ve Metinsel Geleneği. A. Gökçen û D. Tanla. (Wer.). İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları

Kreyenbroek, P. G. û Reşow, X. C. (2011). Tanrı ve Şeyh Adi Kusursuzdur: Yezidi Tarihinden Kutsal Şiirler ve Dinsel Anlatılar”. İ. Bingöl (Çev.). İstanbul: Avesta.

Kîyanî, G. (2019). Mirov-xûdayî Le Ayînî Kurdan da. Gutarname. Hejmar 1. 2019. r. 48-55.

Korkmaz, E. (2015). Ezdiler Melek Tavus'un Talihsiz Halkı Kırmızı Ezidin Kuzuları). İstanbul: Anahtar Kitaplar Yayınevi.

Leeming, D. A. (1990). The World of Myth. New York: Oxford University Press.

Leeming, D. A. (2010). Creation Myths of the World: An Encyclopedia. Santa Barbara: ABC-CLO, LLC Press, Santa Barbara.

Maisel, S. (2014). "Bir Topluluk, İki Kimlik: Suriye'nin Yezidileri ve Azınlık Bir Grubun Uyum İçin Verdiği Mücadele" H. Omarkhali (Amd.). Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana Akım Dışında Kalanlar (143-168). İ. Bingöl (Çev.). İstanbul: Avesta.

Müller, M., Palmer A. S. (Ed.). (1977). An Essay By Professor Max Muller, Edited, with Additional Notes and An Introductory Preface on Solar Mythology Ballantyne. Edinburgh: Hanson Co. Press.

Müller, M. (1872). Chips From a German Workshop, Volume 1. New York: C. Scribner's Sons

Littleton, C. S. (1982). *The New Comparative Mythology*. Berkeley: University of California Press.

May, G. (2004). *The Doctrine of Creation out of Nothing in Early Christian Thought*, New York: T&T Clark International Press.

Newroz, (snz.). Destxeta Deftera Newroz, Çapnebûyî

Omarkhali, K. (2017). The Yezidi Religious Textual Tradition: From Oral to Written: Categories, Transmission, Scripturalisation and Caninisation of the Yezidi Oral Religious Texts, Wiesbaden: Harrasowitz

Omerkhali, K. (2014). Kürdistan'da Dini Azınlıklar: Ana Akımın Dışında Kalanlar. İ. Bingöl (Wer.). İstanbul: Avesta.

Ozmen, Y. (2021). A'dan Z'ye Kürt Mitolojisi Sözlüğü. Wan: Sîtav

Rosenberg, D. (1997). *World Mythology,* NTC. Lincolndwood: Contemporary Publishing Company.

Reşîd, T. (2010). Êzdîyatî: Oleke Hê Ji Nenaskirî. Diyarbakır: Weşanên Lîs

Suvari, Ç. C. (2019). Ezidiler: Etnodinsel Bir İnanç Olarak Ezidilik, Ankara: Ütopya Yayınevi.

Şanlı, M. (2020). Evren, Yaratılış ve Köken Mitleri, İstanbul: Ötüken Neşriyat.

Şengul, B. A. (2010). Ezidiler: Bir Toplumun Kültürün ve Dinin Tarihi. İstanbul: Alfa Basım Yayın Dağıtım.

Şêx Emîr. Defterê Şêx Emîr, Nusxeya Çapnebûyî, Destnivîsa Elî Newrozî Siyahbîdî, îstinsax 1368/1989.

Tagay, Ş. und Ortaç, T. (2016). Die Eziden und das Ezidentum: Geschichte und Gegenwart einer vom Untergang bedrohten Religion, Hamburg: Hartun Druck + Medien GmbH

Taşgın, A. (2001). "Anadolu'da Yok Olmaya Yüz Tutan Dini Toplulukardan Yezidilier", Anadolu İnançları Kongresi. Ankara

Vali, S. (2016). Nasandina Giştî ya Edebîyata Dînî ya Edebîyata Kurdên Yarsanî, Nûbihar Akademî: Jimar 5, Sal 3, 113-119

Vali, S. (2018). Kurdên Yarsan. S. O. Reşitoğlu (Wer.). Stembol: Weşanên Avesta.

Wheeler-Voegelin, E., Maria L. (Ed.). (1949). Earth Diver. In Standard Dictionary of Folklore, Mythology and Legend, Vol. I. New York: Funk &Wagnalls.

Yonar, G. (2015). *Yaratılış Mitolojileri, Altı Medeniyet Altı Yaratılış Hikayesi*, İstanbul: Ötüken Neşriyat

Ye, S. (2007). Mythical Body: World Parent Type Creation Myth in China and Its Visual Archetypes, *Comparative Literature: East & West*, 8:1, 81-92, DOI: 10.1080/25723618.2007.12015623

Xan Elmas (snz.). Defterê Kelam, Nusxeya Çapnebûyî, Destnivîsa Seyid Xelîl 'Alînejad, îstinsax 1376/1997.

ÇAVKANÎYÊN DIJÎTAL

Ehda Kevn (snz.) Maccabees 28, https://www.biblegateway.com/passage/?search=2%20Maccabees%207&version=CEB, (8.11.2022)

Kreyenbroek, P. G. (2022) The Religious Textual Heritage of the Yarsan (Ahl-e Haq) https://journal.oraltradition.org/the-religious-textual-heritage-of-the-yarsan-ahl-e-haqq/, (9.8.2024)

Levi-Strauss, C. (1955). The Structural Study Of Myth https://www.people.iup.edu/sherwood/Archived-Courses/ENGL752SuII-05/Docs/Structural_Study_of_Myth.pdf (15.04.2024.)

Pearls in Myth, https://eusharon.com/blogs/blogs/pearls-in-myth (3.07.2024)

Quran, https://quran.com/hud/7, Dema berdestbûnê: (8.11.2022)

Probert Encyclopedia-Mythology. https://www.probert-cyclopaedia.co.uk/mythology.htm (28.11.2022)

Rudaw (2019). Mir Hazım Beg: Ezidiler Kürt, Şengal de Kürdistan'dır https://www.rudaw.net/turkish/kurdistan/280720191. (2.01.2023)

Selîmî, E. (2023). خان الماس، شیخ امیر،نوروز و تیمور شارحان و مفسرین تفکر و دین یاری (https://www.yarsanmedia.org/ku/?p=13236 (12.05.2024)

Mistefa, Î. (2020) ئێزیدی و یارسان وەک دوو دەرکەوتەی ئایینی هەقیقەت، بەشی دووەم https://jineftin.krd (22/06/2024)

T.C

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTES

TÜRKİYE'DE YAŞYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisan Tezi

EZİDİ VE YARSAN KÜRTLERİNİN RİVAYETLERİNDE YARATILIŞ MİTOSU

Nasır Heval BATU

Danışman

Dr. Shahab Vali

Mardin-2024